# Berbang

86

Kovara Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê






www.arsivakurd.org



www.arsivakurdi.org




# Naverok



Weneye endamen parlemento
Rupel 8



Komela Goteborg
Rupel 15

**Beşa Kurmanciya Jorin**


Rojeva Mehê. Vildan Tanrikulu....................................4
Dîtin, Raman, Rexne. Bûbê Eser....................................6
Civîna dîrokî....................................................8
Resit Burhan....................................................10
Cemal Batum.....................................................11
Vildan Tanrikulu................................................12
Komelên Me. Mustefa Aydogan......................................15
Dîrok û Belge. Zinnar Soran.......................................19
Ziman. M.Emin Hewremani..........................................22
Hevpeyvîn. Mezher Kaplan..........................................24


**Beşa Zazakî**


No fin diha neşeno bivijiyo. Baboyan...............................27
Surube Kuxuk o....................................................28



**Berbang**

Organ för Kurdiska riksförbundet
Organa Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê

Ansvarigutgivare / Berpirsiyar
Vildan Tanrikulu

Redaktion
Beroj Akreyî, Bûbê Eser,
Cemal Batun, Dîlan Dersîm,
Hemît Kiliçaslan,
Mustefa Aydogan, M. Himbêlij

Sättning och Layout
Bûbê Eser, Cemal Batun, Dîlan Dersîm

Adress : Box 490 90, 100 28 Stockholm-Sweden

Telefon 08 / 652 85 85
Telefax 08 / 650 21 20
Postgiro : 64 38 80 - 8
Prenumaration / Abone
Meqam/ Myndigheter 300 Skr
Kes / Enskilda 200 Skr/ kr.
Anons: Insidor / Rûpelên navîn 1500 Skr.

Redaksiyon ne berpirsiyara nivîsarên bi îmze û gotinên Federasyonê ye .Nivîsarên ku ji Berbangê re tên şandinheke çap ji nebin li xwedî nayên vegerandin.

ISSN - 0281 - 5699 Sal: 11 Hejmar : 9/ 93
Damezrandina Federasyonê : 06. 06. 1981
Çapkirina hejmara yekem a Berbangê : 07/1982


www.arsivakurdi.org

# BER BI KONGREYA 13-an

Vîldan Tanrikulu



Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê (FKKS) dê kongra xwe ya 13-an di meha sibata 1993 yan de çêbike.

Kongre, weke organa herî bilind ya rêxistinekê, bê guman wê her pirsên xebat û avahiya rêxistinê girêdayî ve têxe rojeva xwe û ji bo çareserkirina van pirsan biryarên pêwîst derxe holê. Lê ji aliyekî din ve, divê bê zanîn ku di tu rêxistinan de, ji bilî ew xalên giştî yên ku kongreyek divê li ser raweste, her pirs her tim li gor daxwaz û hêviyên her beşdarê kongreyê nakevin rojevê û çareser nabin. Û tiştên îdeal û li gora dilê herkesî jî, bi careke dernakeve holê, ji ber xwe jî çênabe. Ji bo avakirin û bidestxistina tiştên îdeal, xebat pêwîst e, wext pêwîst e. Mînakên van, bi kêmanî ji bo beşdarên kongreyê FKKS çi wekî nûner, çi jî wekî mêvan yan jî guhdar, di jiyana wê ya 12 salî de gelek in. Li ser destûr, struktur û perspektif û naveroka xebatê yên FKKS di her kongreyekê de gelek munaqeşe çêdibin. Hin pirs tên çareserkirin, yên din wek xwe dimînin. Hin pirs li gor dîtin, daxwaz û dilê hin beşdarên kongreyê çareser dibin. Lê ev yek ne li gor dîtin, daxwaz û dilê beşdarên mayî yên kongreyê ne.

**Munaqeşeyên di kongreyên FKKS de, çi bi naverokên xwe ve û çi jî bi formê xwe ve, dinamizma di nav xebata FKKS diyar dike. Ev dinamizm dibe nişana xebata rêxistineke jîndar. Dibe bingeha guherandin, pêşvebirin û xurtkirina xebata me kurdên penaber li Swêdê li bin banê rêxistina me ya kutlewî û neteweyî. Aliyeke din yê munaqeşe û biryarên kongreyê jî demokrasiya di nav xebata me ya rêxistinî de nişan dike. Dikarin guhdarî û tehamula hev û du bikin. Siyaneta hev û du bigrin. Siyaneta otorita organa herî bilind ya rêxistina xwe bigrin û biryarên ku ne li gor dilê me bin jî wekî biryarên organa herî bilind di xebatê de bi cîh binin. Bi vî awayî struktura demokratîk ya rêxistina xwe diparêzin, ji derveyî otorîta organa herî bilind û biryarên wê otoriteyeke din qebûl nakin, bi uslubê munaqeşeyê demokrasiya di nav xebata rêxistinî de dikin şekleke jiyanê. Ne tenê gotin.**

Li gel van tiştên pozîtîf û pêşketî, gelek tiştên din hene ku mirov nikare li ser wan bi awayek pozîtîf behs bike. Mirov nikare bi dileke rehet bibêje ku, FKKS rêxistineke kamil û bê kêmanî ye. Her karên ku dike, digihê armanca xwe, şeklên xebatê de, birêvebirina kar û barên rêxistinê de, kêmanî yan jî xeletî çênabin. Bê guman yek ji sedemên vê yekê ew e ku, jiyan li cihê xwe nasekine. Dinamizma jiyanê her roj gelek pirsên nû derdixe pêş me. Rê, awa û avahiyên do hertim nikarin têrî bersivdayina pirsên îroj bikin. Eger em bi xwe dinamizma xebat û munaqeşeyên xwe li gor dinamizma jiyanê eyar nekin, eşkere ye ku em dê li paş bimînin û nikaribin pirsên nû tesbît bikin, rê û awayên çareserkirina van pirsan bîbînin û bikar bînin. Aliyeke din yê van sedemên kêmanî û xeletiyan jî, bi wan kes û kadroyên beşdarî vê xebata demokratîk ve girêdayî ye. Divê em balkêşiya (interesa) xwe, fedakariya xwe û fêrbûna xwe roj bi roj xurttir bikin da ku bikaribin ji bin berpirsiyariyên ku yek bi yek hildigrin ser milên xwe, rabin, bersîva wan daxwaz û hêviyên ku ji me tên kirin, bidin. Xaleke din ya girîng jî ew e ku, potansiyela civata me ya penaber li Swêdê, li gor fonksiyonên xwe yên cuda yên civakî bi kapasita xwe ya bilind nayê bikaranîn. Beşên cuda yên civata me ne li ser hev in ku ew potansiyel di sewiya herî bilind de bê bikaranîn û her beşek civata me bi fonksiyonên xwe ve hev û du temam bikin, da ku tevahî bi kamiliya xwe derkeve holê, berpirsiyariyên tevahî bi her aliyên xwe ve bên bicîh anîn. Weke ku li jor hat behs kirin, em nikarin tevahiya pirsan di kongreyekê de çareser bikin. Divê mirov tiştekî weha jî nede pêş xwe da ku hêvîşikestî nebe. Lê hin pirs hene ku rê li çareserkirina pirsên din jî vedikin. Ji ber vê yekê jî divê em bikaribin van pirsan tesbît bikin, pêşniyarên xwe berî her tiştî di serê xwe de zelal bikin da ku bikaribin rê li munaqeşeyeke bi serûber û avakar vekin, pirsan bi xwe û rêyên çareserkirina wan bi kongreyê bidin fahmkirin.

Yek ji wan pirsên herî girîng ji bo kongreya 13 ya FKKS ew e ku, beşdari û girêdana du beşên girîng û fireh yên civata me di nav xebat û avahiya rêxistinî ya FKKS de zelaltir û xurttir bikin. Ciwanên kurd ku pêşeroja civata me, hêvî û garantiya berdewamiya civata me ne, divê di nav xebatên komeleyên endam de, di nav Yekitiya Ciwanên Kurd de, ku berî 6 salan bi hewldanên FKKS ve hatiye avakirin, hîn zelaltir û firehtir cîh bigrin. Beşdariya ciwanên

www.arsivakurd.org

kurd di kongreyên FKKS de divê hin xurttir û şeklê beşdariyê ji bo me teva hin zelaltir bibe. **Divê em bizanibin ku ciwanî (ciwanbûn) di jiyana mirov de ne tiştekî berdewamî ye. Beramberê beşek yan jî demek jiyana mirov dikeve. Ango mirov di tevahiya jiyana xwe de ne "ciwan" e û ji ber vê yekê jî ne xwediyê ew daxwaz, hêvî û pirsên taybetî ku bi "ciwanbûnê" ve girêdayî ne. Ciwanên îroj weke mezinên sibê dê berpirsiyariya avakirin û birêvebirina xebatên civata me hildin ser milên xwe. Ev yek divê bibe bingeha yekitiya xebatê ciwanan di nav civata me de û rêxistina wan ya demokratîk li Swêdê.** Seksiyona ciwanan divê weke beşek ji xebatên komeleyên endam bên avakirin û yên avabûyî bên xutrkirin û bi aktivî beşdarî xebatên giştî û xebatên taybetî ji bo ciwanan bibin. Berpirsiyariya her komeleyeke endam e ku, rê ji bo beşdariya ciwanan di xebatên komelan de veke, alîkarî û piştgiriya wan bike, rê bide ku ciwan bi xwe bi pirsên xwe ve mijûl bibin. Ciwanên kurd jî divê bifikirin ku ew ebediyen ne "ciwan" in û xebatên xwe yên di nav komeleyên endam û di nav FKKS bi vê perspektifê birêvebibin. Di kongreya 12 ya FKKS biryareke ji bo beşdariya ciwanan di kongreyê FKKS de derket. Li gor vê biryarê divê, ji her komeleyeke endam ku xwediyê seksiyona ciwanan e, yek ji wan 3 nûnerên ku ji bo 15 endamên pêşî tên hilbijartin ji seksiyona ciwanan be. Ev yek, bê guman rê li beşdariya ciwanan heta cihek vekiriye ku bi xwe bi beşdari û nûnerûn xwe ve pirsên xwe bînin rojevê. Bê guman dil dixwest ku em ne biryareke weha lê bi xwe li her komeleyeke endam rêyên hîn firehtir ji ciwanan re vekin ku bi her awayî beşdarî xebatên civata me bibin û xwe bi xwe temsîl bikin. Li aliyekî din jî ev biryara kongreya 12 ya FKKS têrî beşdarî û temsileke fireh nake. **Ciwanên kurd xwedî rêxistinekê nin, divê Yekitiya Ciwanên Kurd li Swêdê bi awayekî di kongreya FKKS de temsîl bibe. Ev yek ji bo ku ciwan bikaribin, pirsên xwe yên rêxistinî û yên din di sewiya merkezi de bînin ziman û kongre ya FKKS jî bikaribe yekser ji wan agahdarî bigre, muhaseba xebatên ciwanan li gel muhattabê wan yekser bê çêkirin. Pêwîst e ji bo vê yekê jî awayê herî baş ew e ku endamên Komîta Karger ya Yekitiya Ciwanên Kurd li Swêdê bibin nûnerên eslî ya kongreya** FKKS. Ev yek ji bohem beşdarî û hem jî girêdana ciwanan bi xwebata tevayî ya civata me re hin xurttir bibe, dê îmkanekê ji bo tecrube û fahmkirina xebatê me ya tevahî bîne holê.

**FKKS, temsila civata kurd li Swêdê ye û Stockholm ne Swêd e. Li her belediya ku komeleyeke endam heye, Federasyon jî lê ye. Divê em bi vê perspektifê li peywendiyên organên FKKS û komeleyên endam binêrin da ku bikaribin hem kêmanî û xeletiyên organên Federasyonê û hem jî kêmanî û xeletiyên komeleyên endam rast tesbît bikin û bi vî awayî bikaribin çareyên rast peyda bikin.**

Pirseke din jî, beşdariya jinên kurd di nav xebata rêxistinî û civakî de ye. Heta îsal jî jinên kurd li Swêdê ne xwediyê rêxistineke ku wan li seranserê Swêdê temsil bike, bûn. Bi hewldanên FKKS û Komela Demokrat ya Jinên Kurd ve xebatek tê kirin ku bi kongreyeke avakar bi beşdariya jinên ji seksiyonên jinan, ji komeleyên endam yên Federasyonê, Yekitiya Jinên Kurd Li Swêdê bê avakirin. Bi vî awayî eşkere ye ku jinên kurd di rêya beşdariya xebata rêxistinî û civakî de her wisa jî ji bo nûneriya pirsên xwe yên taybetî gaveke girîng davêjin. Biryar û xebata avakirina Yekitiya Jinên Kurd ya li Swêdê ye ku ji seksiyonên jinan li komeleyên endam ve pêk bê, di civata kurd li Swêdê pêşketineke . Her wisa, di kongreya 12 ya FKKS de biryarek wekî ji bo ciwanan ku li jor hat behskirin, ji bo nûneriya jinan jî hat girtin. **Jinên kurd nîvê civata me ne. Beşdariya wan di xebata rêxistinî û civakî de eşkere ye ku potansiyela xebata rêxistinî ya civata me xurttir dike. Ji ber wan sedemên ku min li jor, ji bo ciwanan diyar kir, her wisa divê endamên Komîta Karger ya Yekîtiya Jinên Kurd jî wekî nûnerên eslî di kongreya FKKS de beşdar bibin, ew bixwe pirsên xwe bînin ziman û muhaseba xebatên xwe weke beşeke ji xebata me ya tevahî, di kongreya FKKS de bikin.**

FKKS, weke ku nav li ser e, "FEDERASON" e, ne rêxistineke merkezî ye. Di peywendiyên nav organên hilbijartî û komeleyên endam de ev rastî gelek caran tê ji bîr kirin. Hêviyê ne realîst, daxwazên ne di cîh de û rexneyên neheq ji organên hilbijartî yên FKKS tên kirin. Her komeleyek endam divê kar û barê xwe bi xwe tesbît bike û birêvebibe. Îmkanên finansmana van çalakiyên xwe divê bi xwe peyda bike. **Xurtbûn û berfirehiya xebat û avahiya rêxistinî yên komeleyên endam xurtbûn û berfirehiya xebatên FKKS ye. FKKS bê xurtbûna xebatên komeleyên endam nikare bi xwe xurt bibe.** Ji ber ku FKKS, ne 7 endamên Komîta Karger ne jî 19 endamên Komîta Giştî ne. Endamên van organan bi xwe, yek bi yek endamên cuda yên komelan in. **FKKS, temsila civata kurd li Swêdê ye û Stockholm ne Swêd e. Li her belediya ku komeleyeke endem heye Federasyon ew e û bi wî awayî jî li wê belediye ye. Divê em bi vê perspektifê li peywendiyên organên FKKS û komeleyên endam binêrin da ku bikaribin hem kêmanî û xeletiyên organên Federasyonê û hem jî kêmanî û xeletiyên komeleyên endam rast tesbît bikin û çareyên rast bi vî awayî bikaribin peyda bikin.**

Bê guman li pêş kongra 13-an ya FKKS de gelek pirs li hêviya munaqeşe û biryarên çareserkirinê ne. Min li vir li ser çend aliyên giştî yên xebat û avahiya rêxistinî ya FKKS lênerînên xwe anîna ziman û çend pêşniyarên xwe amade kir. Hêvîdarim ku kongreya 13 ya FKKS di warê yekgirtin, xurtkirin û pêşvexistina potansiyel û xebata civata me li Swêdê li bin banê FKKS de, bibe hengavek nûh.

Stockholm, 02.12.1992

www.arsivakurd.org

# ÎRO PÊWÎSTIYA ME BI ÇI HEYE?

## Bûbê Eser

Weke ku tê zanîn, piştî hilweşandina sîstema sosyalîst di dinyê de, gelek guherandinên ciddî çê bûn. Mirov bixwaze nexwaze van guherandinan gelek tesîr li ser welatên bindest û îdeolojîya karkeran kir. Gelek tiştên ku do dihatin parastin, îro gelek ji wan hatiye avêtin. Ji bo vê yekê û li gel van guherandinan divê em jî weke rêxistin û kes, di bîr û bawerên xwe de, guherandinan çêbikin. Guherandinên ku wê bên çêkirin, divê li gor menfeeta gelê me bin.

Îro, cihan di rewşeke taybetî de ye û gelekî hatiye guherandin. Eger em jî li gor van guherandinan, xwe ji nûve nûjen nekin, em dê nikaribin tekoşîneke baş û rast bimeşînin. Ji bo ku em bikaribin, xwe ji şaşitî û çewtitiyên berê xilas bikin, divê bi awakî dilsoz, bi rastî û bêî mefeetên şexsî em herin ser meselên gelemperî. Bi vî awayî em dê bi hev re bikaribin rêxistineke hîn baştir peyda bikin. Ji bo vê yekê jî ez dixwazim hin dîtinên xwe bînime zimên.

Berî van guherandinên ku di cîhanê de hate çêkirin, dema rêxistineke kurd belavokek an jî encama kongera an jî konferansên xwe pêşkêşî gelê xwe dikirin, berî mesela Kurd, bi awakî dûr û dirêj li ser meselên cîhanê û rewşa sosyalîzmê disekinîn. Ji îzahkirina van tiştan wext nedima ku em bikaribin meselên xwe yên neteweyî munaqeşe bikin, kêmasiyên wan derxin ortê û li gor kêmasî û başiyan mirovê çawa tekoşînekê bide, nedihata diyarkirin. Diyarkirina van meselên girîng tenê bi nîv rûpelî an jî bi pragrafekê dihate gotin. Loma jî em weke kurd di meselên xwe yên neteweyî de nehatibûn pijandin. Ji ber ku her dem dihate gotin ku: "*Perçe dikare bibe qurbana tevayê*". Li gor vê bîr û baweriyê jî Kurdistan perçe dihate hesibandin, ji bo ku tevayî dewletên Sosyalîst bûn, bêtirîn munaqaşe û biryarên me di vî warî de dihate girtin. Ev yeka hanê ne tenê kêmasiya rêxistinekê bû, hemû rêxistinên Bakurê Kurdistanê yên ku bîr û raya wan Sosyalîzm bû, wisa difikirîn.

---

**Berî hertiştî divê gelê Kurd bi kultura xwe bijî, bi zimanê xwe biaxive, bi şiûra xwe ya neteweyî mezin bibe. Eger ne wisa be, em tu carî nikarin bi şiûreke netewî problemên xwe çareser bikin.**

---

Ezê nekevim nav meseleyên berê û yên îdelojîk. Loma jî ez dê li ser pirsa ku ji bo Kurdistaneke azad û serbixwe, çi pêwîst e, bi qasî zanebûna xwe, hin dîtinên xwe bînim zimên. Daxwaza min ew e ku em bi awakî objektîf li mesela Kurd binerin. Bi awakî zanyarî bi berpirsiyariyên vê pêvajoya ku tête jiyandin rabin.

Berî hertiştî divê gelê Kurd bi kultura xwe bijî, bi zimanê xwe biaxive, bi şiûra xwe ya neteweyî mezin bibe. Eger ne wisa be, em dê tu carî nikaribin bi şiûreke neteweyî problemên xwe çareser bikin. Pêwîst e ku em her tişt û her problemên xwe bi zimanê xwe çareser bikin. Ji ber ku ziman hebûna gel e. Ka lê binehêrin bê rehmetî Celadet Bedirxan, di sala 1932-an de çi gotiye: "**Miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qaweta du çekan diparêzin. Ol yek, ziman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek bibe, hingê çek bi tenê yê û tenê ziman e**". Ji bo vê yekê ye ku divê em zimanê xwe pêş ve bixin. Dema ku mirov bi zimanê xwe biaxive, şiûreke Kurd û Kurdistanî di mirovan de peyda dibe. Berê me digot ku ev milîyetçîtî ye. Lê me nizanî bû ku milîyetçîbûna gelê bindest, ne paşverûtî ye. Ew pêşverûtî ye. Şaşitiya me ya mezin di vir de destpêkir û hîn jî di gelek waran de em êşan û kulan di vî warî de dikşînin...

Çewtiyên ku bi qasî çewtîtiyên me yên di warê zimên de di warê rêxistinî de jî hatin kirin. ji ber ku ew rêxistinên ku me ava kiribûn, ne li gor bîrûbaweriyên welêt, ne li gor şert û şirûtên welêt bûn. Ew rêxistinên me, li gor hin îdeolojîya hatibûn damezrandin û me dixwest ku bi reçetên hazir nexweşê xwe sax bikin. Bi vî awayî jî tu nexweş rehet nebûn. Dema ku mirov yê nexweş muayene neke û li gor nexweşiya wî/wê dermana nedê, ew nexweş tucarî ji mirinê nafilite. Tu nemabû ku me jî Kurdistan bi wan reçetên ezber bida kuştin. Lê mala wan hezar carî avabe ku berî ku em welatê xwe bi wan reçeteyên nerast bidin kuştin, wan ev problem hal kirin û gotin, şiklê tedawiyên wisa ji bo gelan çewt in. Qasî ku wan gotin û hîn jî dibêjin, ku bila gelê bindest êdî çewtiyên wisa nekin. Lê dîsa jî hin kes û rêxistin hene ku ji dû wan tiştên çewt venager in. Loma jî ez dibêjim ku hîn şaştitî û çewtiyên me gelek in. Divê em van çareser bikin, bi şiûr û mejiyê neteweyî bên dagirtin da ku em jî weke gelên cîhanê, bikaribin xwe ji destê dijminên xwînxwar û har xilas bikin. Eger hîn em bêjin: "*Karkerên hemû welatan û gelên bindest yek bin*". Xelasî û azadiya me wê hîn bi salan dom bike. Ji ber ku gelê bindest Filistînî bûn û ji wan bêtir, rêxistinên me ew

www.arsivakurd.org

diparastin û li ser navê Enternasyonalîzmê bi dehan kadirên rêxistinên Kurd xwe di berwan de dane kuştin. Lê hezar carî mixabin ew bi xwe li ba Saddamê xwînmij bûn û li gelê Kurd dixistin û wan bi xwe bi dehan kadirên rêxistinên kurd kuştin e. Îcar em bikaribin li ser vê yekê bifikirin û dersan jê derxînin. Wê demê tekoşîna me wê hîn hêsantir bibe.

Îzahkirina her meseleyakê bi serê xwe dikare pirtûkekê dagire û bi rojan wext bigre. Ez naxwazim vê yekê bikim. Ezê tenê ew tiştên ku ji minre çewt tên, îşaret bikim. Ez hêvî dikim ku her kurdperwerek wê li ser tiştên girîng rawest e. Û wexta xwe li ser bîrûbaweriyên vala derbasnekin.

Niha jî bi kurtasî dixwazim çend gotina ji bo karûbarê rêxistinî bêjim:

Li gor bîrûbaweriya min, îro rêxistinên hûr û zêde tu feydê ji welatê me re naynin. Berê ji bo zelalkirina hin meselan dibû ku pêwîstî heba. Lê îro pêwîstiyeke wisa ji holê rabûye. Tenê rêxistineke ku bikaribe, dest bavêje problem û êşên gelê me lazim e. Ev jî ne rêxistineke tenê ye. Di bin eniyakê de civandina hemû rêxistinên heyîn ne. Yanî cepheyeke ji bo gelê me, bakurê Kurdistanê pêwîst e. Ji bilî vê tu pêwîstiyên din tuneye. Ji peydekirin û avakirina tiştekî wisa girîng divê hemû rêxistinên Kurd li gor girîngiya vê û bi munaqeşeyek dûrûdirêj bigihêjin encamekê. Ji hêsankirina vê meselê ez dixwazim hin dîtinên xwe bidim rohnîkirin.

Weke min li jor jî diyar kiribû ku tu feyda zêdebûna rêxistinên hûrik û kêmhêz, ji bo îro tune ye. Di bakurê Kurdistanê de, dikare 4 an jî 5 rêxistin peyde bibin. Ji wan yek em bixwazin nexwazin rêxistina PKK ye. Hebûna wan nayê înkarkirin. Başî û şaşitiyên wan dikare bên munaqeşekirin. PSK jî rêya xwe dîtiye û xwe di bîr û baweriyên xwe de, xwe weke partî daye îspatkirin. Li gor destûr û bernamên xwe, xebata xwe di welêt û Ewrûpa de didomîne. Ji bilî van herdu partiyan, du partiyên din yên bakurê Kurdistanê di van demên talî de bi beşdarbûna gelek rêxistina û kesan ve hatine damezirandin. Yanî weke YEKBÛN û Hevgirtina-PDK ê. Ez hêvîdar im ku ev partiyên me jî di demeke kurt de, bi bûyer, xebat û çalakiyên xwe ve, xwe bidin îspatkirin ku ewê jî ji niha û pêda xebatên xwe bi awakî piralî bidin domandin. Yên mayî jî çend rêxistinên hûr û kêmhêz in. Divê ya ew jî di nava xwe de yekitiyakê pêk bînin, yan jî ew kîjan partiyê nêzîkî xwe dibînin, bi rêya diyalogê bikevin nava wan. Û li gor baweriya min jî ji vê pê va tu rêya din tune ye.

**Tenê rêxistineke ku bikaribe, dest bavî problem û êşên gelê me lazim e. Ev jî ne rêxistineke tenê ye. Di bin eniyakê de civandina hemû rêxistinên heyîn e. Yanî cepheyeke ji bo gelê me, bakurê Kurdistanê pêwîst e. Ji bilî vê tu pêwîstiyên din tuneye.**

Rewşa wan rêxistinên me yên hûr û kêmhêz çi ye û wê karibin ji nûha û pêde çi bikin. Ez bi xwe nikarim tu tiştekî bêjim. Di vir de qesta min ne kêmanî an jî bi awakî negatîf îzahkirin û nebaşbûna wan rêxistinên me yên hûr û kêmhêz in. Ez weke şexsekî hurmetkarê hemû rêxistinên welatparêz im. Tenê dixwazim dîsa bêjim **ku îro pêwîstiya me bi hevgirtina rêxistinên me û bi xurtkirina wan heye, eger em vê pêk nînin, wê azadiya gelê me jî gelekî şunde bikeve.** Gelo bi rastî ew rêxistinên me yên hûr û kêmhêz wê bikaribin bi serê xwe bibin altarnatîfek û gelê xwe di bin baskê xwe de, bi rêxistinî bikin. Li gor baweriya min ev îro zehmet e. Ji ber ku kadirên wan yên ku bikaribin karê giran hilgire tune ye an nema ye. Ji îro pê de jî karekî nû rêxistinî jî zehmet e. Ya girîng jî ew e ku ew rêxistin an kadirên hene û dixwazin bi rastî ji gelê xwe re karekî baş, xizmeteke hêja bikin, li gel ew partiyên hene têkiliyên xwe xurtir bikin û herin nava ew partiyên ku nêzîkî xwe dibînin. Ji bilî vê tu rêya din tuye ye... Me weke netewe heta îro gelek firsetên girîng ji dest berda ye. Ev jî şanseke me ya talî ye...

***

**PESNA DÊRIKÊ**

**Dêrik çi xweş e, bi dar û av e**
**Ev av e, li erdê bû belav e,**
**Yek Xab e, belê bihuşta me'wa**
**Pir mişmiş û sêv û darên selwa**
**Pir gwîz û hejîr û xox û hinar**
**Sed kanî û aş û gol û cobar.**
**Yek dî heye, pê dibên Kulêbê**
**Gorî ye ji wê re Xurs û Şêbê.**
**Pir aveke sar û rind şêrîn**
**Pir dar û ber û giyayên rengîn.**
**Bilbil digirî bi ax û zar e**
**Daxwaza wê komela Hewar e.**
**Mizîgînî didê Heval û yara**
**Qedrî ko li Şamê bendewara**
**Çepkan dikutin dibên bravo!**
**Qurbana te bin xweh û brawo!**

**Cegerxwîn**

**ŞIYARBÛN**

**Em kurd şiyar bûn pîroz**
**Çîya û zinar li me pîroz**
**Dema destan bidinê hev**
**Yekitî li Kurdan pîroz**

**Bi zanistî pir sazkin**
**Bane hêza gundiyan-kin**
**Ji karkiran yek serok**
**Va seroka li gel pîroz**

**Hêza mezin tev yek dev**
**Gundî û rêncber bigêne hev**
**Du benî tew çê nebê**
**Ew çê bûna li gel pîroz**

**Xebat bibê bir roj û şev**
**Bawer bikin gîşkî ji hev**
**Ji Kurdistan yek tev-ger**
**Ew tev-ger ra li me pîroz**

**Roj û şevan yek tev-ger**
**Emê bibin ser leşker**
**Tev da destan bidin hev**
**Tiving û tang li me pîroz**

**Tev-ger bikin wekî mar**
**Li her derê bibin şêr**
**Bi Feqîr ra herin pêş**
**Kar û xebat li me pîroz.**

**Feqîr Ahmed**
**Ji Dîwana reş I**

www.arsivakurdi.org



*Delegasyona Parlamentoya Kurdistanê di civîna li gel Komîteya Giştî ya Federasyonê re*

# Civîna dîrokî ya Komîteya Giştî

*** Cara yekem di dîroka Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê de, delegasyona Parlamentoya Kurdistana Iraqê bi beşdariya Serokê Parlamentoyê yê Dewleta Federal a Kurdistana Iraqê berêz Cewher Namiq û endamên delegasyonê berêzan Sadî Pîra, Fransis Şabo û Heme Necim di civîna Komîteya Giştî ya Federasyona di roja 15 - ê Çiriya paşîn de beşdari kirin.**

*** Serokê Parlamentoya Kurdistanê berêz Cewher Namiq û parlamenterên hêja Sadî Pîra, Fransîs Şabo û Heme Necim li ser kar û barê Dewleta federal a Kurdistana Iraqê agahdarî dan.**

*** Di axaftina xwe de, berêz Cewher Namiq diyarkir, ku Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê nimuneyek herî baş e di pêkanîna dezgehên netewî yên Kurd de û di Parlamentoya Kurdistanê de gelek caran li ser vê yekê hatiye axaftin.**

Komîteya Giştî ya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, di roja 15 - ê çiriya paşîn de, di dîroka xwe de di civîna herî girîng de rûnişt. Di civîna Komîteya Giştî ya Federasyonê de li gel endamên Komîtê de, delegasyona ji Parlamentoya Kurdistanê jî beşdar bû. Bêgûman amadebûna Serokparlamento berêz Cewher Namiq, alîkar serokfraksiyona Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê berêz Sadî Pîra, Parlamenterê ji Tevgera Demokratîk a Asûrî berêz Fransîs Şabo û parlamenterê serbixwe ji lîsteya PDK, profesor Heme Necîm, germiyek mezin da kombûna Komîteya Giştû ya Federasyonê.

**CIVÎNA KOMÎTEYA GIŞTÎ** bi beşdariya delegasyona Parlamentoya Kurdistanê, bi axaftina Serokê Federasyonê berêz Vîldan Tanrikulu destpêkir. Serokê Federasyonê di axaf-



www.arsivakurdi.org

tina xwe de agahdarî li ser kar, xebat û naveroka federasyonê da delegasyonê û li ser navê civata Kurd li Swêdê, bixêrhatinek germ da delegasyonê.

**BERÊZ CEWHER NAMIQ** - Serokê Parlamentoya Kurdistanê, spasiyên xwe diyarî Komîteya Giştî ya Federasyonê kir, ji bo amadekirina civînek weha. Berêz Namiq got, ku cîhê Federasyona Komelên Kurdistanê di nav dezgehên neteweyî yê Kurd de, cîhek taybetî ye. Diyarkir, ku di nav Parlamentoya Kurdistanê de gelek caran li Federasyonê wekî nimuneyek hatiye meyzekirin. Herweha berêz Cewher Namiq nîşanda, ku alîkariya Federasyonê di projekta Qandîl de, cîhê şahnaziyê ji bo civata Kurd li Swêdê ye.

Cewher Namiq, paşî wê agahdariyên fereh li ser kar û barê Parlamento, Hukumet û Dewleta federal a Kurdistana Iraqê da Komîteya Giştî ya Federasyonê. Serokê Parlamentoya Kurdistanê nîşan da, ku " Dewleta Federal a Kurdistana Iraqê, bi awayek dîrek nûnerîtî ya 3, 5 milyon Kurd ên Kurdistana Iraqê dike, lê ew hêvî û umîda tevayiya Kurd dike ". Herweha diyarkir, ku îro problema aborî li Kurdistana Iraqê problema bingehîn a Neteweyê Kurd e. Li ser Kurdistanê du embargo tên tetbîqkirin. Yek a Neteweyên Yekgirtî ya ku li ser tevayiya Iraqê, di nav de Kurdistan e, ya din jî ya Dewleta Iraqê li ser Kurdistanê ye. Gava Hukumeta Iraqê bi tevayî ji Kurdistanê vekişiya, hemû kargehên li Kurdistanê heyî xerab kirin. Îro li tevayiya Kurdistana Iraqê tenê 2 kargeh di berhemê de ne. Ew jî ne bi hêza xwe ya pêwîst kar dikin. Li Kurdistanê sutemenî ( tiştên şewitandinê ) û neft tûne ye. Zivistan jî li pêş me ye. Parlamento ji bo derbaskirina vê problemê çi ji destê wê tê dike. Ev seredan a me li Ewropa jî girêdayî van probleman, herweha danasîna Parlamentoya Kurdistanê bi dewlet, hukumet û parlamentoyên Ewropayê ye.

Berêz Cewher Namiq li ser seredana xwe li Almanya' yê û Swêsra' yê jî agahdarî dan endamên Komîteya Giştî ya Federasyonê. Li gor axaftina berêz



*" Dewleta Federal a Kurdistana Iraqê, nûnerîtiya 3, 5 milyon Kurd dike, lê ew hêvî û umîda tevayiya Netewê Kurd e "*

**Cewher Namiq**
**Serokê Parlamentoya Kurdistana Iraqê**

Namiq, li Almanya' yê bi gelek berpirsiyarên dewlet, hukumet û parlamentoyê hevdîtin hatine pêkanîn. Berhemêk balkêş ji seredana delegasyona Kurdistanê li Almanya' yê ew bû ye ku, di civîna li gel serokbelediye ya Hanoverê, biryar hatiye dan û protokol hatiye çêkirin, ku bajarê Helepce li gel Hanover û Hîroşîma bajarê bira bê diyarkirin. Di vê sala pêşya me de jî dê li Hanoverê festîvalek mezin ê navnetewî di navbera van her sê bajarêb bira de bête kirin. Her wekî tê zanîn Hanover, bajarek ku herî zêde di Şerê cîhanê yê Duwem de xerabûyî bû, ji % 85 Hanover di şer de hatibûye xerakirin. Hîroşîma ji xwe di vî şerî de bû bû hedefa çekên atomî. Li Swêsre' yê jî li gel berpirsiyarên hukumet û parlamentoya welêt civîn hatine pêkanîn. Herweha li wir li gel gelek rêxistinên navnetewî, wekî UNCHR, UNICEF, Rêxistina Mafê Mirovan ên Neteweyên Yekgirtî û hwd. civînên girîng çêbûne.

Di dawiya civînê de berêz Vîldan Tanrikulu, li ser navê hemû endamên Federasyonê, Komîteya Giştî û civata kurd spasiyên xwe pêşkeş kirin.



www.arsivakurdi.org

# HÊVÎ XURT DIBE, LÊ GELEK KARÊN KU DIVÊ BÊN KIRIN HENE

## Reşît Burhan

Kovara Rohat (hejmar 23 ) meqalek ji kovara "Exbar-el Harb" stendiye. Di vê meqalêde weha dinivîsîne: "Ji niha de alîkî ayahda (mûsteqbel) Kurdistanê xuya dibe. Belê Kurdistan di welatên rohelatê nizing de, dê bibe Îswiçreya şerqê. Daîra rêhesinên Iraqê bi hevkariya wezareta nafîê û hevotina qaymaqame textê Iraqê di çiyayên Kurdistanê de dest bi çêkirina Otel û mêvanxanan kirine" (Exbar el Harb-29 Kanûna paşîn 1944 hejmar 53). Nêzîkî pencî sal berê, hêviya biyaniyan hebû, ku Kurdistan bibûwa Îswîçreya rojhilata navîn.

Lê mixabin îro ew Kurdistan weran bûye. Ev wêran kirin berhema neyarên har in. Lê tarîxê nîşan daye ku wêran jî dikarin bibin şênayên geş û rin. Îro hêvîya ku wêranên Kurdistana başûr bibin şênayan geş û xweş, xurt e. Kurdan firseteke tarixî bi dest xistine. Ji bo ev firset ji dest neçe, divê hemû îmkan bên xebitandin. Tev ku Kurdistan bûye wêran jî potansîyela Kurdistanê ya ku dikare welêt bike Îswiçreya Rojhilata Navîn, hîn jî heye. Ev ne xewn e û ne jî xeyal e. Lê belê gelek tiştên ku divê Kurd bikin hene . Ji van tiştan yek jî Kurdên hal û wextên wan xweş (dewlend), divê hinekî ji kapîtalên xwe derbasî Kurdistana azad bikin. Ev ne hew vatiniyên kurdên dewlemendên kurdistana başûr e. Ev vatinî, vatiniya kurdên hemû percane û nemaze ya kurdên li dervayî welêt dijîne.

Ji bo mirovên kurdistana azad xwarin, kinc, xanî, avahî uhw. divê. Bi zikên birçî, bi piştên tazî, bi bêkarî û bi bê hilberîn, domkirina azadîyê, ne mumkûne. Kolonyalîsta strûktûra hilberina Kurdistanê xerakiriye. Hilberîn, hema hema sekiniye. Kominîkasyon ji ortê rakirine. Di vê rewşê de, civak nikare fonksiyonên xwe bi cîh bîne. Li hemberî van tiştên xerab, tiştên gelek baş jî henin. Êdî çarenûsa kurda di destên wan deye. Kurd azad in. Meclîs û hukûmeta meşrû hene. Kurd dezgehên xwe yên neteweyî avadikin. Di nava muxalefeta Seddam de jî Kurd, di pozîsyoneke xûrt de ne. Gavên dewleteke federatîf tên avêtin. Rewşa dinyayê, di lehê me de ye. Lê belê tev ku Kurdistan xwediyê potansiyela xurt ya ekonomik e jî kapîtalên biyanî nayên û weha xuya ye ku wê di demek dirêj de jî neyên welatê me. Kapîtalên biyanî riskên mezin nadin ber çavên xwe. Lê kapîtalên Kurdên welatparêz, dikarin derbasî Kurdistana başûr bibin.

Ji bo derbasbûna vî qapîtalî, gelek sebeb, rê û metod hene. Yek jê, ev vatiniyek welatparêzî ye. Ya dûyem û ya esasî, dema kapîtalên kurd derbasî Kurdistana Başûr bibin, dê Kuridstan di hêla ekonomîk de peşt keve (ku ev gengaz xûrte). Wê demê ev kapîtalê ku rîsk daye ber çavên xwe, dê xwedîmafên berhema baş be jî. Sibehê, Kurdistana xurt û hukûmeta wê, dê qencîya vî kapîtalî ji bîr neke. Ya dinê jî ev kapîtal berî ku qapîtalê dereng were, wê rêxistinên (organîzasyon) xwe û qenalên xwe ava bike. Ji ber vê yekê di pêş de, wê awantajên wan bêtir bin. Di peşiyê de, ev qapîtalên derbasî welêt bibin, wê ne gelek bin, lê dikare gengaz û xebatên wan bêtir bibin. Ji ber vê yekê dive, meclîs û hikûmet, ji bo dawetkirina Kurdên dewlemend, bangekê bikin. Divê baweriyê bidin van kesan, rê û metodên lojîk (mantiqî) pêşniyarî wan bikin. Hukûmet divê komiteyên bi kar û barê kapîtalên biyanî rabedamezirîne. Meclîs jî kanûnên ji bo vî kapîtalî gerxîne. Ji bo ev kapîtal di hilberînê de bête razan, divê berpirsiyarên civaka azad, bi van karan rabin. Divê, ji bo karên qapîtalê biyanî baş bête meşandîn, hemû tedbîr bên standin.

Dewlemendên welatparez dikarin ya sermayên xwe bi tenê derbasî welêt bikin, ya jî dikarin şîrketên pardar ava bikin û biçin welêt. Ew dikarin, an bi kûrdên kurdistana başûr re an jî bi dezgehên dewletê re şirîkatiyê daynin. Alternatîveke din jî heye; ew jî ev e ku ew dikarin bi serên xwe jî dezgehên hilberînê daynin. Divê di gavên pêşîn de dezgehên hilberîne di sektorên agronomî (zîraat), ticarete, turizmê û transportê de bin. Wê di peşiyê de dezgehên hilberîne ne mezin bin, lê li gor gengaz û ihtiyacê dê mezin bibin.

Pêwîstiya Kurdistanê heye ku malên dewletên cîrana jî derbasî Kurdistanê bibin. Ev ji bo avakirina welêt , pirr girîg e. Ji bo vê fonksiyonê û fonksiyonin din, divê rêxistinên (Firma) ekspert û inportê bên danîn. Axa Kurdistanê fireh e û bi bereket e. Mirov dikare çiftlika ava bike û di peş de, berên ku bên standin, exportî dewletên rojhilata navîn bike...

Ez dizanim ku qapîtal ji bêstabîlîtiye hez nake. Gelek tiştên ku qapîtalê welatparêz dikare bike, hene. Wendankirin jî heye... Lê ev ne qumar e. Kara mezin jî avakirina Îswîçreya Rojhilata Navîn e... Roj roja şerefê ye...

# Nazîzm û turanîzm

Cemal BATUN

Di dawiya meha Çiriya Paşîn de li bajarê Möln li Almanya' yê jinek û du zarokên tirk ji alî Neonazîstên almanî ve hatin kuştin. Ev bûyer ji alî raya giştî ya cîhanî ve bi tûndî hate rûreş - kirin. Herweha tirs a ku nîjadperestî li Almanya' yê xurt dibe û gelek xortên alman dikşîne nav hêzên xwe, desthilata vî welatî bi xwe mecburkir, ku kirinên dijwar hemberê neonazîstan bigre. Çend rêxistinên rastên tûj hatin qedexekirin û berpirsiyarên wan hatin girtin. Bêguman kuştina sê tirkan, di nav wan de du zarok, reaksiyona siyasî ya Enqera' yê pêşberê Almanya' yê bi germî anî rojevê. Ev reaksiyona tebîî ya dewleta tirk ji alî danezanên ragihandinên Tirkiyê jî bi ferehî hat girtine dest an. Li gelek bajarên Tirk jî xwepêşandan li dij vê kirina neonazîs - tan pêkhatin. Xelkê tirk bi sloganên hişk derketin kolanan û bangkirin : "Bimre Neonazîzm", "Berpirsiyarên vê kirinê divê bên mehkûmkirin", " Dewleta me divê li karkerên me li derveyî welêt xwedî derkeve" û... "Bextiyarî ye yê ku bêjê ez tirk im", "Yek tirk hêjayî tevayiya dinyayê ye "...

**MIROV DIKARE** hîsên tirkan hemberê kirina neonazîstan baş fambike. Lê, gelo gava mirov bibêje : "Bextiyariya herî mezin tirkbûn e", " yan Yek tirk hêjayî tevayiya dinyayê ye " ( Bi taybetî jî ev sloganan li hemberê Kurdan tên avêtin û li ser çiyayên Kurdistanê bi kevirên sipî û mezin tên nivìsandin. Di meydanên bi sedên bajar û gundên Kurdistanê de di bin peykerê Kemal Ataturk de nivîsî ye ) çi ferq di navbera xwestinên Neonazîstan û van gotinan de heye ? Beşdarên van xwepêşandanan, gelo tê nagihin, ku bêhna nîjadperestiya herî tuj ji van sloganên wan tên.

Pirs bê şik ne weha basîte jî. Bi giştî li hemberê pirsgirekên netewî li Tirkiyê û bi taybetî li hemberê Pirsa Kurd bi dehên salan desthilatên Tirkiyê îdeolojiya turanîzmê bikar anîn. Di destpêka sedsala me de li hember Pirsa Kurd metoda dihat pêş tenê kirinên eskerî bûn. Lê, piştî neserkeftina van metodan, li gel kirinên leşkerî gelek metodên din jî hatin bikar anîn. "Parezgeriya gundan", "Neqebûlkirina hebûna Kurdan", "Perwerdekirina şagirtên Kurd, bi îdeolojiya resmî ya tirk - Kemalîzm, wekî berdewama turanîzmê"çend ji van metodan e.

**TU CAR Û BI TU AWAYÎ** kuştina însanan ji bo reng, nîjad û ol a wan ne mumkune bê qebûlkirin. Divê di nav van kirinan de tu ferqî neye kirin. Kesê ku ji bo vê çendê tên kuştin - tirk jî bin, çînî yan japonî bin, somalî yan bengladeşî bin, divê ev kirin bê rûreş kirin. Standartên cuda di vê babetê de çênabe bên qebûlkirin. Lê, gava Kurd jî, ji bo nîjade xwe, ji bo xwestina mafên xwe yên tebîî tên kuştin, divê dîsa tirk derkevin kolanan û li hember van kirinên dewleta xwe yên rûreş xwepêşandanan bikin. Dîsa bangbikin - Bimre nîjadperestî ! Nebêjin "Bextiyariya herî mezin tirkbûn e" û "Yek tirk hêjayë tevayiya dinyayê ye". Bizanibin, ku demokratbûn ew e, ku tiştê mirov ji xwe re dixwaze, mafê gelên din e jî. Çawa li Almanya yê tirk dixwazin bibin xwedî maf wekî almanekî. Kurd jî wekî neteweyekî xwedî mafin, ku wekî almanan, swêdî yan belçîkiyan û wekî tirkan, li ser xaka xwe serbest û azad bijin. Lê, gava mirov tiştekî ji xwe re dixwaze û di bin pozê wî de, kirinên xerabtir li hember neteweyekî din tê bikar anîn û yek bêdeng bimîn e, tu ciddiyet di xwestina mirov de ne mumkune bê qebulkirin.

**LI BAKÛRÊ KURDISTANÊ**, ya ku ji alî dewleta tirk ve hatiye dagîrkirin, her roj bi dehên welatparêzên kurd, bi destên hêzên tirk ve tên kuştin. Tevayiya dinyayê, dizane û dibêje, ku li bakûrê Kurdistanê mafên insanî bi tundî tên hilweşandin, demokrasî çi ye li vê dê nayê naskirin.

Nazîzm - îdeolojiya nîjadperestiyê ye. Nîjad a xwe li ser hemûyên din dibîn e. Dibêje insanê wî ji insanê nîjadên din zanatir e, xweşiktir e. Divê nîjadên din nebin xwedî maf wekî wî. Nazîzm piştî Şerê cîhanê yê Duwemin şkest. Lê, îro bi taybetî li Almanya' yê (welatê xwe yê dayik) dîsa serî radike. Ev tişt ji bal dewleta Alman bi xwe ve naye qebulkirin û kirinên qanunî li dij wan tên rojevê.

Turanîzm - ew jî îdeolojiya nîjadperestiyê ye. Tirkan li ser hemû nîjadên din dibîn e. Li gor vê îdeolojiyê tirk ji hemû nîjadên din zanatir û xweşiktirin. Yek tirk hêjayî tevayiya dinyayê ye. Li tevayiya dinyayê tenê li Tirkiyê ev gotin ji bal desthilatê bi xwe ve tên qebulkirin. Gotinên turanîzmê gelek normal e, ku ji bal berpirsiyarên dewletê ve bên gotin.

Tu ferq di navbera nazîzm û turanîzmê de tune ye. Ferq tenê ew e, ku desthilat bi xwe li Tirkiyê turanîzmê xurt dike. Dixwaze turanîzm hakimiyeta xwe li ser mêjiyên tevayiya xelkê de bileyze. Vêce gel bi xwe divê vê îmkanê nede. Gava mirov derdikeve kolanan û nazîzmê rûreş dike, bi xwe nazîstî ango turanîzmê neke. Divê tirk bi xwe li hember kuştina kurdan derkevin û desthilata xwe rûreş bikin. Nazîzm û turanîzmê bixin rûpelên reş ên dîrokê. □

www.arsivakurd.org

# CIVÎNA KONSEYA WEZÎRAN YA KONFERANSA EWLEKARÎ Û HEVKARÎ YA EWRÛPA LI STOCKHOLMÊ ÇÊBÛ

## Vîldan Tanrikulu

Di 14-15 Çileya Pêşîn ya 1992 yan de Konseya Wezîran ya Konferansa Ewlekarî û Hevkarî ya Ewrûpa (KEHE) li bajarê Stockholmê çêbû. Di civînê de bi serokatiya wezirên kar û barên derve, delegasyonên 51 welatan beşdar bûn. Bi vê berfirehiya xwe ve KEHE bûye rêxistin û platformeke nevdewletî û navneteweyî ku herçend navê wê bi EWRÛPA xelas dibe jî, dewletên sê qita tîne cem hev. Ji Qazakistan heta Kanada îroj 52 dewlet beşdarî vê pêvajoyê (prosesê) dibin. Endametiya Yugoslavya nuha hatiye cemidandin û delegasyona wê beşdarî civînan nabe.

Wezira kar û barê derve ya Swêdê, Margaretha Af Ugglas li gel civîna Stockholmê ya KEHE ve bû seroka Konseya Weziran ya KEHE jî. Bi vê sîfata xwe ve, di 14.12.1992 yan de civîna Stockholmê vekir

û serokwezîrê Swêdê Carl Bildt ji bo axaftina vekirina civînê dawetî mîkrofonê kir. Piştî axaftina Carl Bildt, civîna Stockholmê ya KEHE dest bi munaqeşeya rojeva civînê kir. Ev munaqeşe ji press û mêvanan re girtî bû. Di rojeva civîna Stockholmê ya KEHE de ku ji 15 xalan pêk dihat, pirsa Yugoslavya û avakirin, struktur û berpirsiyariyên du komîsyonên KEHE (Komîsyona parastina kêmaniyan û Komisyona çareserkirina nakokiyan bi aşitî) xalên sereke bûn. Li ser rewşa Yugoslawya û bi taybetî jî di derheqa şerê li Bosna- Herseke de, cudabûna dîtinên beşdarên KEHE, hişt ku civîna Stockholmê nêzî du saet û nîva bi derengî biqede. Civîn di 15.12.1992 yan saet 15.30 de xelas bû. Wezirê kar û barên derve yê Tirkiyê Hikmet Çetin, yek ji wan aliyên ku, mudaxeleyeke eskerî li hember Sirbistanê û rakirina ambargoya ticareta eskerî ji ser Bosna-Hersek bi awayek xurt dida pêş b. Di beyana dawî ya civîna Stockholmê ku li gel biryarên wê ve ji aliyê wezîra karû barê derve ya Swêdê û seroka Konseya Wezîran ya KEHE Margaretha Af Ugglas ve bi presskonferansek hat amadekirin ji bilî biryara tawanbarkirina Sirbistanê ji bo şerê li Yugoslavyayê kevn û biryarên li ser komîsyonên nûh yên KEHE, tê gotin ku "**Konseya Weziran berdewamiya lihevhatinên (peymanên) xwe li ser bikaranina pêvajoya KEHE ji bo çespandina mafên mirovan, demokrasi, hukmê qaîde û qanûn, azadiya aborî wekî avakarên aşitî, ewlekarî û aramî û pêşîlêgirtin, lênêrîn (lêkolîn) û çareserkirina nakokiyan di herêma KEHE de, diyar kirin.**"

**"Li gor tiştên ku li jor hatin diyarkirinê, Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê bangê KEHE dike ku, li hember Tirkiyê tedbiran bigre da ku hebûn û mafên mirovan ya kurdan û her wisa mafê wan yê tayînkirina çarenivisa xwe bên nasîn, û li gora prensîbên ku ji aliyê KEHE ve hatine qebûlkirin, di sewiya neteweyî û navneteweyî de gelê kurd bibe xwedî garantîya parastina hiqûqî ya mafên xwe.**

Di civînê de ji derveyî delegasyonên fermî yên dewletên endam, nûnerên rêxistinên ne girêdayî dewletan jî (Non-Govermental Organisations-NGO) jî bi çalakiyên xwe ve beşdar bûn da ku pirsên cuda ku di destûra bingehin ya KEHE ya ji peymana Helsinki ya sala 1975 bînin rojevê û bi delegasyonên beşdar ve li ser van pirsan peywendiyan deynin. Nûnerên hin rêxistinên piştgirî ya mafên mirovî ya kurdan û rêxistinên demokratîk û kutlewî ya kurdan jî beşdarî civînê bûn. **Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê bi sê nûnerên xwe , Vildan Tanrikulu, Ahmet Karamus û Mahmut Kiper ve, di nav van çalakiyan de cîh girt. Her wisa, ji Komeleya Navneteweyî ji bo mafên mirovan li Kurdistanê Sertaç Bucak, ji Komîta Swêdê ji bo mafên mirovan ya gelê kurd Berith Eriksson û Ingela Mårtenson û Sekretera komîtê, Komîta Danimarkayê ji bo mafên mirovan ya kurdan, Komîta piştgirî ya Norveçê li gel Kurdan, ji Fonda Piştgirî ya Kurdistanê Taha Berwarî û Arî Nûrî Riza bi nûnerî û çalakiyên xwe ve beşdarê civîna KEHE ya li Stockholmê bûn. Nûnerên van rêxistinên kurd û piştgiriya gelê kurd bi hevkarî û koordîne, bi peywendî û çalakiyên xwe ve, pirsa gelê kurd di nav hidûdên dewleta Tirkiyê ku endameke kevn ya pêvajoya KEHE ye, anîn rojevê û ji delegasyonên cuda doza piştgirî û alîkariyê kirin.**

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, dosyayek ku ji hin peymanên navneteweyî li ser kurdan û dokumentên li ser hovitiya dewleta Tirkiye li hember gelê kurd li Kurdistana Bakûr li gel daxwaznameyek ji delegasyonên beşdar pêk hatî amade kir û gihand nêzî 30 delegasyonên cuda. Di daxwaznameya Federasyona Komeleyên Kurdistanê de ji Qanûna Esasî ya Tirkiyê û ji hin qanûnên din ku hebûna gelê kurd înkar dikin û xebatên jibo mafên gelê kurd tawanbar dikin, mînakên vekirî hatibûn nivîsandin da ku naveroka nijadperest û dualî ya sistema hiqûqî ya dewleta Tirkiyê bê teşhirkirin û her wisa durûtiye dewleta Tirkiyê li ser pêvajoya demokrasiyê li Tirkiyê û nasina "realita kurd" ku taybetî piştî avabûna hukumeta koalisyonê di navbeyna DYP û SHP (Partiya Rêya Rast û Partiya Sosyal Demokrat ya Gel) di platformên weha de tê rojevê, bê nasîn,



www.arsivakurd.org

teşhirkirin û mehkumkirin. Bi van mînakên eşkere ve tê diyarkirin ku îroj di nav hidûdên dewleta Tirkiyê de tu garantiya hikûqî li ser naskirin û mafên neteweyî yên bingehîn yên gelê kurd tune ye. Berevajî, îroj li Tirkiyê taybetî jibo kurdan sistemeke cuda ya hiqûqî hem di qanûnan de hem jî di tatbiqata qanûnan de heye û ev yek jî li dijî prensîbên bingehîn yên KEHE ye. Di daxwazname yaku ji aliyê serokê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ve hatibû îmzekirin ev daxwaz cîh girtibûn. **"Li gor tiştên ku li jor hatin diyarkirinê, Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê bangê KEHE dike ku, li hember Tirkiyê tedbiran bigre da ku hebûn û mafên mirovan ya kurdan û her wisa mafê wan yê tayînkirina çarenivisa xwe bên nasîn, û li gora prensîbên ku ji aliyê KEHE ve hatine qebûlkirin, di sewiya neteweyî û navneteweyî de gelê kurd bibe xwedî garantîya parastina hiqûqî ya mafên xwe.**

**Em pêşniyar dikin ku, KEHE di hewldanên xwe yên di vê sewiyê de ku ji bo çareserkirina nakokiyan bi rêya aşitî û parastina mafên kêmaniyan hin dezgehan ava dike, divê di amadekirina misyoneke çavdêrî ya daîmî bi mafên tevgereke azad ya bê hidûd ji bo her aliyên mafên mirovan û parastina kêmaniyan û çareserkirina nakokiyan (Conflict), misyona Konseya Parastinê ya Yekitiya Neteweyan (UNSCAT) li Iraqê bibe modelek."**

Di daxwaznameya hevbeş ya çar komiteyên piştgiriya mafên mirovan ya kurdan ku ji aliyê serokên van komiteyan ve hatibûn imzekirin, piştî ku rewşa gelê kurd li bakûrê Kurdistanê û hovitiyên dewleta Tirkiyê tê diyarkirin, ev daxwaz tê amadekirin; **" Ji ber vê yekê û li gora ev rewşa katastrofî ku li herêmên kurdî li Tirkiyê ye,..... em pêwistiyek acil dibînin ku KEHE berê xwe bide îmkanên şandina komîsyoneke raportor û tesbitkirina rastiya li vê herêmê û li gor mekanizmayên însanî yên KEHE tedbirên din yên pêwist bên girtin."**



Her wisa, di daxwaznameya hevbeş ya 15 hêzên siyasî ji tevahiya Kurdistanê de jî bala beşdarên KEHE tê kişandin li ser êrişên Tirkiyê li başûrê Kurdistan û hovitiya wan li bakûrê Kurdistanê û tê diyarkirin ku **"... Divê pirsa kurd li Tirkiyê û Tirkiye bi xwe bikeve rojeva KEHE, berê ku Kurdistana bakûr û başûr bibe Yugoslavyayek nûh."**

Rêxistina Efû ya Navneteweyî beşa Swêdê jî bi îmza sekretera giştî Anita Klum nameyek li gel rapora dawî ya Rêxistina Efû ya Internasyonal li ser Tirkiyê ku bi navê "Tirkiye, Diwarên ji Cam" di meha Çirîya Paşîn de hatibû amadekirin, ji delegasyona Swêdê ya KEHE daxwaz tê kirin ku "divê bala xwe bidin ev rapora li ser Tirkiyê ji ber ku Tirkiye diwaxe bikeve nav Bazara Hevkar ya Ewropayê".

Komîta Swêdî ji bo Mafên Mirova li Tirkiyê jî bi nûner û raporên xwe ve bala delegasyonên beşdar dikişandin ser hovîtiyên Tirkiyê li Kurdistana Bakûr û rewşa mafên mirovan li Tirkiyê.

Ji bilî van rapor, dokument û daxwaznameyên ku li ser pirs û rewşa gelê kurd û mafên mirovan li Tirkiyê bo delegasyonên beşdar hatine belavkirin , nûnerên Federasyona Komeleyên Kurdistanê Li Swêdê û rêxistinên ku li jor hatine binavkirin pêwendiyên yekser bi hin delegasyonên dewletên beşdar û nûnerên komîsyonên KEHE ve danîn. Di van pêwendiyan de jî, hem agahdarî û daxwazên me hatin amadekirin û hem jî li ser mafên neteweyî yên gelê kurd li Kurdistana Bakûr û prensîb û hewldanên KEHE pirs ji van delegasyon û nûneran ve hatin kirin.

Di pêwendiya ku bi delegasyonên dewletên bakûr (Swêd, Norveç, Danimarka, Finlandiya û Island) ve hat danîn, diyar bû ku pirsa kurd di rojeva delegasyonên van dewletan de ye û di her pêwendiyên xwe di nav pêvajoya KEHE de û pêwendiyên xwe yên dualî li gel Tirkiyê ve pira mafên gelê kurd tê munaqeşekirin û hewl didin ku ev pirsa di sewiyên hin bilind de bê rojevê û bi rêyek aşiti bê çareserkirin.

Her wisa nûnerên rêxistinên beşdar yên li jor binavkirî, li gel sekreteriya KEHE, berpirsiyarên komisyonên mafên mirovan, çareserkirina nakokiyan bi aşitî, parastina kêmaniyan ve pê-

www.arsivakurdi.org

wendî danîn û çi pirs û çi jî agahdariyên li ser rewşa gelê kurd anîn ziman.

Bi vê beşdarî û çalakiyên Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê û rêxistinên din yên li jor binavkirî ve, civîna Stockholmê ya KEHE bû hengavek gring ji bo teşhirkirina hovitiyên dewleta Tirkiyê li hember gelê me. **Taybetî jî, ew hevkarî, perspektifa hevbeş û koordinasyona ku di navbeyna nûnerên van rêxistinan de di civîna KEHE de hat amadekirin çi ji aliyê effektifî ya çalakiyan ve çi jî ji aliyê peydakirina baweriyê li ser delegasyonên dewletên beşdar de bû mînakek hêja. Bi vê awayê xebatê em dikarin gelek kêmaniyên xwe ji holê rakin, hevûdu bi kapasita xwe yên cuda temam bikin, yekdengiyek xurt li hember dijminê gelê xwe amade bikin û li gel dostên gelê me hin bi hêzeke xuttir di nav xebata bidestxistina mafên xwe yên neteweyî û demokratîk de cîh bigrin.**

*Stockholm, 18.12.1992*




# KEHE ÇI YE ?

KEHE (Konferansa Ewlekarî û Hevkarî ya li Ewrupa), platform yan jî rêxistineke navdewletî ye ku di dawiya salên 1960 an de pêvajoya pêwendiyên navbeyna pakta Warşova û dewletên ewrupa de li ser ewlekarî ya li Ewrupa hatiye damezrandin. Bi daxuyaniya Helsînkî ya di sala 1975 de bi vê navê nuha ango KEHE ev pêvajo (proses) şikleke vekirî girt. Di destpêkê de 35 dewlet, (ji bilî Arnawutluk tevahiya dewletên Ewropa li gel DYA û Kanada) beşdarî KEHE dibûn. Lê îroj hejmara dewletên beşdar yên KEHE bûne 52 û ne tenê bi Ewrupa bi hidûd e. Japoya û hin dewletên li dora Derya Spî ku li derveyî Ewrupa nin jî bi hin şekla beşdarî xebatên KEHE dibin.

Peymana grîng ya duyemîn di meha Tebaxê ya sala 1990 an de li Parîsê hat îmzekirin û bi navê "Destûra Parîsê" tê nasîn. Bi vê peymanê re biryar hat girtin ku, ji du salan careke Civîna Bilind ya KEHE di sewiya serokwezîr yan jî serokdewletên beşdarên KEHE çêbibe û ya dawî di buhara 1992 yan de dîsa li Helsînki çêbû.

Daxûyaniya Helsînki ku deh xalên presîbî yên KEHE diyar dike wekî destûra KEHE tê qebûlkirin. Ev deh xalên prensibî peywendiyên nav dewletên beşdar aleqedar dikin, ev in;

**1- Wekheviya serbixweyî ya dewletan û hurmetgirtina mafên ku ji serbixwebûnê tê fahmkirin.**

**2- Ji bikaranîna tehdît yan ji êrişkarî xwe dûrxistin.**

**3- Hurmetgirtina hidûdan.**

**4- Serweriya erdê (teritoyuma) dewletan**

**5- Bi aşitî çareserkirina nakokiyan.**

**6- Mudaxelenekirina pirsên navxwe yên dewletan.**

**7- Hurmetgirtina mafên mirovan û azadiyên bingehîn ku azadiyên fikirandin, wijdan, dîn û bawerî di nav de nin.**

**8- Wekheviya mafên gelan û mafê çareniviisê.**

**9- Hevkariya di nav adewletan de.**

**10- Ji dil bicîhanîna berpirsiyariyên li gora hiqûqê navneteweyî.**

Organa birêvebir yê KEHE Konseya Weziran e ku ji Wezirên Karûbarên dervê yên dewletan pêk tê û bi kêmanî salê careke dicive. Nuha çar organên daîmî yên KEHE hene, sekretariya KEHE, Komîsyona Mafên Mirovan, Komîsyona çareserkirina nakokiyan bi aşitî û Komîsyona Mafên Kêmaniyan, Komîsyona çareserkirina nakokiyan bi aşitî û Komîsyona Mafên Kêmanihan pêk tê.

# KOMELEYA GÖTEBORG

## Mustafa Aydogan

**Berbang-** Weke ku hun dizanin, kovara Berbangê di hejmara 81'ê de bi hevpeyvîna bi komeleya Eskilstuna re, dest bi cîhanîna biryara xwe ya di derheqa danasîna komeleyan û çalakiyên wan kiribû. Di hejmara 82-83'an de bi hevpeyvîna bi Komeleya Jinan re jî ev kar hate berdewamkirin. Em dixwazin bi lênêrînên we yên di derheqa vê biryarê û awayê meşandina vî karî ve dest bi hevpeyvîna xwe bikin. Gelo hun di derheqa vê biryarê de çi difikirin?

**Ata-** Ev biryareke gelek baş bû. Bi rastî di vî warî de, di Berbangê de valabûnek hebû. Bi vê biryarê rê ji dagirtina vê valabûnê re hate vekirin. Di tevaya Swêdê de, di nava komeleyên Kurdan tu dîalog û komunîkasyon tunebûn. Hayê komeleyan ji hevdu tunebûn. Di gelek komeleyên din, ew çalakîyên ku ji bo Kurdên ku li dervayî welêt dijîn tên kirin, ji terefê komeleyeke di, nayê zanîn. Wek nimûne; me li Goteborg dest bi tiyatro û hinek kursan kir. Lê ev ji terefên komeleyên di, nayên zanîn. halbûkî çalakiyên me dikarin ji bo wan bibin nimûne. Û her weha yên wan jî ji bo me dikarin bibin nimûne.

**Îsa-** Ev biryar û gavên di vê rêyê de tên avêtin, bicîhanîna daxwazên ku di dilên me de hebûne. Me hemuyan hêviya gaveke weha dikir. Ez bawer dikim ku ev di rêya bersivdana daxwazên komeleyan de hewldaneke pirr hêja ye.

**Berbang-** Gelo mirov, ji bo baştir meşandin û pêşdebirina vî karî, dikare çawa bike?

**Sebrî-** Nuha bi vî şiklî baş e. Biryara danasîna komeleyan gaveke erînî ye û nuha ji bo destpêkê têr dike. Lê di rojên pêş de, mirov dikare vê xebatê li gor ihtiyacê pêşdetir bibe.



**Berbang-** Di têkiliyên me û komeleyan de, pirsên herî girîng ev in; " ji bo di nav rûpelên Berbangê de rê ji komeleyan re bêtir vebe, divê çi bên kirin? Di derheqa çareserkirina hinek problemên di warê xebata demokratîk li Swêdê, Berbang dikare rolek çawa bilîze? û hwd " Gelo hun di vî warî de çi difikirin? Çi pêşniyarên we hene?

**Ata-** Federasyon bi xwe yekitiya komeleyan e. Federasyon, bê hebûna komeleyan nikare bête fikirandin. Organa herî bilind ya yekitiya komeleyan e. Madem Berbang organa federasyonê ye, wek organa giştî ya komeleyan jî tête hesibandin. Heta stendina vê biryarê, bi awakî bi sîstem tu komeleyan xwe di nav rûpelên Berbangê de ne dîtiye. Li hemû bajarên Swêd, Kurd li gor sewiya bi hêzbûna xwe ya li wan bajaran, hinek kar û xebatan dikin. Lê li hember van kar û xebatan, tu helwesteke Berbangê diyar nebûye. Berbang weke ku li welatekî din derdikeve hereket dike û deriyê xwe ji van kar û xebatan re digre. Em hêvî dikin ku Berbang, piştî vê biryarê, deriyê xwe li van kêmaniyên di pêvajoya jiyana weşanî ya derbasbûyî de hatine kirin, bigre û çewtîtiyên di vî warî de dubare nebin. Berbang divê xwe di sînorên Stockholm de hepis neke û bibe dengê festîwal şev û çalakîyên din yên komeleyên kurd li Swêdê.

**Îsa-** Bi kurtayî, Berbang divê hewl bide da ku bibe platforma pijaka xebata demokratîk. Ger ev nebe, di warê lê bi xwedîderketina kovara Berbangê de, tu tiştekî zêde ji komeleyan nikare bête xwestin.

**Dara-** Federasyon ditwanî komelekan ziyatir le yektirî nizîk bikatewe. Bo nimûne, êsta min wam le em komîte de, çend kesanêk ke betwanan le Kurdan

www.arsivakurd.org

le şarî Goteborg da dejîn deyannasîn, dezanîn çi karêkiyan pê dekrê û ew kesaney karî hunerî dekin, detwanin bi Federasyonî bi nasênin. Federasyonî be komelekanî key binasênê. Êsta min le waneye nezanim Sundsval kêy lê ye, ke betwanayew adresekaniyan le kwê dejîn. Leme ziyatir, agahî le karekanî komelekan bêt û le yektiriyan nizîk bikatewe.

**Ata-** Kek Dara niqteke pirr girîng anî ziman. Ger Berbang bikaribe cîh bêtir bide komeleyan, wek nimûne, dê îmkanên tesîrkirina li Kurdên li Goteborg xurttir bibin. Ger Kurdên li vir dijîn, bigihêjin wê baweriyê ku tiştên di Berbangê de tên weşandin, bi rewşa van ve girêdayi ne, dê karê me hêsantir bibe û îmkana zêdekirina hejmara endaman jî bêtir bibe. Xurtbûna Komeleya Goteborg, xurtbûna Federasyonê bi xwe ye jî. Ev, ji bo hemû Komeleyan derbas dibe.



**Berbang-** Gelo li bajarê we çiqas biyanî hene? Mezintirîn grûba biyanî ji kîjan welatî tê?

**Ata-** Li gor îstatîstîkên Swêdîya %20-25 ên rûniştevanên bajarên goteborgê biyanî ne. Yanî her ji 4-5 kesan yek biyanî ye. Di nav biyaniyan de, Fînlandî grûba herî mezin e. Piştî wan grûba Latîn Amerîkaniyan tê. Li Goteborg nêzîkî 1500-2000 Kurd dijîn.

**Berbang-** Gelo Kurd cara yekem kengî hatine Goteborg?

**Dara-** Le 78-79 we Kurd heye. Bo yekem car, mebeste bo Swêd 75-76 be grûpêkî zor hatûn bo Uppsala û dûwayî hatûn bere û xwar bo Stockholm.

**Berbang-** Qesda min bajarê Goteborg bû.

**Dara-** Min xelk dinasim ke li 78'ewe le Goteborg dejîn.

**Ata-** Kurd cara yekem di salên 73-74 an de hatine Goteborg. Lê piştî van salan û nemaze piştî 1980'yî hejmara Kurdan bêtir bûye.

**Berbang-** Komeleya we kengî hate damezrandin?

**Ata-** Di destpêka 1980'yî de komeleyek hebû. Dûvre hejmara komeleyên Kurd li bajarên me derket duduyan. Ew biraderên ji perçên cîhê yên welatê me dihatin, komeleyên cîhê ava dikirin. Lê piştî 1984'an herdu komele bûn yek. Ji wê demê pê ve jî endamê Federasyonê ye. Lê hevalên kevn vê meselê baştir dizanin.

**Îsa-** Bi kurtî çîroka damezrandina komeleya me, weke ku heval Ata dibêje ye. Yekkirina herdu komeleyan, diwarê xebata demokratîk ya di nav civata Kurd li Goteborgê de, gaveke pêşde bû. Nuha jî li ser wê bingehê xebat tête meşandin.

**Ata-** Divê tiştekî din jî bête diyar kirin. Ew jî ev e; Li Goteborgê îro jî çend komeleyên Kurdan hene. Lê komeleya ku bi Federasyonê ve girêdayî û Kurdên ji her çar perçên welatê me himbêz kiriye, Komeleya me ye. Komeleya me di nav komeleyên Kurdan de, ya herî xurt e jî.

**Dara-** Bes wek komeley kulturî Kurdî, tenha komeley ême ye ke kulturî bêt. Çunke bo nimûne, Komeley Êranî heye, hendê Kurdên Êranî tiyaye ke pê dilên "Iranska Flykting Rådet" ke bo yarmetî penaberî Êranî ye.

**Berbang-** Gelo têkiliyên we bi Kurdên ku li bajarê Goteborgê rûdinin çawa ne? Ji vana nîspeteke çawa endamên Komelê ye?

**Ata-** Weke ku me berê jî gotibû, li bajarê me nêzîkî 1500-2000 Kurd hene. Ji vana 200 kes endamên Komeleya me ne. Lê hejmara kesên ku tên komelê 70-80'yî derbas nake. Weke hate xuyakirin piraniya Kurdên li Goteborgê rûdinin ne endamên Komeleya me ne. Sedemên vêya gelek in. Lê hinek Kurd jî ji ber bîr û baweriyên xwe, wek nimûne di nav Komeleyên Tirkan, Ereban û Farisan de kar dikin. Ev rewş hîn jî weha dewam dike. Lê ew Kurdên ku ne endamên Komeleya me ne jî di dema ku rewş li welatê me dijwar dibe de, aktîf dibin û di civîn û meşan de cîhên xwe distînin. Ev jî bi rewşa Kurdistanê ve girêdayî ye.

**Berbang-** Xuya ye ku di rewşên weha de têkiliyên we bi Kurdên ku ne endamên Komeleya we ne xurttir dibin. Di vî warî de tu hewldanên we yên taybetî hene?

**Ata-** Di şevan, di meşan û civînan de, em hewl didin ku bigihêjin van kesan. Ev hewldan encamên erînî bi xwe re tîne. Hejmara kesên ku tê û diçin Komeleyê, 70-80 ne. Lê di şevan de, 400-500 Kurd beşdar dibin.

**Berbang-** Gelo Kurdên ku li Goteborgê rûdine ji kîjan perçeyên welatê me hatine?

**Mîran-** Caran Kurdî Tirkiye ziyatir bûn. Belam êsta wa bizanim Kurdî Iraqew. Belam Kurdî hemû parçekanî tiya ye. Kurdî Êran ziyatir le Frisewe nizîktir e ta le Kurdî beşekanîtir· Maweyek be yekewe karman dekirt. Belam ciyabûnewe.

**Ata-** Kurdên ku li vir rûdine bêtir ji perçeyên Başûr û Rojhilat in. Lê têkiliyên me bi Kurdên ji perçeyê Rojhilat re ne xurt in. Ev kêmaniyeke gelek mezin e. Lê em hîn jî nizanin bê ka emê çawa bigihêjin wan û têkiliyên xwe xurttir bikin.

**Sebrî-** Kurdên ji perçeyê Rojhilat, berê dihatin Komeleyê. Lê vê dawiyê wan bi xwe, ji ber sedemên ku hîn jî ne diyar in, Komele terk kirin û bi vî awayî hatina wan kêm bû.

**Berbang-** Têkiliyên we dezgehên ku bi karûbarên biyaniyan ve mijûl dibin çawa ne?

**Ata-** Têkiliyên me bi van dezgehan re gelek baş in. Em di gelek kursên ku ji terefên wan ve tên amadekirin de beşdar dibin. Di pêşdebirina xebatê de alîkariya wan pirr e. Bi kurtî, tu gazinên

www.arsivakurd.org

ku divê nuha em bînin ziman nîne.

**Berbang-** Helwêstên Swêdiyên ku li Goteborgê rûdine, li hember biyaniyan çawa ne? Têkiliyên we bi wan re çawa ne? Wekî din jî rewşa tevgerên li dijî biyaniyan çawa ne?

**Ata-** Goteborg bi xwe bajarekî ku di warê tevgerên çep de, gelek bi navûdeng e. Grûbên çep yên Swêdî li Goteborg xurt in. Di dîroka Goteborg de Çep hertim roleke girîng lîstiye. Piraniya rûniştevanên bajarê goteborg bi xwe jî ji biyaniyan pêk tê. Wek nimûne, Beriya nuha bi çend sedsalan Valon hatine Goteborg. Dûvre karkerên ji Îtalya berê xwe dane vî bajarî. Ev biyaniyên ku hatine Goteborg, di avakirina bajêr de, roleke mezin lîstine û xwedî kedeke ku nikare bête ji bîr kirin. Ji ber vê yekê, tev ku li gelek bajarên Swêdê, dijminatiya biyaniyan zêde dibe jî li Goteborg ev zêdebûn nayê hîskirin.

**Sebrî-** Li bajarên me weke ku kek Ata jî got; biyanî pirr in û hêzên çep baş xurt in. Wekî din jî Goteborg bajarekî endustriyê ye. Ji ber vê yekê gelek karker lê dijîn. Piraniya karkeran jî li dijî rasîzmê ne. Dijminatiya biyaniyan heye, lê ne berbiçav e. Yanî tu çalakiyên rasîstan yên ku biyaniyan bi xurtî tehdît dike tune.

**Îsa** - Lê tev her tiştî jî hinek bûyer çêdibin. Wek nimûne ev 2-3 car in ku kampên penaberan ji terefên rasîstan tên bombekirin. Mirov nikare bêje ku Goteborg ji dijminatiya biyaniyan para xwe ne standiye.

**Ata-** weke hun dizanin, rasîzm li tevaya Ewrûpa dengê xwe bilind dike. Goteborg ji aliyê mezinbûnê, bajarê duyem yê Swêdê ye. Gava mirov bala xwe didê, dibîne ku li gelek bajarên nufûsa wan 10-15 hezar in, kampên biyaniyan 9-10 caran hatine bombekirin. Lê li Goteborg, ev reqam ne ewqas mezin e. Ji dervayî vêya, rasîst li Goteborg jî hene. Wek nimûne, di Yekê Gulanê de, meşeke mezin çêbû. Em jî wek Komele beşdarî vê meşê bibûn. Li aliyê din jî rasîstan li hember vê meşê, ji gelek deverên din yên Swêdê mirovên xwe anîbûn Goteborgê. Lê hejmara wan ne pirr bû.

**Îsa-** Ger qesd biçûkbûna hacîmê faaliyetên rasîstan be, tu tiştekî ku divê ez li hember derkevim, nîne. Ji ber ku ez jî beşdarî meşa Yekê Gulanê bibûm. Weke kek Ata dibêje, piraniya rasîstên ku li hember me civiya bûn jî ne rûniştevanê Goteborgê bûn.

**Sebrî-** Qesda min ev e ku gava mirov Goteborg bi bajarên din yên Swêd re muqayese bike, rasîst ne pirr in. Na na, qesda min ne ew e ku li Goteborg rasîst tune.

**Dara-** Bo ew katey ke manman girtûwe yarmetiyan dayîn û ciliyan hêna. Wextî xwey ziyatir le 79 komele û komîte hebûn le Goteborg kobûbûnewe le " Träffpunkt " bo ewey ke dijî rasîst karbikêyn. Komelekey ême tenha komeley biyaniyan bû ke maye û le gel çar komeley Swêdî û xwepêşandanman durust kird ke ziyatir le 10.000 kes beşdarî tiya kird.

**Ata-** Ez dixwazim bersiva pirsa ku li ser têkiliyên me û rûniştevanên Goteborg bidim. Têkiliyên me yên ku bi Swêdiyan re hene, bi pirr alî û bi mane ne. Dema ku bûyerin li Kurdistanê çêdibin û em dest bi hinek xebatên întensîv dikin, wê gavê rûniştevanên Goteborgê, tên me ziyaret dikin û bi her awayî piştgiriya xwe nîşan dikin. Têkiliyên me li bajarên me bi Komîteya Swêdî ya ji bo mafên mirovî yên Kurdan re jî pirr baş in. Ew bi rastî mirovin dilsoz û di pirsa Kurdî de pirr hesas in. Di gelek xebatên piştgiriyê de, li Goteborg faaliyetin pirr berbiçav derketin ortê. Dema ku li Başûrê Kurdistanê, bi milyonan Kurd berê xwe dan çiyê, hingê gelek Swêdî bi awayên cuda cuda dipirsîn û dixwestin bizanibin, bê ka ew dê bi çi awayî bikaribin alîkariyên xwe bişînê. Par daxwazek ji " Rotary Klub " hat. Wan dixwestin bên vê derê û me nas bikin. serokê Federasyonê bi xwe jî beşdarî vê civînê bû. Ji Swêdiyan 30-40 kes hatibûn. Civîn serketî bû û gihaşt armanca xwe. Mamosteyên lîse jî (40-50 kes) dixwazin ku em şevekê bi hevdu re çê bikin.

**Berbang-** bi kurtayî, li Bajarê we sempatiyeke pirr baş li hember Kurdan heye.

**Dara-** Êre şarêkê gewre ye. Lew bawere da, Goteborg zor baştir e. Eger helî sêngênî le gel Kurdî şarekanîke.

**Berbang-** Hun dikarin behsa çalakiyên xwe yên ku di hundirê vê salê de hatine kirin, bikin?

**Mîran-** Salê pêşî jimareyek çalakîman pêşkêş kird. Le wana tîpî şano û tîpî mûsîqew grûpî helperkew Kurdî, paş ewey behoy rûda we nahemwarekanî Kurdistan em sal baş bûwe. Ême tuwaniman ew tiştana bibûjenînewe le komelekanan de. Bo nimûne tîpî şanogerî, 3 şanogerî pêşkêş kird; tîpî helperkê le zor aheng dabeşdarî kirdû. Herweha tîpî mûsîqey jî her xerîke karî xoy dike.

**Ata-** Bi rastî jî îsal gelek kar û xebat hatine kirin. Di warê alîkariya ji bo Başûrê Kurdistanê de, xebatên bi pirr alî çêbûn. Di warê kulturî de, wek nimûne di mesela tîyatroya Kurdî de, ciwanên me xebatin gelek xweş meşandin. Di grûba me ya tîyatroyê de, xortin bi qabilîyet hene ku bi mehan bi vî karî ve mijûl bûn. Ez bawerim ku ev li gelek bajarên Swêdê tune ye. Heta nuha 3 lîstikên tîyatro hatin amade kirin û em dixwazin vî karî berdewam bikin.

Wekî din jî kursên zimanê Kurdî (1- Soranî 2- Kurmancî) hatin amade kirin. Di kursa Soranî de, 10-12 kesên Swêdî beşdar bûn. Ew nuha dikarin bi Soranî hem binivîsîne û hem jî bixwîne. Ev encameke pirr xweş bû. Di kursa Kurmancî de, ew kesên ku di mala xwe de îmkanên fêrbûna zimanê xwe nedîne beşdar bûn. Grûba me ya folklorê jî heye û ew beşdarî gelek şev û festîwalên ku li bajarê me hatine amade kirin, bûye. Wekî din jî gelek semîner hatin amade kirin.

**Berbang-** Hun ji bo xebatên pêşerojê çi difikirin?

**Dara-** Min demewêt em sal qorsî zimanî Kurdî le Zankoy Goteborg bikemewe bo ew Swêdîyaney ke deyanewêt zimanê Kurdî fêr bibin. Demanewêt ta kongrey em sal, ahengek yan dû aheng bo Kurdekanî Goteborg saz bikeyn. Belam bo çalakî siyasî ewe bestirawe be rûdanekanî Kurdistan. Pêşekî natwanin biryar bidin.

**Ata-** Em dixwazin semînerên xwe berdewam bikin. Wekî din jî em dixwazin di lokala xwe de hinek guhartin bikin û Komelê bikin cîhê civandinê. Hewldana me ji bo pêkanîna şertên bersivdana ihtiyaca civata Kurd li Goteborgê ye. Di warê danasîna çanda Kurd de jî hinek kar li pêşiya me hene.

**Berbang-** Gelo hun ji têkiliyên xwe û Federasyonê memnûn in. Tu daxwaz û rexneyên we hene?

**Ata-** Têkiliyên me yên îsal, li gor salên din baştir in. Di warê agahdarkirinê de, têkiliyên Federasyonê bi komeleyan re gelek baştir bûne. Berê meh di ser bûyeran re derbas dibûn jî hayê me jê çênedibû. Piştî demekê hayê me jê çêdibû, lê tu maneyên wan nediman. Federasyon dikare belavokên li ser

www.arsivakurd.org

bûyerên ku li Kurdistanê çêdibin, di gel Kurdiya wan, bi Swêdî jî binivîsîne û ji komeleyan re bişîne. Hingê kar hêsantir dibe û ne hewce ye ku her komele ji bo eynî bûyerê dest bi wergereke cuda bike. Civînên girîng hertim li Stockholmê çê dibin. Ev nehekiyek e. Divê Federasyon hewl bide ku hinek ji van civînên girîng li bajarên cuda cuda çê bibin. Federasyon dikare li hemû bajaran cejna Newrozê pîroz bike. Hem ji aliyê organîzekirinê û hem jî ji aliyê lihevhatina bi dengbêjan re, rolek merkezî dikare bête lîstin.

Her diçe alîkariya ku bi komeleyên biyaniyan re tê kirin, kêm dibe. Ji ber vê yekê divê Kurd êdî giraniya xwe bidin ser îmkanên xwe û xebatê li ser bingehê baweriya bi îmkanên xwe bimeşînin.

**Dara-** Bo pêkhênanî cejnî Newroz, wa xweştir e, Federasyon ke le Stockholm aheng digêrê agahdarî hemû komelekanîke bikat ke bi çi şêweyek ditwanin hewkarî bikên. Neke her tenha hunermendan û mûsîqejenanî dewr û piştî Stockholm bin. Bo ewey Kurdî şarekanîke beşdarî biken le ahengeke da û yektirî binasîn.

**Berbang-** Li Başûrê Kurdistanê hilbijartinek çê bû û meclîsek hate avakirin. piştî vêya, di meclîsa ji terefê gel ve hatiye hilbijartin de, hukûmeteke bi navê " Hukûmeta Herêma Kurdistanê " hate îlan kirin. Gelo hun dikarin hîs û fikrên xwe yên bi vê bûyera dîrokî re peyda bûn, ji bo xwendevanên me bîne ziman?

**Îsa-** Kurdan li Başûrê welatê me îmkanên, xwe bi xwe îdarekirinê xistine destên xwe. Ev firseteke dîrokî ye. ji bo vêya hîsên me yên neteweyî li bandevê ye.

**Ata-** hîsên mirov tevlihev in. Mirov bi vê bûyera dîrokî pirr kêfxweş e. Lê wekî din jî hinek pirsgirêk hene. Em hêvî dikin ku kulîlkên azadiyê dê welatê me bi xemilîne û pirsgirêkên ku hene dê di demeke kurt de bên halkirin.

**Berbang-** Li dervayî welêt, ji bo ji nû ve de avakirina Başûrê Kurdistanê, gelek proje çê dibin. Ez bawerim ku we di Berbangê de, di beşa " Komeleyên Me " de, li ser wê projeya ku Komeleya Eskilstuna jî tê de beşdar e, xwendiye. Gelo hun jî tu xebatên weha nafikirin?

**Dara-** Komeley Goteborg betemaye projeyek le Kurdistan awadan biketewe le ladeyek. Herçend çend rêkxirawî ke heye ke karî cewaz dikin û pêywendîyan le gel yektir niye. Ewe cêgey daxe. Bo nimûne, 3 rêkxirawî yarmetîdanî mindalan heye le Silêmanî. Belam hîç pêywendîyan le gel yektir nîye. Eger Federasyon ew kara bixatewe ser şanî xwey û komîteyekî hewbeş saz bikat bo ewey ew rêkxirawe cewazane bi yekewe kar biken û zanyarî werbigrin, berhemekey zor baştir dibit. Le wey her komeleyek bo xoy proje saz bikat. Herweha Federasyon detwanît dawa le komelekey şarêk bikat bo ewey projeyek bigrete estoy xwey.

**Ata-** Mesele divê bêtir fireh bête standin. Ez pêşniyara Kek Dara pirr maqûl dibînim.

**Berbang-** Têkiliyên komeleya we bi komeleyên ku li bajarên dorhêla we hene?

**Ata-** Em girêdayî Herêma 4'a nin û Goteborg, ne merkeza vê herêmê ye. Jonkopîng merkez e. Lê têkiliyên me baş in û di warê agahdariya di nava komeleyan de, li gor salên derbasbûyî, ferqeke mezin heye.

**Berbang-** Redaksiyona me di destpêkirina xebata xwe de, hinek guhertin anî holê û ev hêdî hêdî pêk tên. Gelo hun bi giştî rewşa Berbangê û bi taybetî van guhertinana çawa dibînin?

**Ata-** Rewşa Berbangê di Kongreya talî de jî hate munaqeşekirin. Perekî pirr li Berbangê diçe. Divê bi perekî hindiktir, Berbangeke efektîftir derkeve. Dema ku ez radihêlim Berbangê, beşa Kurmancî tenê dixînim. Ji ber ku ez bi tîpê Erebî nizanim, beşa Soranî ji terefê min nexwendî dimîne. Ev, di warê Kurmancî de jî ji bo hevalên ku bi zaravayên Soranî dipeyivin, derbas dibin. Gelo mirov nikare hinek nivîsandinên ku bi Soranî hatine nivîsandin, bi tîpên Latînî jî binivîsîne? Ev problemeke pirr girîng e û bi Berbangê tenê naqede. Lê gavên piçûk û hewldanên di vê rêyê de ne dûrî îmkanan in. Munaqeşeke di vî warî de, dê bi feyde be.

**Sebrî-** Ma nivîsên di herdu beşan de, ne yek in?

**Ata-** Na, ne yek in.

**Berbang-** Hinek tiştên muşterek hene. Lê bi giştî, ne yek in. Biryareke me heye ku divê tîpên nivîsen ku pirr berbiçav tên dîtin, bên guherandin. Ev destpêk e. Strukturên herdu beşan hêdî hêdî ber bi hevdu diçe. Wek " **Quncika Huqûq** ", " **Komeleyên Me** ", " **Rojeva Mehê** " û hwd wek hev in. Heta nuha hewldanên bi vî rengî nehatine kirin. Tu îddîa min ya ku dibêje, Redaksiyona me ya nuha, di vî warî de, bi serketî ye, tune ye. Lê di nav xebatên Redaksiyonê de, hewldaneke ji bo rûniştandina xeteke weha baş xuya dibe.

**Sebrî-** Berê jî tiştin weha hebûn.

**Berbang-** Berê wek prensîp tune bû. Dibe ku tu carnan li nivîsin weha rast dihat.

**Ata-** Ger nivîsên bi zaravayên Soranî, bi tîpên Latînî bên nivîsandin, ez dê pirr bixwazim ku nivîsên beşa Soranî bixwînim.

**Berbang-** Weha xuya ye ku problema we ya herî mezin, ne ferqa di nava zaravayan de heye, lê alfabe bi xwe ye. Bi guhertinên di van 2-3 hejmarên dawî de, Redaksiyona me hewl dide ku bide xuya kirin ku va em hinek guhartinan çê dikin. Di van guhartinan de, - tevî ku hîn baş rûneniştine jî- işaretên Berbanga pêşerojê xuya dibin. Gelo hun di vî warî de, çi difikirin?

**Sebrî-** Ev xeteke rast e û divê bête berdewam kirin.

**Berbang-** Heta nuha xebat weha hatiye meşandin; çi nivîs hatine ser hev hatine weşandin. Ihtiyaca kovarê ne diyar bû. Carnan , gelek nivîsên li ser babetekê di eynî hejmarê de, dihate çap kirin. Bi kurtayî, çi nivîsên ku dihate peyde kirin, dihate weşandin. Me di vî warî de, hinek guhartin çê kir. Êdî em dê ne li gor nivîsên ku hatine peyde kirin, lê li gor ihtiyaca Berbangê hereket bikin. Weke nimûne; **Rojeva Mehê, Dîrok û Belge, Ziman, Quncika Huqûq, Komeleyên Me** û hwd. Em êdî di giraniyê de, ihtiyacên Berbangê dizanin.

**Sebrî-** Ev gelek diyar e ku Berbang berê xwe daye armanceke rast.

**Ata-** Di warê teknîkî de, hin tiştên ku divê bên kirin hene. Lê ev guhartinên tên kirin, guhartinin pirr erînî ne.

**Îsa-** Lê ji bo Berbangeke ku layiqî organtiya Federasyonê, divê xebateke pirr bi rêk û pêk bête meşandin.

**Ata-** Divê Berbang, li her komeleyekê nûçegîhanekî xwe tesbît bike. Ev dê karê Berbangê hêsantir bike.

**Berbang-** Redaksiyona Berbangê, ji bo vê hevpeyvînê, spasdariyên xwe pêşkêşî we dike.

www.arsivakurd.org

# DI DESTPÊKA SEDSALA 20- Î DE DAMEZIRANDINA HINEK KOMELEYÊN KURDÎ

# -2-

Zinar Soran

**KOMELEYA HEZKIRÊN KURDISTANÊ (Kürdistan Muhibban Cemiyeti)**

Li gorî Vet. Dr. M. Nûrî Dersimî di bîraninên xwe de dinivîsîne, di sala 1912- an de, li Stanbolê di pêşengiya Mele Xidir Efendî de, bi navê **"Kürdistan Muhibban Cemiyeti"** (Komeleya Hezkirên Kurdistanê), komeleyek kurdî tê damezirandin. Komele, bi awakî fermî û destûra Hukûmetê hatibû damezirandin. Lê mixabin, Dr. N. Dersimî di derheqê nerîn, armanc û destûra vê Komeleyê de tu agahdariyek têr û dirêj nade.

Dr. Nûrî Dersîmî li ser beşdariya vê komeleyê weha dinivîsîne: **"Hemû Kurdên li Stanbolê beşdarî nava vê Komeleyê bûbûn. Ez jî Katibê Giştî yê Komeleyê bûm. Kurdên Dersimî yên li Amerika bûn jî, piştgiriya vê Komeleyê dikirin"** û hinek damezrevanên Komeleyê jî; Mîralay Xelîl Beg, birayê wî Hesen, Alî Paşayê Erzîncanî, Şêx Îbrahîmê Pulumûrî, Xelîlê Divrikî bûn (1).

Di derheqê vê Komeleyê de, agahdariyek zêde di destê me de tuneye. Lê ji agahdariyên kurt yên Dr. Nûrî Dersîmî em dizanin ku **"Komeleya Hezkirên Kurdistanê"** jî, weke komeleyên kurdan yên din, nebûye xwediyê jiyanek dûr û dirêj.

Fîlozof Riza Tevfîk ku hevalbendên hukûmetê bû, xwe wek hezkir û dostên Kurdan nîşan dide û sûnd dixwe ku wê ji bo pêşketina Kurdan bixebite. Lê di rastiya xwe de, ew hemû ji fen û lîstikan pê ve ne tiştekî din bûn. Wer xuyaye, ku heta derecakê berpirsiyarên Komeleyê bi wan gotin û sûnda wî bawer kirinin û bi wî xapiyanin. Li ser rapora Riza Teyfîk ku ji Wezareta Karên Hundir re dişîne, Mele Xidir tê girtin û sirgûnî Dêrsimê dikin. Hukûmet, Komeleyê digrin û ji berpirsiyarên Komeleyê Mîralay Xelîl Beg, Hesen, Alî Paşayê Erzîncanî, Şêx Îbrahîm û Xelîlê Divrikî jî, dikşînên pirsiyarê. Nûrî Dersîmî nakeve nav lepên wan û heta ji pirsiyariyê tê azad kirin, ew xwe vedişêre.

Li ser bihîstina wê bûyerê; eşîrên Dersimê gelek protestoyan ji "Babi Elî" re dişînin û di encamê wan protestoyan de, katibê giştî yê Komeleyê N. Dersimî ji pirsiyariyê tê azad kirin. Piştî ku Komele tê girtin, eşya û pêrên wê didin **"Komeleya Wîlayetên Rojhilat"** ( Vîlayeti Şarkiye Cemiyetî) (2).

**KOMELEYA RÊNÎŞANDAN Û BILINDKIRINÊ YA KURD**
(Kürt Irşad ve Irtika Cemiyeti) (1328- M.1912)

"Komeleya Rênîşandan û Bilinkirinê ya Kurd", di sala 1912- an de, li Stanbolê hatiye damezirandin. Wek komeleyên din, eşkerê û bi destûra Hukûmetê hatiye avakirin. Li gorî Nesîmî Firatli dinivîsine; bi yekitiya **"Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî"** û **"Komeleya Hevkariya Kurdistanê", Komeleya Rênîşandan û Bilindkirinê ya Kurd"** hatiye ava kirin (3). Lê wek ku min di behsa Komeleya Hêvî de jî diyar kiribû; di vê derheqê de ez bi xwe li tu çavkaniyên din rast nehatim. Herweha em dizanin ku piştî şerê Cîhanê yê yekem, Komeleya Hêvî ji nû de dest bi xebata xwe ya komeleyî kiriye û di kovarên ku derxistinin bahsa wê yekitiye nehatiye kirin.

Armanca **"Komeleya Rênîşandan û Bilinkirinê ya Kurd"** di xala duyem ya destûra wê de, weha hatiye diyar kirin: **"Li gel hergav parastina bilindayiya sifatê Osmanî, bi parastin û pêşdebirina sîstema parlamenteriyê ku sedemê berbiçav yê pêşveçûna ol, dewlet, milet û azadiya jiyanê ye, girêdayiya Kurdan bi meqamê bilind yê xelîfet û patîşahiyê xurtir bike; bi hemwelatiyên Ermenî, Nastûrî û xelkên din yên Osmanî ve yekitî û hevkariyê geştir bike; ji bo hemûyan bi yek carê li derdora navendiyek meşrû pêş ve bibe; perwedekirin, senayî, cotkarî û bezirganiyê belav û berfirehtir bike; ango endam ya jî ne endamên Komeleyê bin, bê îstisna ji bo hemû Kurdan di warê fikrî, ahlaqî û tevgerî de rohnî bike, konferans û dersên şevê bide; pirtûkxane û dibstanan ava bike; pirtûk û mumkun be rojname û kovaran biweşîne; ji bo yekitiya zimanê kurdî bêkbîne û ji nû de saz bike, li ser bingeha zimanê neteweyî perwedekirina destpêkê hêsan bike; li gel gramer û ferhengek serast ya kurdî, dîroka Kurd amade bike; lîstikên tiyatro û prensîbên olî û berhemên ilmî wergerîne û bi kurdî biweşîne û çi berhemên çapkirî ya jî ne çapkirî yên kurdî û bikêrhatî hene û eger hebin, hemû berhemên edebiyata kurdî kom bike û bike pirtûk; di vê çerçeweyê de dibistanên cotkariyê, ji bo tecrûbe û ajotina erdên mînak, çêkirina aletên çandiniyê û tamîrxaneyan veke; avayiyên aborî yên ku bi mercên munasib qirêdiyê bidin hewildaran, pêk bine;



www.arsivakurd.org

**hewil bide, ku her cûr fabrîqe, şîrket û bazirganxanan ava bike; di hilbijartinan de, hewildanên pêwîst bide, ku kesên ji milet û welêt re kêrhatî û layiq hilbijêre; ji bo ketina dibistanên li gorî wan, alîkarî û rênîşandana xwendevanên ji Kurdistanê werin bike û mesrefên wan kesên ku rewşa wan ya aborî dest nade, temîn bike û hewl bide ku wan bişîne unîversîteyên Ewrûpa."**

**"Xal 3: Heger sedemek bi rastî zarûrî çênebe, Komele wê ji binî de bi siyaseta giştî mijûl nebe"** (4).

Gava em li armanc û nerînên vê komeleyê dinerin; xweş tê dîtin û diyar dibe, ku ew jî, di warê daxwazên siyasî de ne xwediyê perspektîfek zelal e û ji çarçewa pesinandina meşrûtiyetê, daxwazên kulturî û hevîdariyên şehrezayê derneketiye. Ji xwe di xalê sêyem de, bi awakî zelal diyar dike, ku heger sedemek bi rastî zarûrî dernekeve, dê komeleyê ji binî de bi siyasetê mijûl nebe.

Gava mirov li destûr û nerînên wan komeleyên ku di wê demê de hatinin damezirandin dinere; daxwaza dewletek neteweyî û ji bo armancek weha pêwîstiya xebatek siyasî û rêxistiniyek serbixwe, nayên dîtin.

## "RÊXISTINA RÊNÎŞANDANÊ" (Îrşad)

Li gorî agahdariyên Dr. Celîlê Celîl ku ji hinek çavkaniyên cihê girtiye tê zanîn, ku di Gulana 1912- an de ji aliyê hinek têkoşerên Kurdan, bangek yekitiyê hatiye belav kirin. Di wê bangê de, ew ji nûnerên hemû komele, rêxistin û kesên kurdan daxwaz dikin, ku yekitî û hevkariyeke giştî pêk bînin û hêzên xwe bikin yek. Nûneran daxwaza biryara damezirandina partiyek yekgirtî dikin ku ew bikaribin armanca neteweya Kurd pêk bînin û pêşengiya wî bikin. Ev tevger û tekoşîna serokên Kurdan, li Stanbolê û Kurdistanê deng dide û xelkekî pir dikşîne aliyê xwe (5).

Dr. Celîlê Celîl, li ser raporên konsolosê Rusya yên di derheqê rêxistina **"Rênîşandan"** (**Îrşad**) jî, weha dinivîsîne: **"Van raporên konsolosê Rusya yên ku di sala 1912- an û di meha Tebaxê de, ji Tirkiyê ji Wezareta Derve a Rusya re hatine şandin, eşkere ronî dikin ku rêxistinek Kurdan a bi dizî, bi navê ÎRŞAD hebûye. Komîta serokên rêxistinê jî di navçeyên rojhilata welat de û di nav Kurdan û bi wan bi xwe ve jiyayê. Li gorî wan malûmatên ku Xeyrettîn Bêrz daye sekreterê konsolosê Rusya, endamên komîta Erzurumê ji van kesan pêk hatiye: Suphî Ezîz Beg, Egît Efendiyê Zirkî, Şêx Osman Efendiyê Eleşkêrtî, Selîm Efendî, Bekir Efendî. Weşanên rêxistinê û kasa wê hebûye û endaman her meh 10 pere mehanî dane..."** (6).

Dîsa; li gorî wan raporên konsolosê Rusya yên ji Wezareta Derve û Beşê yekem şandiye ku ew agahdarî ji aliyê Xeyrettîn Bêrz hatiye dayin, komîtên rêxistina Îrşad li Wanê, Diyarbekirê, Ruhayê û hinek cihên din hatine damezirandin. Rêxisinê wezîfe daye Xeyrettîn ku ji nav kurdên Erzurum, Bitlîs, Beyazîd û Mûşê alîkariya maddî kom bike û sekreterê konsolosê Rusya rapora xwe weha didomîne: **"Xeyrettîn dibê eger perên komîtê hebe, di navbera 15 rojan de serhildan dê rabe, hêjta perên me kêm in û em jar in. Xeyrettîn Beg doza yarmetiyê ji dewleta Rusya dike"** (7).

Gava em li wan agahdarî û çavkaniyên li jor hatinin nivîsandin dinerin; " **Komeleya Rênîşandan û Bilindkirinê ya Kurd" (Kürt Îrşad ve Irtika Cemiyeti)** û **"Rêxistina Rênîşandanê" (Îrşad)** di eynê salê de hatinin damezirandin. Ji tarîxa nameya sekreterê "Komeleya Hevkariya Kurdistanê" Abdullah Sadiyê Paluyî ku di 17- ê Çileya Pêşîn ya sala 1912- an de, ji "Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî" re hatibû şandin û daxwaza yekitiyê kiriye tê zanîn, ku "Komeleya Rênîşandan û Bilinkirinê ya Kurd" di meha Çileya Pêşîn ya sala 1912- an de hatiye damezirandin. Herweha gava em li agahdariyên Dr. Celîlê Celîl yên ku ji çavkaniyên **"Arşiva Siyasî ya Rusyayê"** girtinin dizanin, ku di meha Gulana 1912- an de, ji aliyê hinek têkoşerên Kurdan de bangek yekitiyê hatiyê belav kirin û daxwazî ji hemû nûnerên komela, rêxistin û kesên Kurdan hatiye kirin ku yekitî û hevkariya xwe çebikin û hêzên xwe bikin yek. Li ser wê daxwazê bi beşdariya nûnerên hemû grûbên siyasî û civakî yên Kurdan civiyanin û biryara rêxistinek xurt ku bikaribe menfaetên gelê kurd temsîl bike bi yek dengî girtinin.

Ji raporên konsolosê Rusya Girs yên di Tebaxa 1912- an de ji Wezareta Derve ya Rusya re hatiye şandin jî tê zanîn, ku rêxistinek Kurdan ya bi dizî û bi navê **"Îrşad" (Rênîşandan)** hebûye.

Lê mixabin, di derheqê vê komele û rêxistinê de, vê gavê tu agahdariyên berfirehtir di destên me de tunene ku em bikaribin bi awakî zelal rewşa herdu rêxistinan bêtir bizanibin û heger hebin têkilî û peywendiyên di nava wan de diyar bikin. Teva ku herdu rêxistin navên wan dişibin hev û di yek salê de hatinin damezirandin, ne diyar e ku bê tu têkilî û pevgirêdanek wan ya bi rêxistinî bi hevdu re hebû ya tunebû.

Gava mirov li nîzamnameya "Komeleya Rênîşandan û Bilinkirinê ya Kurd" dinere; diyar dibe ku daxwaz û armancên vê komeleyê, kêm zêde wek daxwaz û armancên wan komeleyên berê yên Kurdan ku li Stanbolê û bi awakî eşkere hatibûn dameziran in. Ji agahdariyên raporên konsolosê Rusya jî diyar dibe, ku "Îrşad" rêxistinek bi dizî bû. Serokên rêxistinê di navçeyên rojhilata welêt de bûn; di nava xelkên de dijiyan û ji bo emaretek kurdî ya serbixwe, di nava haziriya serhildanê de bûn...(8).

## ŞERÊ CÎHANÊ YÊ YEKEM Û REWŞA KOMELEYÊN KURDÎ

Şerê Cîhanê yê yekem, ji bo xebat û têkoşîna komele, rêxistin û weşanên kurdî jî, bû pêvajoyek nû û navqonaxiyek taybetî. Karbidestên Osmanî berî şerê Cîhanê jî heta ji dest wan dihat, tu kês û firsend nedidan komele, kovar û rojnameyên kurdî û zilm û zordariyek tabetî li ser pêşeng û rewşenbîrên kurdan dikirin. ji ber wan hoy û sedeman, komele, kovar û rojnameyên kurdî nedibûn xwediyê jiyanek dirêj û dihatin girtin. Bi îlankirina seferberlikê, karbidestên Osmanî gelek ronakbîr, nivîskar û berpirsiyarên komele û weşanên kurdî xistin bin darê leşkeriyê. Lê mixabin ku rewşenbîr û pêşengên kurdan li hemberî wê rewşa nû û kiryarên hukûmetê ne xwediyê haziriyek taybetî bûn. Ji ber wan hoy û sedeman, xebat û têkoşîna komeletî çi bigre ji binî de hate rawestandin. Pêşeng û ronakbîrên kurdan di wê dema Şerê Cihanê de ku ji gelek bûyer û guherandinan musaîd bû, xweşik îstifade nekirin û rolên ku dikarîbûn bilîstina nelîstin.

Gava di destpêka sedsala 20- î de, li Başûrê Kurdistanê û bi taybetî li Stanbolê komeleyên kurdî li dû hevdu vedibûn û rewşenbîr û xwendekarên kurdan di nava xebatek germ de bûn, Başûrê Kurdistanê (Kurdistana Iraqê), ji pêşengiya komele û rêxistinan bê par bû. Di vî warî de, Dr. K. Mezher Ehmed weha dinivîsîne: **"Li Kurdistana Iraqê, heta dawiya şerê cîhanê yê yekem tu komel û rêxistin nehatibûn avakirin"** (9). Lê gava Dr. Îbrahih Ethem Gürsel bahsa serhildanên destpêka 1900- an dike, bê ku çavkaniyê û agahdariyek dirêj bide, bi awakî kurt bahsa komeleya **"HÊVIYA KURD"** dike: **"Hema piştî van sehildanan, li Başûrê Iraqê**



www.arsivakurdi.org

**li ser bingehek hîn ciddî, em hevgirêdanek din ya bi dizî dibînin. Li vir, divê em wê komeleya siyasî û îlegal ya bi armanca Kurdistanek serbixwe û bi navê "Hêviya Kurd" ku li Başûrê Iraqê di sala 1910- an û pê ve dest bi xebatê kiriye, ji bîr nekin"** (10). Lê gava Bazil Nikitin, behsa komeleyên Kurdan dike; navê **"Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî", "Hêviya Kurd"** dinivîsîne: **"...di sala 1910- an de grûbek xwendekar û huquqvanên kurd ku di nav komeleyek nû ya bi navê Hêviya Kurd de civiyabûn, dest bi weşandina kovarek mehanî ya bi navê Roja Kurd dikin"** (11). Ji ber vê yekê, heye ku Ibrahim Ethem Gürsel jî, ew nav têkil kiribe û wek rêxistinek din nîşan dabe.

Berî Şerê Cîhanê yê Yekem dest pê bike, ji aliyê Cemalettîn Baban jî, kovara **"Bangî Kurd"** hatiye weşandin. Ew kovar bi kurdî û tirkî hatiye weşandin. Di Bangî Kurd de, gelek nivîsên li ser tema netewetiyê jî hatiye nivîsandin (11).

KOMELEYA GÎHANDIN

Dema ew bûyer û xebatên li jor hatin diyarkirin çêdibûn, li Kurdistana Îranê jî, di warê şiyarbûna neteweyî û komeleyî de bêşdiketin û tevlivandinek berbiçav dihate dîtin. Li gorî agahdariyên ku Dr. Celîlê Celîl dide: **"Di dawiya sala 1912- an û destpêka sala 1913-an de, bi alîkarî û piştgiriya Ebdurrezaq Bedirxan û Simko, li bajarê Xoyê komela çandî û rewşenbîrî, Gîhandin hat damezirandin. Armanca komelê ev bû: Di nava Kurdên Xoyê de, xwendewarî belav bike û dibistan veke, rojname û kovar bi zimanê Kurdî derxe û alfabeya Kurdî baş bike. Xortên Kurdan ji bo xwendinê bişînin Rusyayê. Ebdurrezaq serokê komelê bû..."** (12).

Di derheqê damezirandina Komeleya Giyandin, Dr. Kemal Mezher Ehmed jî weha dinivîsîne: **"...li Kurdistana îranê Komeleya Cihandanî (1912) hate damezirandin. Vê rêxistinê dixwest ku şerê gelê Kurd di riya rast de bimeşîne û hêzên niştimanperwerî bicivîne ser hevdu"** (13).

Gava Dr. K. Mezher Ehmed bi awakî giştî behsa rêxistin û navdarên siyasî yên Kurdan dike, dide diyarkirin ku yek ji wan armancên wan yê sereke ev bû, ku zarok û ciwanên Kurdan hînî xwendin û nivîsandina kurdî bikin. Dr. K. Mezher, di derheqa xebata Ebdurrezaq Bedirxan ya di vî warî de jî, weha dinivîsîne: **"Dîsa di van salan de, li Kurdistana Îranê Ebdurrezaq Bedirxan di vê derheqê de gelek xebat kir û giringiya perwerdekirina xwendin û nivîsandinê berî her tiştî girt. Di destpêka sala 1913- an de, li Xoyê Komeleyek Çandî vekir. Armanc; vekirina çapxaneyekê, weşandina rojnameyekê û vekirina çend dibistanan bû. Komeleyê, wek pêngavek girîng, bi alîkariyên ku ji nava xelkê dabû hev, li Xoyê cara yekem dibistanek ku perwedekirina kurdî dikir, vekir"** (14).

**Li ser tarîxa vekirina vê Dibistana Kurdî ya ku li Xoyê hatibû vekirin, nerînên cihê hene. Dr. Celîlê Celîl di vê derheqê de weha dinivîsîne: "Bi alîkariya Fransizan dibistan di destpêka Çirya Yekem de xelas bû. Ciyên ders û xwendinê li gorî usula Avrupiyan hatibûn amade kirin. Oda mamostan, metbex û heta nexweşxane (rewîr) jî tê de hatibû dirust kirin.**

Di 22 yê Çirya Yekem de bi awakî resmî dibistan hat vekirin. Di vebûna wê de, serokê beşê eskerên Rusya yê Xoyê General Vislovisk, waliyê Xoyê, kesên dewlemend û bazirgan amade bûbûn...Di dibistanê de dîrok, matematîk, coxrafya û meşandina dar û dezga dewleta Rusya dihat xwendin..." (15). Li gorî M.S. Lazarev ku di pirtuka xwe ya "Kurdistan û Pirsa Kurdî -Di dawiya sedsala 19-an heta 1917- an" de nivisîye; **"Dibistan di 4- ê Çirya Paşîn ya sala 1913-an de vebûye. Ew bûyer kêfxweşiyek mezin li bajarê Xoyê çêkiriye. Di vekirinê de, 29 xwendevan hebûn. Wan bi zimanê kurdî ders didîtin û bi alfaba Rusî dinivîsandin. Ziman û Edebiyata rusî jî dixwendin. Di avayiya dibistanê de, nexwşxaneyek biçûk jî vekiribûn"** (16).

Vebûna vê dibistanê, di nava Kurdên di bin nîrê dewleta Osmanî de bûn jî deng dide û kêfxweşiyek mezin çêdike. Li ser vê rewşê, tirs û xofek taybetî dikeve dilê "Tirkên Ciwan" û dewleta Almanya. Ew di wê baweriyê de bûn ku Rusya bi riya xebatên weha dikare Kurdan bêtir ber bi xwe ve bikşînin. Ji ber vê yekê, Tirkên Civan xwestin li hinek gundên nêzîkî sînor dibistanên kurdî vekin. Herweha Almanan jî bi riya konsolosê xwe yê Musilê têkilî bi birayê Ebdurrezaq, Hesen Begê re danîn; soz û peyman dan Kurdan ku ji bona xwendinê, salê 10 zarokên Kurdan bê pere bişînin Almanyayê.

Di rastiya xwe de, armanca wan dewletan ne ji bo ziman û çanda kurdî pêş ve bibin û ew ne evîndarê çavên reş yên Kurdan bûn. Hewildanên di wî warî de dihate kirin, perçeyên plan û lîstikên ku Kurdan bêtir nêzîkî xwe bikin û wan di bi xwe ve girêdin. Di dawiyê de, bi awakî eşkere derket holê ku tu daxwaz û niyetek wan dewletan tunebûn ku ziman û çanda kurdî pêş ve bibin û ew biryarên wan yên di wî warî de neketin jiyanê...(17).

Li gorî agahdariyên Dr. Celîlê Celîl dinivîsîne; piştî demekê nakokî û dijitiyek berbiçav di nava Ebdurrezaq û Simko de, dest pê dike. Daxwaz û nerîna Ebdurrezaq ew bû, ku hatin û hebûna Komeleya Gîhandinê ji bona çek, haziriya şer û biçekkirina Kurdan de jî bê bi kar anîn. Lê Simko li dijî wê nerînê bû û ew bîrûbaweriyên Ebdurrezaq di cî de nedit. Herweha di warê li hemberî Tirkan şerekî çawa jî, di nava herdu serokan de dubendîtî hebû û wek hevdu nedifikirîn. Ev dijîtiya di nava Ebdurrezaq Bedirxan û Simko de, tesîrek taybetî û neyînî li ser serokatiya Giyandinê kir; **"giramiya komelê şikand û bizava wê ya rewşenbîrî jar bû û di sala Şerê Cîhanê yê Yekem de komele nema"** (18).

KOMELEYA RIZGARIYA KURDISTANÊ (Îstîhlasî Kurdistan Cemiyeti)

Li gorî Dr. K. Mezher Ehmed dinivîsîne; **"Komeleya Rizgariya Kurdistan"** (Istihlasî Kurdistan Cemiyeti) di berbanga şerê Cîhanê yê Yekem û di nava şer de, li beşê Kurdistana Îranê dest bi xebatê kiriye (19). Lê, li gorî nameya Seyid Taha ku yek ji danerên wê rêxistinê bû, pêşkêşî konsolosê Rusya yê Ûrmiyê kiriye, armanca rêxistinê; şerkirina li hemberî Tirkan û rizgariya Kurdistanê ye. Ji bo wê armanca jî, daxwaza hevdîtin û alikariyê ji fermandarên Rusa dike. Di vê derheqê de, Bazil Nikitin weha dinivîsine: **"Ber bi dawiya sala 1917- an de, ji rêxistina Îstîhlasî Kurdistan nûçegîhanek hate balyozxaneya Ûrmiyê meqamê min û nameyak Seyid Taha da min. Di vê nameyê de, ji bo rizgarkirina Kurdistanê û li hemberî Tirkan li ser tevgerek hevbeş li hev bikin ji min daxwaz dikir, ku ez hevdîtinekê bi qumandarên Rusyayê re amade bikim"** (20).

Di derheqê vê rêxistinê û hinek danêrên wê de, Dr. Şivan jî weha dinivîsîne: **"Karûbarên kurdî, di nava şer de jî dom kir. Seyid Abdulkadir, biraziyê wî Seyid Taha û Kamîl Bedirxan serkêşên wan kesên birêvebir yên wan karûbaran bûn. Navê rêxistina ku wan ji bona rizgariya Kurdistanê damezirandibûn, Îstixlasî Kurdistan bû"** (21).

www.arsivakurd.org

# Prosesa geşbûna dîrokî ya zimanê kurdî

Nivîskar : M. Emîn Hewremanî
Wergêr : Elîşêr

## BEŞÊ YEKEM

### A- EW BÛYERÊN KU LI SER PÊŞDEÇÛNA ZIMAN TESÎR DIKIN

Ew bûyerên ku îmkana wan heye li ser pêşdeçûna ziman tesîr bikin, gelek in û li gor min evên han girîngtirên wan in:

*1) Azadî û Serbestiya Gel:*

Gelê azad, ger çendîn di hêla warê jîyanê de gelek paşdemayî be, lê li gelek hêlan de îmkana wî ya parêzgeriya zimanê wî heye. Bi taybetî di warê parêzgeriya kok, deng û kelîmên ser bi gotinê zimanên din de ku ji bab û bapîrên wan ve ji wan re maye û ew jî hergav xwe pê serbilind dizanin. Eger bi tev têkoşîn û taqetê ve bikare parêzgeriya wê keleporê bike û wê pêşde bibe û ger hat, guherînek pêwîst ê jiyana rojane bi ser de hat jî, ciyê guherîna wî diyar û aşkera ye.

Gelê azad, eger paşdemayî jî be, kokê zimanê wî ji jor ber bi jêr ve (ji kevin û dûr ve ber bi nû û îro) mil bi milê dîroka serpêhatiya "wî gelê" li ber çavan e û diyar e û kes nikare bi tu awayê astengek bêxe ber rêbaza zimanê wî yan gelek gotin û kelîmê zimanên biyanî bi zorî têke nav zimanê wî.

Her wiha, gelê xwedî welat û azad, xem û "tengiyek" jê re tune ku materyalên zimanê biyanî yên pêwîst ji bo pêşdebirin û pêşketina ziman bîne nav zimanê xwe.

Wek mîsal, Iraqa îro, ji ber sebebê ku xwe xwediyê azadî û serbestiyek temamî dizane, dixwaze ji nû ve ser bingeha dîrokî de bi wî awayî ku bi xwe dixwaze û pê raziye bimeşe û xwe ji do bişo.

Va Faris li ber çavê me nin, ji bilî ku çi ax û çi hebûna kurdan heye kirine ya xwe, bi serbarê ser de jî hemû kelepor û şûnewarên kevin ên navçên Kurdan (Mediyan) heye, di nivîsandinên xwe yên Farisî de yên xwe hesibandine (hetta zimanê kurdî yê îro jî lehçek zimanê farisî hesibandine û di vî warî de ferhengên wan bi awakî aşkera şahidî didin), lê çi heye li tu ciyê de, navê keleporê dînî û rewşenbîrî yên ji Mediyan mayî, navê wan derbaz nebûye û nabe jî.

Em dizanin, Grekiyan di serokaniyên xwe yên cur bi cur de gelek bi awakî ecêbmayî li keleporên rewşenbîrî yên cuda cuda yên Mediyan nêrîne û bi rêz navê wan bikar anîne.

### 2) DI WARÊ COXRAFYÊ DE

Li welatek de, ji navçek heta navçek din (eger ferqên coxrafîk di navbera wan de hebe) cudatiya telafûza hinek dengan di kelîman de tê xuya kirin. Hinek carên wisa jî hene ku di zimanê navçek çiyayî de hinek kelîme (bi taybetî



www.arsivakurdi.org

navê hinek dar û giyan ku li çiyan hêşîn dibin û li deştan hêşîn nabin) tê dîtin ku li navçên deştî yên germîn a welatekî de li ber guhê mirov nakeve, yan jî eger ber guhê mirov bikeve di hêla mana de ne ronî ne.

Tesîrên bi vî awayî cihêtî ger çend gelek mezin jî be, lê ev tesîr ji sînorê devok û curê awaza dengê pê ve, pêş de naçe.

Dema ku rola coxrafyayê bi tesîrtir be, yanî eger hat welat, di herçar milan de yan di çend milan de, yanî çi di hêla ziman de û çi jî di hêla netewe de xwedî cîranên biyanî be, ewçax bêguman, her yek ji wan navçan bi awakî taybetî û raste rast li gel wî welatê cîran ê biyanî tesîr li ser hev dikin û dan û stendina deynkirina gotinan di navbera wan de pêk tê, ji ber sebebê dirêjkêşana vê dewr û zemanê, devoka zimanê wê navçê, ji devoka eynî zimanê û lê li navçeke din a cîranê neteweyek din a biyanî cihê dibe.

Bi vî awayî her yek ji van milan devokek zimanê pêk tîne.

Vêca eger rol û tesîra coxrafyayê ji carçova cîrantiyê derbaz bû û gihîşt doxê parvekirin û çirandinê, bêguman li gor wê cur serpêhatiyê, ziman jî mîna zimanek din lê têt.

### 3) DÎ WARÊ DÎNÎ Û REWŞENBÎRIYA DÎNÎ DE

Di parêzgeriya yekîtî û yekîtiya zimanê neteweyî de rola dînê gelek mezin û bi feyde bûye. Bi taybetî eger ew dîn xwedî kitêbek dînî be û ew kitêb jî bi wî zimanê hatibe nivîsandin.

Di vî warî de baştirîn mîsal Qur'ana pîroz e, ku di saya wê de yekîtiya zimanê erebî hatiye parastin û ji ber vê jî serokaniyek bawerî pê kirî tê hesibandin. Dema problemek ziman derdikeve, ji bo rastkirinek an çêbûna pêkhatina gotinê yan jî lêkolîna mana û eslê kelîmek, bi yekser dest bi serokaniyên bi qîmet ên erebî tê avêtin ku ew jî Qur'an e.

Ber bi hebûna Qur'anê jî, di zimanê erebî yê gelî de, lehçên cihê û cihê yên ji hev cuda mirov dibîne. Heta demek berê niha jî gelek kesên xwedî lehçek din a erebî ( xeber û axaftinên radyo û televîzyonê) bi lehçek din a zimanê erebî nedigihîştin an jî heta niha xwediyê hinek lehçê din bi yên din têfiagihîjin. Ev yeka han ji me re ronî dike ku sebebên serekî yên ji bo yekîtiya zimanê erebî di vê zemînê de hene û rola xwe dilîzin.

Eger em di perspektîfa vê zemîn û pîvanê de li zimanê kurdî binêrin, divê em ji vê razî û dilxweş bibin ku bi vî awayî îro zimanê kurdî maye.

Ev li milek, li milek din jî, sebebê herî serekî yê mayîna zimanê kurdî wek zimanê kurdî yê îro û berdewambûn û teslîm nebûna wî di riya hebûna wî de, bêguman digihe hebûna gelê kurd wek xwediyê zimanê kurdî û ger çendîn di çarçovek gelek lawaz de be jî, ber bi dewamî xwedî dîn, kitêb û kitêboka dînî.

***Zimanê kurdî ji Mediyan pê ve heta îro bi peyatî tê!***

Madem wiha ye, mayîna zimanê kurdî bi vî awayê ku îro heye, diçe digihîje bi berdewama zimanê Awesta û mayîna wî wek zimanek bi serê xwe di dirêjahiya wê riya dûr û dirêj a zor zehmet û asê de ku ji roja Mediyan heta îro bi peyatî tê.

Zimanê kurdî ji Mediyan pê ve heta îro bi peyatî tê!

Bi awakî aşkera û rontir, hebûna ziman bi navê Mediyan, wek zimanê dînî, resmî û gelî di dirêjahiya seranserê hukumdariya wan û şûn de, wek zimanê Awesta û wek zimanê resmî, gelî û dînî ya Hexamenşiyan (ji derveyê hinek fermanên hukumdarîyê ku bi parsiya kevin hatine nivîsandin û kolandin, piraniya zêde gotinên bingehîn û serekî yên Medî ne).

Vêca berdewamiya wî wek zimanê gelî û geşbûna wî di dema hukumdariya Aşkaniyan heta dawiya hukumdariya Sasaniyan û peydabûna lehçên cûda cûda û berdewambûn û peydabûna cûre awayên dîn, di zimanê Awesta û kitêbên ehlê heq de û heta îro, rêbazek ne jihev veqetandî û aşkera nîşan dide.

www.arsivakurd.org

Di van 10 salên dawî de, nivîsa kurdî li Swêdê, li nav kurdan gaveke mezin avetiye. Gavek mezin, ji ber ku di her beşê edebîyatê de, berhemên nivîsarên Kurd çap bûn. Ev nivîsarana, ne di bin hoyên ku bi tirs, zilm û zorê ve hatiye hûnandin dinivîsînin. Ew bi awakî pirr serbest dikarin binivîsin û her weha yarmetiya aborî jî- ji bona çapkirina berhemên xwe - dikarin bistînin. Ev jî çapkirina berhemên wan hêsantir dike. Piranîya van pirtûkên ku çapbûne ev yarmetî girtine.

Min xwest ku li ser van berhemên edebî yên ku di van 10 salên dawî de derketine ez hevpyevînekê li gel serwextekî huner û edebiyate, li gel L.Ronahî bikim. Lê L.Ronahî dîyar kir ku ne tenê bi kurmanciya jor, lê bi ya jêr jî pirtûk çapbûne û li ser wan peyvîn jî ne barekî ku ew bi xwe karibe hilgire. Ji ber vê yekê hevpeyvîna me, bi nivîsên nivîsarên ji bakurê Kurdistanê ve hatiye bi sînor kirin. Ez pirsên xwe û bersivên kek L.Ronahî ji xwendevanên Berbangê re pêşkêş dikim.

**Mezher Kaplan**

**Mezher Kaplan:** Kek L. Ronahî, ez dixwazim bi nerînên te yên li ser berhemên ku di van 10 salên dawî de, bi kurdî li swêd çapbûne, des bi hevpeyvînê bikim.

**L.Ronahî:** Bê guman, firehbûn û belavbûna nîvîsa kurdî, xweşiyek e. Belav dibe; ji ber ku pir mirov hewl didin da ku bi kurdî binivîsin. Fireh jî dibe; ji ber ku piraniya beşên edebiyatê êdî bi kurdî tên nivîsîn. Lê mixabin, heger mirov danberhevekê (miqayesakê) bi nivîsarên biyanî re bike, dê li hember wan nerastiyeke (neheqî) mezin be. Ji ber ku ne roman roman e, ne jî helbest helbest e. Ji xwe hevpeyvîn -ku di van 30 slaên dawî de, hema hema bûye berhemek/beşek edebî/edebiyatê- mirîye.

**M.Kaplan:** Berî ku ez derbasî pirsa xwe ya duyemîn bibim, dixwazim tiştekî bipirsim. Ez dêhna xwe didêmê ku tu nabêje nivîskar, lê tu dibêje "nivîsar". Gelo çima?

**L.Ronahî:** Navê "nivîsar" bi sala her nivîsar bû. Lê ger ez ne şaşbim civîna Madrîd - ya ku /instituya Kurd li Parîs pêk anî- ji nivîsê re jî dibêje "nivîsar". Hinek ji nivîsarên me yên li Swêdê jî xwediyên vê guhertinê ne. Na xêr, ez xwe ji wê biryarê re xwar nakim.

**M.Kaplan:** Ev ne hinek bê disipliniye di vê dema bê dezgehîyê de?

**L.Ronahî:** Belê ez benî, hinek dikarin weha bibînin. Lê ez ne mesela dezgehê dibînim, ez vêya bi taybetî şematik dibîn.

**M.Kaplan:** Em vegerin ser dîtinên te yên ku li ser berhemên me yên edebî ku çapbûne û gihane xwendevanan. Te got ku "roman ne roman e", "helbest jî ne helbest e" û hevpeyvîn ji xwe "mirîye". Tu dikarî van dîtinen xwe veke û zelaltir bike? Ji ber heta cîhekî ev berhemên ku çapbûne pir giranbihan e.

**L.Ronahî:** Ez benî mesela giranbihabûnê, dîtinek e. Kî çi bixwaze dikare ji xwe re giranbiha bibîne. Ev tiştekî taybetî ye. Lê gava bû tevayî- wek ku tê gotn- usulên dinyê hene... pîvan hene. Tiştê te yê xwe li ber van pîvana negre, hew ji tera giranbiha dimînin. Îcar ger em werin ser pirsa te. Ger tu destûra min bide, ez dê berê li ser hevpeyvînê tiştekî bêjim. Wek ku tête zanîn hevpeyvîn (reportage) îro ne tenê tiştekî agahdarî ye/informativ e. Erê, hevpeyvîn hîn jî li ser herdu sitûnen xwe ye; pirs û bersiv. Lê ji vê, divê mirov vê ramana teng -kê ji bo çi, çi got- dernexe. Hevpeyvîn, îro bûye beşeke ji beşên edebiyatê. Di hevpeyvîna hemçaxî de, ziman bi hemû malikên xwe beşdar e. Pesindan ku bi xwe perçakî girîng yê romanê ye, bûye perçakî girîng yê hevpeyvînê jî. Ji ber vê yekê tête gotin ku hevpeyvîna serketî ew e ku gava xwendevan wê bixwîne, xwe li/di hawira hevpeyvîne de his bike.

Di hevpeyvîna me de, em çi dibînin? Nav û paşnavê kesê/kesa ku hevpeyvîn li gel dibe, pirs û bersîv û spasiyên ji bona vê hevpeyvînê.

**M.Kaplan:** Ma tu hinekî neheqiyê nakî? Çi sedem heye ku di hevpeyvîna, wek mînak li gel Mam Celal Talabanî çêdibe de, pesindan hebe?

**L.Ronahî:**Na... xêr. Wek mînak Mam Celal te got, Mam Celal bi xwe perçakî dîroka kurd û kurdistanê ye. Ne tenê ev jî, yek ji yên ku dîroka Kurdistan çêkiriye û hîn jî çêdike. Gava hevpeyvînek wek ku tu dibêje, li gel çêbibe, dê çi be? Li ser siyaseta rojane, pirs û bersiv, an jî nerînên Mam Celal ji bona vî tiştî an wî tiştî. Çima gava xwendevan vî kesê dîrokî meraq bike, dê nikaribe ji vê hevpeyvîna Mam Celal nas bike. Girêdana wî, salên wî, ketin û neketina wî, hawê wî yê bersivdanê, tehemila bihîstina wî ya pirsên nexweş uhw. Çima xwendevan dê nikaribe ji hevpeyvîneke vana fêr bibe.

Ger em werin ser helbestê. Ji xwe çî me heye, helbest e. Nivisa kurd çi ya kevntirîn û çi ya pêşketî û bihêz helbest e. Ne tesadufeke ku ji Ahmedê Xanî heta Cegerxwîn, teva helbest nivîsandiye û çeka teva ya giran helbest e. "Ev qelem şurê mine, ma hindî û misrî çine". Cegerxwîn gotiye. Wê demê hîn cegerxwîn çîroka (prosa) xweyî binav û deng "REŞOYÊ DARÊ" jî hin ne nivîsandiye. Lê mixabin, hezar car mixabin, helbestvanên me ji helbesta kurdî hema hema tu par û îlham ne girtine. Helbestên di kovara de carna çap dibin, an jî yên wek pirtûk çapbûne, piraniya caran ramanên wan ramanên tirkîne, hew bi kurdî hatine nivîsîn.

**M.Kaplan:** Wek mînak tu çi dikarî rê bidî?

**L.Ronahî:** Hersê pirtukên Firat Ceweri û hinek helbestên di kovaran de derdikevin.

**M.Kaplan:** Ev pirtûkên ku tu dibêjî, bi yarmetiya Komîta Çandî ya Swedî ya di bin wezareta Çandî çapbûne. Tu çawa dikarî weha bêjî?

**L.Ronahî:** Ez bawer im ku swêdî bi kurdî nizanin û ji xwe divê em ji xwedê re dia bikin da ku Swêdî tucarî jî kurdî fêrnebin. Ger ferbibin, wê bizanibin bê perê wan çawa bertelef diçe. Kesin kurd di wê komîtê de ne û ew peşniyar dikin ku "filan pirtûk" divê yarmetiye bigre da ku bikaribe çap bibe. Mesela yarmetiya Komîta Çandî (Kultur Rådet) tevde ev e.

**M.Kaplan:** Tu ji bo van kesên kurd yên ku divê komîtê de ne, çi dibêjî?

**L.Ronahî:** Wek kes, ez wan nasnakim. Lê ku mirov dêhna xwe bide, wan pirtûkên ku bi pêşniyariya wan çapbûne, mafê mirov heye ku ji xwe bipirse û bêje "Gelo ev kî ne û ma nizanin çi dikin?".

**M.Kaplan:** Ji bona romanê tê nikaribî eynî tiştî bêjî. Ji ber ku gelek romanên baş û mezin çapbûne û belav bûn e û hinjî belav dibin. Ger şaşiyek nebe, yekemîn car romanek bi Kurmanciya jorîn hatiye nivîsîn û ew jî li Swêdê û ya Mehmet Uzun e; TU. Her piştî TU jî çend romanên

www.arsivakurdi.org

din çapbûne; wek "Hêlîn" "Mirina Kalekî Rind", "Gundikê Dono", "Siya Evînê", "Girtî (çîrok), "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" Niha jî yek ji romanên M.Uzun, dê wergere zimaneki Ewrpayî.

**L.Ronahî:** Ez benî diyar e ku dê hevpeyvîna me dirjêj bibe. Destûra min bide ku ez li vir parentêzekê vekim. Gava ez dibêjim nivîsa kurdî, ez nivîsên nivîsarên kurdên ji bakurê Kurdistanê hatine û gava ez dibêjim Nivîsarên kurd jî mebesta min bi gotineke rojane ji Firat Cewerî heta M.Uzun e.Ji ber ku Firat Cewerî yê di destpêkê de, herî pirr pirtûk çap kirine û M. Uzun jî yê herî faal e. Nivîsarên din tev (M.Baksî û Koyo Berz ji dinav de) yên navbera her duwa nê.

Îca em vegerin ser gotina te. Mebesta bi mezinayî û başiya van romanan çi bû, nizanim. Lê li ser çendayetiya wan û gihiştina destên xwendevanan ez jî bi te re. Lê li ser çûyanetiya wan ez ne du dilî, ez sed dilîme. Ji ber roman ne tenê li ser rastiya civatê, tekiliyên civat û kesên rast an yên dîrokî di çîrokê de bin dibe roman. Ev hew pîkin ji pîkên romanê ne. Lê ne bes e.

**M.Kaplan:** Tu çêlî Evdalê Zeynikê dike, gava tu dibê kesên dîrokî?

**L.Ronahî:** Belê, yek ji wan.

**M.Kaplan:** Ma roman ji romantiyê derdikeve, gava nivîskar navê qehremanekî an qehramanan biguhere?

**L.Ronahî:** Na xêr. Tew dibe ku nivîsar ji ber sedemin taybetî, pêwîst bibîne ku navê qehremanên xwe biguhere.

**M.Kaplan:** Sedemên taybetî yên çawa?

**L.Ronahî:** Wek qehramanê çîrokê an kesin di çîrokê de hîn zindî bin. Lê li kesên dirokî divê mirov haydar be. Ji ber xwendevan "bi awakî din" dixwîn e. Nivîsar divê rûmetê bide qehremanên xwe û kesên din yên di çîroka xwe de. Lê divê xwendevanên xwe ji bîr neke. Ev pirensîp, bi serê xwe -ger nivîsar li ser raweste- hêzeke ji bona nivîsar e ku baştir binivîse. Evdalê Zeynê çima bûye yê "Zeynikê", nizanim.

**M.Kaplan:** Tu dibêjî, bila nivîskar tim dibin tirsa "gelo xwendevan wê çi bibêje? Vî kesî an vê derê nas dike an na?" de be?

**L.Ronahî:** Ji nivîsara rastgo re ne pêwîst e bi xwendevan re li ser tiştên ku dinivîsê têkeve mahasebakê. Her çawa dinivîse bera binivîsê, ew divê xwendevan; wek deriyekî girtî li ber xwe bibîne. Û divê karibe wî derî veke. Wek mînak; Qehremanên romanekê gava derengê şevê li pala Cizîra Bota bin û destê sibê jî ji deşta Heranê radibin û derbasî başurê Kurdistanê bibin, ev nabe. Wê çaxê nivîsar pêl her tiştî dike. Rastgotinî ne tenê di pêwendiyên civakî de, divê di pesindana hawir, di ya siruşt de û girîngtir di rewşa piskolojîk ya kesan de jî diyar be.

**M.Kaplan:** Baş e... nexwe roman çiye?

**L.Ronahî:** Gotina "roman" ê ji zimanên romanî hatiye. Berê pir tiştên bi zimanên romanî hatine nivîsîn, jê re roman hatiye gotin. Lê romana ku em li ser dipeyivin, wek beşek ji beşên edebiyatê jî nuh, bi derketina civata birjiwazî (kapîtalîzm) re ye. Sedemên ku berî kapîtalîzmê roman tuneye, ji xwe pirsgirêka romanê ye. Pirsa romanê KESE (individ) Ev kes jî ne her kesê di dîroka mirovatiyê de beşdarbû ye. Ji ber kesê di pirsa romanê de, kesekî azad, xwedî raman û hin girîngtir kesekî xwedî cîhanek nihînî ye. Piştî ev kes di civatê de beşdar dibe, hîn rastir piştî beşdarî jîyana civakî dibe, roman jî tête nivîsin. Ji nivîsa ku li ser vî kesê xwedî cîhanek nihînî, xwedî ramanên xwe û azad, û di nav pêwendiyên civakî de, bi kesên din yên di civatê re û bi danûstendina bi wan re hatiye ava kirin, roman têtê gotin. Ji xwe divê ev nivîs jî wek her nivîsên edebî yên din, li gor torên edebiyatê be û daxwazên nivîsî û rûkî (form) bi cîh bîne.

**M.Kaplan:** Tu dibêjî nivîskarên me vê teorîya romanê nizanin. Nizanibin çima ewqas roman hatine nivîsandin?

**L.Ronahî:** Na, xêr ger teoriya romanê zanîbana wê roman binivîsandina.

Pirsa din; çima ewqas roman nivîsandine, ez nizanim lê romanên wan çawa hatine nivîsîn. Ez dikarim tiştna bêjim; ev nivîsarên me kultur û zimanê xwe baş nizanin. Ev nezanî, wek şaşiyên rêzimanî, çewt gotinî, kêm û şaşgotinî, nezanîya gotinên bav û kalan, yên gelerî uhw. di berhemên wan de diyar e. Nezaniya wan ya li ser civata kurd di baweriya minde, ji xwe bi nav û deng e.

Carna berhemên wan weke ku tu bombayekê têxe nav çanda kurdî, an jî êrîşeke li himber çanda kurdî. Wek mînak: Kund nîşana beoxirî û bêxêrîyê ye. Gava kund bi ser hinekan de bixwîne yuzbûn e, mirina wan ne dûre, an jî belayek bi ser wande tê. Cîhê kund di mitolojîya Kurd de, ev e. Nuha gava nivîsar ji qehremanê xwe re bi çêyî û xweşî bêje "çavên te wek çavên kundekî vebûn.... kêfa te hat" ma ev çiye? Qehreman jî xwendevan jî li ber pîyan diçe.

Avakirina romana xwe, bi xwe şaş çêdikin. Bi rûpela pesnê qehremanan didin. Lê gava qehreman bi xwe di çîrokê de beşdarî jiyanê dibe, dide û distîne, tiştekî din e. Tu dibêjî qey ew pesin dan ji bona wî nebû, ji bona yekî din bû. Mînak: "Tu" û "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê".

**M.Kaplan:** Di "TU" de çawa tu dikarî vêya berbiçav bikî?

**L.Ronahî:** Ew xortê ronakbîr (ku nivîs nemaye ku nexwendiye) ku li benda girtina xwe ye, gava têtе girtin nezanebûna wî xwuya dibe. Dezgeha sistema kolonialîst nabîne, jê re pir xerib tê gava êşkencê pê dikin û leşker kefê dikin. Ji xwe dipirse "çawa kêfa leşkera tê" tênagihîje.

Nivîsarê Kurd xwe ji romanên xwe yên siyasî an yên xelkê (tevgerên Kurd) rizgar nake. Doza gelê kurd û zimanê kurd barê nivîsa xwe dibîne. Baş e ser çava. Lê çawa? Radibe romana xwe ji romantiyê derdixe û dike dersek zimanê kurdî. Bi vê jî ranaweste, dixwazê yekîtiya zimanê kurdî çêke. Ji bîr dike ku romanê dinivîse, ne rêziman an jî meqaleyekê li ser ziman.

Nivîsar ger romanekê dinivîse, divê romana wî jê re armanc be. Wê çaxê de bêtir karibe li ser zimanê kurdî raweste. Tê bê ev çawa çê dibe?

Nivîskar bi rêya qehremanên xw dikare vêya bike. Mirov qehremanên xwe tîne. Barekî li ser milên wan dike, di nav pêwendiyên civakî de, divê bi danûstendina bihev re barê xwe hilgirin/bibin serî. Peyva qehreman bihevre, hezar carî berjewentir e ji zimanê kurdi re, ji dêvla nivîsar rûnê û gotinên xwe ducar bike. Mînak: Tov tov, celeb celeb, babet babet, nivş nivş, hinar hebûn. Ev çine?

**M.Kaplan:** Hinekî ne tûjbûne tiştê tu dikî? Ji ber tu bi xwe dijwariyên zimanê kurdî û nivîsa kurdî dizane. Nivîsarên me jî hew ev in û bi kurdi rastnivîs (prosa) kême. Çima tu li himber wan ewa işke.

**L.Ronahî:** Na xêr... Nivîsarên nûh heviyekê didin mirov û mirov li bende romaneke hîn xweştir e. Lê tim karê berovajî ye. Dest pêkê xerab dest pê dikin. Ev yek.

Ya din, dibe ku nivîsar di destpêkêde şaşî û kêmayên rukî (form) bike. Ê me ne kêmayîye, gundehekî mezin e. Ji ber dizane ku tiştê dinivîse ji bin dernakeve, lê dîsa jî dinivîse.

**M.Kaplan:** Ev gotinek giran e. Tu dikare berbiçav bike?

**L.Ronahî:** Belê ezbenî. Avahiya romanê rast çênakin. Ger tu berekî/perçakî ji romanê nexwîne û xwendina romanê temam jî bike, kêmaya wî berî/perçî xwuya nabe.

www.arsivakurdi.org

Ya duduwa... kincên ku ji kesên romanê re didrûn, li wan nayên. Ne tenê li wan tenge an fireh e, reng jî ne ew reng e û model jî ne ew model e. Belkî ya hîn girîngtir ku kumaş ji ne ew qumaş e. Mînak: Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê ya M.Uzun: Xwendevan tucar fêrnabe ku Evdalê Zeynê ji ku derê ye. Hew tête zanîn ku li derdora sîpanê Xelatê dijî.

Evdal kurdekî mezin e û serekê stranvan û dengbêjên kurdî ye. Rabûn û rûnistina wî stran û helbest û dersdana wan e. Şagirtên wî hene, her dem şireta li wan dike da ku wek dengbêj û stranvanên kurd û kurdistanî bighîne. M.Uzun, Evdalê Zeynê weha dide naskirin. Lê wê romanê sed carî bi xwîne Evdalekî weha tê de nîne. Stiranên Evdal distirê, hew bi zarê kurdî ne, tiştekî kurdî an kurdayetî di wande nîn e.

Helbestên ku di romanê de bi nivîsî hene, wek helbest pir qels û vingî valane û ji xwe tu stranvan û tu dengbêj wan nastirên. Dê ji xwe fedî bikin. Ji ber vê yekê di huner de hebûna gotina wek "qehreman û pehlewan" ne bes e. Divê ev qehremanî û pehlewanî li dij kê û li gel kê û çawa ye bête nîşandan.

**M.Kaplan:** Ma di nivîsa kurdî de şaşî hew yên nivîsarên romanê ne?

**L.Ranahî:** Na...xêr. Ev şaşî di her beşê nivîsa kurdî de peyda dibe. Şaşiyên metodîk yên di kovar û rojnameyan de, pir berbiçav in û pir jî bi talûke ne.

Ji ber ku rojname û kovar ji pirtûkan bêtir belav dibin û pirtir tên xwendin. Şaşî û kêmasiyên wan jî hîn bi zerartirin. Di rojname û kovaran de metodên nivîsê û rûwê (formê) rexnê pêwîst e beguhertin. Wek mînak: Di rojnameyan de, nivîs hene ku navê werger heye lê yê nivîsar tuneye. Navê werger ji yê nivîsar bi gelekî mezintir têtê nivîsin. Ya xerab, dibe ku ew nivîs bi xwe ji zimanê tirkî an Swedî hatibe wergerandin . Hinek ji wergerên kurd (ên pirtuka) tiştekî din jî dikin. Navê xwe li ser rûwe (kapaxa pirtûkê ) pirtûkê dinivîsin.

Yê ku mirov li ser dinivîse çi kiribe bila kiribe, mirov divê, bi naveroka rexneya xwe bawer be. Lawikê Berrivanî di rexneya li ser nivîsa Kurdo Baksî û li ser diziya Koyo Berz de bêrêtî kiriye.

Pûana nivîsa Kurdo Baksî, qelsbûna hevpeyvîna kurd û kêmasiya wê ya pesindanê (wesif kirin) ye. Lê Lawikê Berîvanî xwe di ser vê yekê re çend dike û li çewtîtiyên zimanî, rêzimanî û rojnemevantîya Kurdo digere.

Di mesela Koyo Berz de jî êrîşî zanistî û agahdariyên xwe dike. Gelo N.Zaza navê Koyo Berz bi kar aniye an na, dipirse. Lawikê Berîvanî. Ger ne Koyo Berz yekî din ku Lawikê Berîvanî wî nasnake, ew dizî kiriba qerfa L.Berrîvanî dê di cîh de ba. Ji ber ger Koyo Berz ji L.Berîvanî re bi pirse û bêje "ma rast e tu Koyo Berz nasnakî, min berpirsîyara rûpeleka rojnama ku tu di qûncikeke wê de dinivîsîne, dikir."? Gelo Lawikê Berîvanî dê çi bibêje.

**M.Kaplan:** Ma tu Koyo Berz ji Lawikê Berivanî rastir dibînî?

**L.Ronahî:** Naxêr... Sed heşa. Ez awayê rexneya L.Berîvanî şaş dibînim. L.Berivanî ne tenê diziya Koyo Berz derxistiye pêş çava ya gelek kesa, eşkere kiriye. Û ev nêçîra wî şayanê gotinê ye. Niha kêmasiyên nivîsa kurdî belkî mirov karibe daqurtine, lê gemarên nivîsaran neyên daqurtandin ne jî qebûlkirin. Ji ber tiştekî ji bona "nivîsar" (wek kurd) divê pir giran be gava L.Berîvanî wan di ser gunehên wan de digre. Di civata kurda de 2 tişt mirov pûç dikin; yek derew, dido; dizî.

**M.Kaplan:** Nuha te nêçîra Lawikê Berivanî anî zimên. Ma tu çare tune ye ku Lawikê Berîvanî dev ji neçîra xwe berde, bi karekî din mijul bibe?

**L.Rohanî:** Mixabin bi ser ku ewqas dêhna mirova dikêşîne ser van nivîsarên diz yên ku ji ya ya xwe danakeve. Niha jî ya xwe daketin û daneketin meselake nivîsariya moralî ye. Lê çend rêgin din hene. yek wek xwendevan, mirov dikare weşanên di swêdî de şerê wan bike. Ez bawerim ya herî bi tesir dê ev be. Ev jî nebû rêyên huqûqî hene ku mirov dikare bigre.

**M.Kaplan:** Tu dibê "rêya huqûqî" mebesta te li hev gili kirine?

**L.Ronahî:** Belê ez benî. Gava tu rêyek din kar neke, ev rê vekiriye. parastina berhemên kurdî parastina Nivîsarên kurd ên ne hazir, li her kurdî/xwendevanî dikeve.

**M.Kaplan:** Te got nivîskarên "ne hazir" tu dikare mînakekê bide. Wek şerha dîwana melayê Cizirî. Hevalên tipên wê guherîne ên latînî û çapkirinê wek ku wan Melayê Cizirî şerhkiribe çapkirine. Lê mixabin ji sala 1961-ê vir de li ser wê şerhê axaftin (diskussion) heye. Gava Diwana M.Cizirî çapa duyemîn (1987) kir axaftinek din li ser di kovara (Dirasatûl iştîrakiye) de derket. A van hevlên li swêd, diwan çapkirin dibe, dizîya ji diza.

**M.Kaplan:** Baş e, tu ji nivîsaran çi dixwazî? Bila çawabin?

**L.Ronahî:** Ez benî gava tu pirsgirêkeke meselê dadixê nav kesan bersîv dan dijwar dibe, ji ber ne ji mafê min e ku ez çarçovekê ji nivîsaran re deynim. Lê gava tu pirsgirêkê bi tevayî bigre, mirov dikare tiştên ji nivîsaran dipê bêje:

-Nivîsar ji ber gelek tiştan divê xwedî berpirsiyar bin. Divê berpirsiyariya xwe rê hem karê xwe bide. Nisîvarên kurd mixabin, gava li cem hev rûdinin pesnê hev didin.

-Nivîsar divê berpirsiyarê rê xwendevan û merovên li ser wan dinivîse bide. Nivîsar divê sewiya xwendevanan bide ber çavên xwe, derewa li wan neke.

-Nivîsar divê ne xwe, lê tiştê dibêje bide pêş. Ger xebat ji bona "Romana Yekemîn a kurdî" filmê yekemîn ê kurdî "uhw. be vala ye.

-Nivîsar divê durust be, qelsiyên xwe neke qelsiyên zimanê kurdî, kemayên xwe bi rewşa kurd û zimanê kurdî ku tê deye veneşêre.

**M.Kaplan:** Tu van tişta pir bi hesanî dibêjî. Kes nema ku te rexne lê negirt. Li gorî te, kesên dinivîsin bi kêrî karên xwe nayên. Te bixwe heta nûha tu titş nekiriye. Tu çawa vî mafî dide xwe û bi vî hawê tûj rexne li van nivîskara digre? Ma vê yeka ku tu dike, hinekî ne bêberpirîyari ye?

**L.Ronahî:** Ez benî têgihiştinek şaş di nav me da heye. Em dibên yê ku tiştekî nake divê rexne jî li tiştekî negre. An jî em dibên baş e, tu rexne digrî, de were bi îmkanên me baştir çêke. Na... xêr têgihiştina pêşî totalitereya ya din jî pir şaş e. Ez bi xwe tiştkî nakim, lê ez wî mafî didim xwe ku rexne li çi tiştê çê bûye û çi jî tiştê (vekirî) çêdibe bigrim. Dibe ku çêkirina tiştê çêdibejî ji min neyê, ez cardin rexnê lê digrim.

Ez vî mafî didim xwe ji ber di demokrasiyê de mafek heye ku navê wî azadiya ramaniyê ye. Bi vî mafî vekirina bîr û baweriyê têtê parastin. Ez tu sînorî ji wî mafî û parastina wî mafî re nabînim. Gava ez vê azadiyê didim xwe û dipeyivim ez ji berpirsiyariya guhdarikirinê jî pir haydarim.

Kesê ku ez rexnê lê digrim dikare,

-Ji bînî de guhnede min.

-Dikare bi tevayî li himber rexna min raweste.

-Guhdar bike û ger rast bibîne dikare tiştên xwe bughere.

-Ya herî girîngtirîn ku "kriterium"ek (pîvanek) heye ku mafê her xwendevani yê da ji nivîsar "birûmet bûna wî" bixwaze. Ji ber gelê kurd/Neteweê kurd vatiniya nivîsandinê nedaye tu kesî ku ji bona wî binivîsine. Karekî pir kesî (şexsî) ye û nivîsar vî karê pakij bi dilê xwe hildibijêre . Lê gava karê xwe paqij çêneke, ev jî ne gunehê tu kesî ye.

**M.Kaplan:** Sipas ji bona vê hevpeyvînê.

**L.Ronahî:** Sipas ji bo te.

www.arsivakurd.org

# NO FIN DIHA NÊŞENO BIVIJÎYO

## Baboyan

Rojê merdimê cinî kewno, cînet ano, çim sûrikî beno. Gûnî geyran a ci çiman ver, dano piro şino hîrê merdiman ê bêguna û bêsûcan kişeno. Meyîtanê nînan gêno ano keydê xo di nimneno. Bahdo aqilê ci yeno ci sere vano:

-Ya meştî boy a nê meyîtan ser kewo, ez do se kera, çi welli a xo sere kera. Boy do nê meyîtan ser kewo, enbiryanî do boy bancê û şirê xebari bidê hukmatî. O wext hukmat do bîro mi tepşo û bero hepis kero. En rind û saxlemê ci, ez şira çarşi di ahmaqê bivîna, çend qurişî perey bida ci, wa nê meyitan bigîro bero çekero dolî mîyan.

Na dano piro şino çarşî. Çarşî di xeylê na kişt a a kişt a geyrono.

Xeylê doş bî tepey a, merdimê do ehmaq vîneno. Veydano ê merdimdê ehmaqî û ci rê vano:

- Deza yê mi, ez tay perey bida to, karêdê mi esto ti do bikerê? Ehmaq vano:

- Xo ra bêperey a. Ti xeyrê do winî bikerê, ti do sirê cenet. Merdek ci rê vano:

- Mi dimi kewi, ma şirê. Ehmaq kewno merdekî dimi, nê danê piro şinê keydê merdekî. Mêrdek, keye di ehmaqî rê vano:

- Bigî, nê meyitî beri berzi filan doli (goli) mîyan û bêrî, ez do hendayê perey bida to. Ehmaq vano:

- Sere û çiman ser.

No ahmaq meyitî keno xirarê mîyan.

Şewi yeno erzeno xo paştî, gêno beno erzeno doli mîyan yeno, merdekî rê vano:

- Mi girot berd eşt doli mîyan û ez ameya. Kanî, ti jî peranê mi bidi ez şira keydê xo.

Mêrdek meyitê bînî vejeno ano ahmaqê ver di ronano û vano:

- To girot berd eşt dolî miyan, ema o verê to dali mîyan re vijya û fina pey di ame. Bigî, beri fina berzi doli mîyan û bêrî.

Ehmaq meyitê didini zî keno xirari mîyan, erzeno xo paştî, gêno beno erzeno doli mîyan û pey di ageyreno yeno, vano:

-Mi berd eşt doli mîyan û ez ameya. Hadê peranê mi bidi ez şira.

Mêrdek meyitê hîrini zî vejeno, misneno ehmaqî û vano:

- Bewnî no ya fina pey di ameyo. Bigî beri fina berzi doli mîyan û bêrî. Ez do no fin diha vêşî perey bida to.

Ehmaq vano:

- Halla halla, senî wina beno, senî meyît doli mîyan ra vijyêno û pey di yeno, him zî verê mi yeno xo resneno keye? Heta ewro çiyê do wina, 'ecêbêda wina mi nêdîbî. Senî merde werzeno û yeno. Vatê însanî mirenê şinê a dinîya û a dinya di geyrenê û rihê yîni fina pey di yeno, mi 'emeley nêkerdê. Dêmekî heme çî raşto. Mi vatê, dinya di kes mi rewêrî ray nêşino, no meyit mi dîncêrî yo û mi rewêrî ray şino. Mêrdek vano:

- Bigî beri berzi doli mîyan, doli mîyan di sereyê ci rind awi ro cini, pay ki wa fina pey di awi mîyan ra nêvijîyo û nîro. Ehmaq gêno meyitê hîrini jî beno erzeno dolî mîyan. Wexto ki erzeno dolî mîyan sereyê ci cineno awi ro û linga xo ya pay keno û wina vano:

- Şenê ti, no fin jî pey di bivijî û bêrî?

Meyitî comê awi keno, meyit şino awi bin.

Ehmaq werzeno xo ser keno ki bîro, hend winêno ki a kişt a doli di qerantîyêno aseno. Ti nêvanê bîyo nezdî şefaqî.

Milayê(xoca) dewi jî pirênê xo yo xaşêlin o sipe dayo xo ra û ameyo doli ver ki, sereyê xo bişûwo, awê xo ro kero û desmac bigîro şiro camî akero û azanê şefaqî veyndo.

No ehmaq dano piro şino, akişta doli di milay tepşeno û serî ser erzeno doli mîyan û wina vano:

- Gam a bîni mi ti eştî doli mîyan û cinay awi ro? Senî zey cinîya ti awi bin ra vijiyay û çi rew to xo resna nakişt a dolî?

Qîrînî, qîjînî û hawari kewna milay ser û mila vano:

- Qurbanê to bena, tî yê se kenê, to ez nêsinasnaya. Ez milaya mila, milayê dewa, ez ameya xo rê desmac bigîra, şira camî akera û azanê şefaqî biwana. Ti xînt-mîntê, tî yê se kenê, ney di şaşey ê esta. Tî yê mi jewnaya kenê tê mîyan. Aqilê xo arêki xo sere. Berî berî a xo, xîntey meki, mi awi mîyan ra veji. Ez asnawi nêzana ez do bifetisiya.

No ehmaq qe goştarey a milay nêkeno û goş a pa nêkweno.

Serî ser milay cineno awi ro û vejeno û cam keno, û vano:

- Newe jî bî mila, milayo, milayê çiçî. Milayê herano. Şan ra yo ez o to ana erzena awi mîyan, tî yê zey şeytanîy a fina awi mîyan ra vijyenê û peyd di yenê. Newe jî tî yê vanê:

- Ez milaya, ez ameya desmac bigîra û şira ezan veynda. Ser o jî zûrî keno vano:

- Ez asnawi nêzana. Ti asnawi nêzanê se, tî yê senî awi bin ra zey qirêncilan a vijyênê û yenê.

Serî ser milay cineno awi ro. Û vano:

- No fin reyayişê to çinîyo. Awi bin di bena bixi-bixa milay. Bena bilqi-bilqa awi û bilqikî kewnê awi ser. Çendna deqiqey tepey a, mila awi mîyan di fetsiyêno û şino awi bin.

Ahmaq vano: No fin diha ti nêşenê bivijîyê. Bilqikî kewnê a ser û zey sîya mila şino awi bin.

Ehmaq vano:

- Newe ez ci ra rind û rind reyaya. ez diha şena şira mêrdekî ra peranê xo bigîra û şira keydê.

No dano piro yeno mêrdekî rê vano:

-Mi serî ser cina awi ro, lingda xo ya pay seredê ci kerd û rişt awi bin. Solixna ez hend winyaya akişt a dolî di, awi ver o vinderdo û o yo desmac gêno. Mi da piro ez şiya a kişta

# ŞURUBÊ KUXUK O

**Arêkerdox: Mihem Himbêlij**

Yew(jew) şeherê vakûrê Kurdistanî di yew Şêx û yew enbazê xwi benê. Şêx û eno enbazê xwi zaf yewbînan a hes kenê. Şêx û enbazê xwi teqrîben da-hîris(30) serre benê. Şêx û embazê xwi, hema-hema her roj yewinî d'awet kenê.

Yew rojê do zimistanî yo, aşmana sibata, vewri puk-puknena, cîran-cîranî nêreseno. Wextono ki tikêkê eyan weş bi, enbazê Şêxî şi qahwe, ki şêx ha qahwe di roniştewo. Epey teraq ra pey, enbazê Şêxî, Şêxî ra vano:

- Şêxê'm, ti emşo meymanê minê. Şêx vano:
- Çiman ser.

Lajik Şêxî ra vano:

Şêxê'm ti roşi, ez da-des deqey mîyan di şona tay aliş-vêriş kena û marê di şûşey şeraba sûrî gêna yena. Şêx vano:

- Baş o. Nabên ra zaf nêromeno, enbazê Şêxî yeno ti ra vano:
- Şêxê'm, gurê mi qedya, ma şenê hêdîna şorê. Şêx vano:
- Baş o.

Şêx û enbazê xwi têdir qahwe ra vejîyenê, kuwenê rayîdî ser, raşt vera xwi danê keye.

Wextono ki keye resenê, enbazê Şêxî dano ber ro. Maya jê senî ki ber akena, hewnîyena ki Şêx û lajê ja yê. Vana:

- Bêrê qirba, bêrê zere. Şêx û enbazê xwi şonê zere. Lajik marda xwi ra vano:
- Dayê! Nanîko mi çî mî ardo, ma rê bihedirni. maya jê vana:
- Başo lajê'm. Maya enbazdê Şêxî, se'etê ra pey, sifrê jîni hedirnena, gêna ana jîni ver di ronena.

Şêx û enbazê xwi nanê xwi wenê, dim ra zî fekê şûşa şerabda xwi akenê, şeraba sûrî ver qedihan danê û dest bide kenê şimenê(wenê). Eno nabên di maya lajikî kuwena zere, lajdê xwi ra vana:

- Lajê'm aw çîyo şima şimenê? Lajê ja vano:
- Dayê enoya şurubê kuxuk o, Şêx şimeno. Şexî serd giroto, şîyo doxtor, doxtorî daw bide.

Maya lajikî vana:

Lajê'm la mi zî serd giroto, tay bidê mi, ez zî bişima (bora). Lajik tay şerabi dekeno qedihi û dano marda xwi. Maya jê gêna şimena û ode ra vejîyena şona mitfaxi. Da-des deqey nabên ra vîreno, maya jê germ bena, sênê ja tikêkê pê abeno. Rana tepa agêrena yena ode, lajdê xwi ra vana:

- Lajê'm qirba, hela tayna şurub deki qedihda marda xwi, xule sênedê mi hamey, pê sênê mi abi. Lajik tayna şerabi dekeno qedihda marda xwi. Maya jê, ja zî şimena û rana tepa agêrena şona mitfaxi. Nabên ra da-des deqey vîreno, Şêx enbazdê xwi ra vano:
- Lila hela şo veyni, may to pê çîyê nêbo. Lajik wardeno şono mitfaxi, bavo ki çi veyno, ki maya jê teştê mîrî 'erdo ronawo, ardî kerdê, moxli (eleg) ki ha arda dana eleg ro. Lajik marda xwi ra vano:
- Day ti se kena? Maya jê vano:
- Qirba ez ardan dana moxli ro. Lajê ja vano:
- Dayê qey ti arda teştî ser o moxil nokena? Maya jê vana:
- Qirba marda torê heme ca bîyo teşt, heme ca...

---

dolî di mi no tepişt û fina serî ser eşt awi mîyan. Wexto ki mi no eşt awi mîyan, ney mi rê va:

- Tî yê se kenê, ney di şaşeyê esta, ez milaya, milayê dewa. Bextê namûsdê to kena, ti mi awi ro mecinê, ez asnawi nêzana, ez do bifetisîya. Mi goş nêkuwe pa û goştareya ci nêkerdi. Serî ser mi o comê awi kerd, cina awi ro. Bahdê çendna deqîqan ci ra veng nêvijya û zey sîya şî awi bin. No fin pî ey Ella bo, o nêşeno awi bin ra bivijîyo.

Merdek dano xo sere ro û vano:

- Eywax, milayê dewi jî şî, pereyê mi jî pa şî. Mi va qey milay rê çîyê nêbeno, o şaxlem o, mi pereyê xo û altûnê xo girotî berdî emanetê ey kerdî. Ronay ey heti. Ez do nika peran û altûnanê xo kê ra bigîra.

Mila jî şî, malê mi jî şî.

Peranê ehmaqî dano ci û vano:

-Rew mi çiman ver a vinî bi, şo wa çimê mi a to nêkewê. Ehmaq peranê xo gêno û şino.



www.arsivakurd.org

# AGAHDARÎ

## KONGREYA YA 13 ' MÎN A FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ

*LI SWÊDÊ, DI DEM Û CÎHÊ LI JÊR NIVÎSANDÎ PÊK TÊ.*

*TEV NÛNERÊN HILBIJARTÎ Û HEMWELATIYÊN ME LI SWÊDÊ BI XÊR WERIN, KONGREYA 13' MÎN.*

*DEM : 27 - 28 . SIBAT 1993*
*ŞEMÎ Û YEKŞEM*

*CÎH : MEDBORGARHUSET, Stora Hörsalen*
*T. Bana Medborgarplatsen - Stockholm*

*Komîta Karger a*
*Federasyona Komelên Kurdistanê*

## AGAHDARÎ

**Ji bo endamên seksiyona jinên Kurd li Komela Kurd li Spånga.**

**Endamên jin li Komela Kurd li Spånga, roja yekşemê di 22.11.1992-an de civîna xwe pêk anîn û di civînê de biryar girtin ku her rojên yekşema di navbeyna seat 12.00 - 18.00-an de 2 hevalê jin li Komela Kurd li Spånga amade bibin.**

**Daxwaza me ji hemû jinên kurd yên li spånga û her wisa li heremên din jî ew e ku bikaribin werin komelê ku dan û stendinên me bi hevre bê çêkirin.**

**Hûn hemû bi xêr werin.**
**Seksiyona Jinên Li Komela Kurd**
**Li Spånga**

# ئاگاداری

## کۆنگرەی (١٣)مینی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوێد، لە کات و شوێنی دیاریکراوی خوارەوە پێکدێت:

کات: ٢٧-١٩٩٣/٢/٢٨
شوێن: Medborgarhuset
Stora Hörsalen
T. Medborgarplatsen

هەموو نوێنەران و هاووڵاتیانی کورد بەخێربێن.

کۆمیتەی کارگێری
فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوێد

## ئاگاداری

بۆ ئەندامانی سێکشونی ئافرەتانی
کۆمەڵەی کوردی لە سپۆنگا

سێکشونی ئافرەتانی کۆمەڵەی کوردی لە سپۆنگا، لە رۆژی یەکشەمی ١٩٩٢/١١/٢٢دا کۆبوونەوەی خۆی پێکهێنا و بڕیاری دا کە هەموو رۆژانی یەکشەمە لە نێوان کاتژمێری ١٢-١٨ دوو هاوڕێی ژن لە بارەگای کۆمەڵەدا ئامادە دەبن.

ئێمەش لە کۆمیتەی کارگێری سێکشونی ئافرەتان هیواداریین کە هەموو ئافرەتانی ناوچەی سپۆنگا و ناوچەکانی تر سەردانی بارەگای کۆمەڵە بکەن بۆ ئەوەی پێوەندی و یەکترناسین لەنێوان ئافرەتاندا پەرەبستێنێ.
هەموو ئافرەتان بەخێربێن

سێکشونی ئافرەتانی کۆمەڵەی کوردی
لە سپۆنگا

www.arsivakurdi.org

## MAY Û PÎ

Karwanîdir bimeşe ray
Bizane qedrê pî û may

Wurdî to rê yê qic homay
'Emrê yînan dir wirze pay

New aşmî ti wegirot bî
Ti oryan bê perên û pot bî

Ti pawitî aw û agir ra
Bifikrî meke xu vîra

Çirê bê wefay weledî
Goş nêdanê may û pî

May endêke kena lorî
Xu kena bi heyran û gorî

Weyekena bi çirê çiman
Çi beşko yarê bê gunan

Bapîrê mi, mi rê fistanikî
Çîkanokî û meselikî

Pî min ez kerdê xu verarî
Wenişnaynê serê barî

Ma têdir şîne hare ye
Mîyanê bexçan rayna keye

May mi zî, ez hêlekanîde
Tim şaynetê eywanîde

Tim şima ra wa razî bê
Ti çi milûklê û çi qazî bê

Fedekarê zehf may û pî
Yînan bizane zey rebî

Qedr û hurmet bikerê bes
Heta şorê axir nefes

ARYAN

## BIRA NU MEMLEKETO

De hala werê werê werê
Werê welat Kurdistan o
Bira nu memleket o
Ma xeberê niceno

Domonê xo mi cawerdayê
Lacê min qic zof berbeno
Olî kenê kamkê naca sono
Mi vera lewê pano
Vazê pîyê to weso waro
Rozê vecîno yeno

De hala werê werê werê
Werê welatê delal o
Makê zumînê caverdayê
Marê kes rind nivano

Mestê bêro damê pêro
Dismenê ma zalim Tirk o
Ayke nayê nizonano
Mira awey sono
Îsonê ma na wertede
Ci ra terêxnano

Arêker: Hemedê Mamekiz

## TARÎX NÛŞTOX

Xwi vîrî meki
Namê to,
sîya û sipî ser di hewnîyayîşo.
Beşnawi!
Destê xwi wijdandê xwi serni.
Binûsi!
'Egîtan û şêran.
Binûsi!
Ayê ki,
semedo ki bawereya xwi nêdê dest,
bomba reydi,
ki xwi înfilaq kerdê.
Binûsi!
Ayê ki,
semedê yew tasa mercû
Gonîya birayandê xwi rijnenê.
Binûsi!
Ki meyşti, ti şermizar nêbê.

**Mihem Himbêlij**

www.arsivakurdi.org

# ئاواره

فەرهاد پیربال

با بڕوێن، هاوڕێم، ئەی شیعر
با ئەم سەرزەمینە بەجێ بێڵین
جیهانێکی دیکە لەولا
چاوەڕێی هەنگاوە ئاوارەکانی ئێمە دەکا.

***

کە منداڵ بووین
بە چڵوپۆپی ڕەنگینی دایک و
ڕێحانە سۆزی چەند خوشکێکی میهرەبان خۆمان فریودا
کە گەنجیش بووین
هەرزەکارانە
هەموو گوڕ و هێزی ژیانمان سپارد دەست قافیە بێ واتا و
ئەوینە تەمەنکورتە بێهوودەکانەوە.

***

ساڵانێکی زۆر بە تەمای سەوزبوون، بە تەمای ڕووان
دەمان بە ئەندازەی تینۆێتی
بۆ تنۆکە واتای
قەفە کەزیەکانی (جوانی) بەش کردبۆوە
زەمانێکیش
بە تەمای گەیشتنە ئاسوودەیی
هێندەی پێمان کرا
سنوورە دوورەدەستەکانی جەربەزەییمان تەی کرد:
بەناو مردنا، بەناو لەزەتا، بەناو تێکشکانەکاندا!
ئێستاش، ئەوەتا:
هەموو بووغمان، ڕابردوومان
وەک ڕۆحی مرۆڤ هەڵدەوەرێ
زەمین چڵکاو بەسەر چاوە جوانەکانی تۆدا
ئاسمانیش ژەهر بەسەر مەرەکەبی مندا دەڕژێنێ.
ئەم جیهانە وڵاتی ئێمە نیە!

***

با بڕۆین، هاوڕێم، ئەی شیعر:
جیهانێکی دیکە لەولا
چاوەڕێی هەنگاوە برینـدارەکانی ئێمە دەکا.

١٩٨٩/١٢

# دامەزراندنی ستۆدیۆی سینەمای کوردی لە ئەرمەنستاندا

لە ڕۆژی ١٩٩٢/١١/٥ لە کۆشکی سینەمای ئەرمەستاندا، لە یەریڤان، کۆبوونەوەیەکی فراوان کرا بە سەرۆکایەتی (ڕووبێن گێڤورگیناس) و بە بەشداری ژمارەیەکی زۆر لە ڕۆشنبیرانی کورد و ئەرمەن لە ڕۆژنامەنووس و کارکەرانی ڕادیۆ و تەلەفزیۆنی ئەرمەنستان و ئامادەبوونی میوان لە کوردستان و ئوستورالیادا. لەم کۆبوونەوەیەدا، دامەزراندنی ستۆدیۆی سینەمای کوردی ڕاگەیاندرا.

سەرۆکی لقی کوردی یەکێتیی نووسەرانی ئەرمەنستان (کارلێنی چاچان) پیرۆزبای ئەم هەنگاوەی کرد و بە ڕووداوێکی مێژوویی لە ژیانی کوردەکانی ئەرمەنستانی لە قەڵەمدا. کارلێن، پەنجەی ئاماژەی ئەوەکرد کە لە ساڵانی بیستەوە، چەند فیمێک ئەنجامدراوە لەوانە: زارێ- ساڵی ١٩٢٦، کوردی ئێزیدی ساڵی ١٩٣٣، فیلمی دەکۆمێنت- کورد- ١٩٤٩، کوردەکانی ئەومەنستان- ١٩٥٩.

لە کۆبوونەوەکەدا نووسەری بەناوبانگی ئەرمەنی (سێرۆ خانزادیان) و سەرنووسەری ڕۆژنامەی (ریاتازە)، (ئەمرێکی سەردار) و سەرۆکی کۆلێجی ڕۆژهەڵاتناسی زانکۆی یەریڤان (مێرێ کۆچەرێ) و شاعیری کورد (عەلی مەمێ) وتاریان خوێندەوە.

لە کۆتایی کۆبوونەوەکەدا بە دەستەی بەڕێوەبەرایەتی ستۆدیۆی سینەمای کوردی هەڵبژاردنی دەستەکە بەو شێوەیەی خوارەوە بوو:

- کارلێنێ چاچان: سەرۆک
- پرۆفیسۆر شاکرۆی محۆیی: ئەندام
- روبێن گێڤۆرگیناس: سەرۆکی یەکێتیی سینەماکارانی ئەرمەنستان- ئەندام
- گۆر ڤاردانیان: جێگری سەرۆکی یەکێتیی سینەماکارانی ئەرمەنستان- ئەندام
- دکتۆری مێژوو: مێرێ کۆچەر- ئەندام
- گارگێن زاکۆیان: سەرۆکی فیلمسازانی ئەرمەنستان- ئەندام
- ئەمەرێکی سەردار: سەرنووسەری «ریاتازە»- ئەندام
- پرۆفیسۆر شەرەف ئەشیر: ئەندام
- دەهێنەری شانۆی یەریڤان: ئەرسێن رەشید- ئەندام
- تۆسنێ ڕەشید: بەرپرسیاری ڕادیۆی بەشی کوردی یەریڤان- ئەندام
- تەیۆری خەلیل: ڕۆژنامەنووس- ئەندام

www.arsivakurdi.org

# کورد لە پاکستان

لە نامەیەکدا کە لەلایەن کاک عەزیز صالح هاتووە:
«... نزیکەی پێنج ساڵە، ئاوارەکانی کورد پەنایان هێناوە بۆ پاکستان و لەژێر پەرچەمی UN دا ژیان دەبەنەسەر. هیچ یارمەتییەکیان نییە بۆ ئەوەی بتوانن سەفەر بکەن بۆ دەرەوەی پاکستان و هیچ وڵاتێک لەو کوردانە ناپرسێت. ئەوە ماوەی چوار ساڵە منداڵانی کورد خوێندنیان لەدەستچووە...».






* وێنەی چەند منداڵێکی کورد کە تەمەنیان نێوان ٦-٧ ساڵە لە بەردەم قوتابخانەیەکدا وەستاون، کە یەکەم ساڵیانە دەخوێنن.

* دوو کچی کورد کە تەمەنیان ١٠-١٣ ساڵە، کە تازە دەستیان بە خوێندن کردووە.

---

## چالاکییەکانی کۆمەڵەی کوردی لە لوند



لە رۆژی ١٩٩٢/٩/١٢دا بە ناوی (ئینمەی گەنجان) لە سکۆنە Vi unga i Skåne چالاکییەک کرا دژ بە رەگەزپەرستەکان، لە باخچەی Stadpark کە ئێمەش بەشداریان بە وێنە و خواردنی کوردی و جلوبەرگی کوردی کردبوو.



لە شەوی ٩/١٦/ لە شاری لوند بە ناوی kultur Natten ئاهەنگێکی کوردی ساز کرا و بە ئامادەبوونی خەڵکێکی زۆر.

# دڵە گەورەکەی مامۆستا عەبدولمەجید لوتفی لە لێدان کەوت

# ١٩.٤ -١٩٩٢



دەنگوباس رادەگەینێ کە لە ٢٧/١./١٩٩٢ دا نووسەری کورد مامۆستا عەبدولمەجید لوتفی لە تەمەنی ٨٩ساڵیدا لە بەغدا کۆچی دوایی کرد.

مامۆستا لوتفی لە ساڵی ١٩.٤، لە شاری خانەقیندا لە دایک بووە، بەڵام لە سییەکانەوە لەبەغدا ژیاوە. بۆیش کە دەستی کردۆتە نووسین بە عەرەبی چیرۆکی نووسیوە و بە یەکێک لە چیرۆکنووسە بەناوبانگەکانی عێراق ناوی دەرکردووە.

مامۆستا لوتفی لە ناوەراستی سییەکاندا بە هاوبەشی لەگەڵ عەبدولسەلام حیلمی نامیلکەیەکیان لەژێر ناوی (نظرات في الادب الكردي) بلاوکردۆتەوە. دوا بەرهەمی رۆمانێکە کە بە زمانی کوردی چاپکراوە لەژێر ناوی (پێشبینی لیزانە قەرەجەکە) چونکە دەستنووسەکەی داوەتە مامۆستا شوکر مستەفا و لەسەر ویستی ئەو جاری یەکەم بە کوردی دەرچووە.

مامۆستا شوکر مستەفا لە پێشەکی رۆمانەکەدا دەنووسێ: «دیارە ئەم پیاوە هەر لە منداڵی را هەستی کوردەواری یانەی ماتەی دابوو، بەڵام زۆر درەنگ گەیشت. لەم دواییانەدا تەواو گەیی بوو. رۆحی پێ دووگیان بوو. ژانی هاتبووێ. خۆشە پیاو بە غەریبی نەمرێ».

مامۆستا عەبدولمەجید لوتفی پتر لە ٢. کۆمەڵە چیرۆک و رۆمانی چاپکراوە.

سلاو لە گیانی نووسەری کوردپەروەر،
عەبدولمەجید لوتفی

بەربانگ




www.arsivakurdi.org

## ئاساواری کوردستان

# قەڵای شیڕاونە



قەڵای شێروانە دەکەوێتە خوارووی کەلار، لەسەر گردێکی بڵند و لەنێو دەشتێکی فراواندا.

قەڵاکە لە ناوەراستی سەدەی نۆزدەهەمدا دروست کراوە، هەندێک مێژووی دروستکردنی دەگەرێتەوە. ساڵی ١٢٨٣ کۆچی واتە لە ١٨٦٦ زاینیدا. قەڵاکە لە لایەن محەمەد بەگی کوری خسرۆ بەگی کوری سلێمان بەگی سەرۆکی عیلی جاف دروستکراوە. بەپێی کتێبەکەی جەمال بابان، وشەی شێروانە بە دوو جۆر لێکدراوەتەوە: (لانەی شێران، یاخود هەندێک دەیگەرێنەوە سەر ناوی پاشای ساسانیان- نەوشیروان).

قەڵاکە بە بەرد و گێچ دروستکراوە لە شێوەی هەشت گۆشەییدا، دوو نهۆمە و لەگەڵ ژێرخانو (سرداب) وەک لە ئاساوەری بازنە ئاسنەکانی لە دوارەکان ماوەن بۆمان دەردەکەوی کە بۆ بەندیخانە بەکار هاتووە- قەڵاکە رووی لە رۆژهەڵاتە، دەرگایەکی سەرەکی و دوو دەرگای لایەنەکانی هەیە. دەرگاکان لە شێوەی کەوانە و لەگەڵ ستوونی ناوەندی، ئاساوەری هەندێ قوللەی تێدایە کە لە شوێنی بەرگریکردن دەچێ. ئەو قەڵایە تا ساڵەکانی سی وەک کۆشک لەلایەن نەوەی محەمەد پاشا بەکار هاتووە، بەڵام پاشان دەوڵەت بەکرێی گرتووە و کردویەتی بە بنکەی پۆلیس و پاشانیش بوەتە بارەگای ناحیەی شێروانە.

(ئەم زانیاریانە لە کتێبی- جەمال بابان- أصول اسماء المدن والمواقع العراقیە- ج١. بغداد ١٩٧٦. ل ٢٣- ٢٣٢ هەروەها لە هەندێ سەرچاوەی تر) وەرگێڕاوە.

بەربانگ








# پەرەسێلکە

## گۆڤارێکی ڕۆشنبیریی مندالانە

مندالانی کورد، بێبەشترین توێژی کۆمەڵی کوردەوارین، چ لە باری گرنگی پێدان و مافی سروشتی مرۆڤەوە، چ لە لە بواری گرنگی پێدان بۆ دابین کردنی پێداویستەکانی ژیانی ڕۆژانە و پەروەردە و یاریکردن و ڕەخساندنی زەمینەی پێشکەوتنیان لە بوارەکانی خوێندن و وەرزش و پەروەردەی مۆسیقی، تەندەروستی و کردنەوەی یانە و...هتد. لە بواری ئەدەبی مندالان و گۆڤاری تایبەتیدا، خراونەتە پشتگوێ... پەنجا ساڵێک بەر لە ئێستا، کە کۆمارە جوانەمەرگەی کورد دامەزرا، یەکەم گۆڤاری مندالان بە ناوی «گروگالی مندالان» لە دایک بوو، ئەوەیش لەگەڵ کۆماری کوردستان هەناسەبڕ کرا. لە ناوەراستی هەفتاکاندا، گۆڤاری «ئەستێرە» چاوی هەڵێنا، بەڵام بەر لەوەی مندالانی کوردستان پێی ئاشنابن و دڵیان خۆشکەن، ڕژێمی بەعسی بەغدا زمانەکەی بری... لە کاتێکدا لەم وڵاتانەی کوردستانیان داگیرکردووە، چەندان گۆڤاری مندالان بە زمانی عارەبی و فارسی و تورکی دەردەچن، بەڵام تاقە گۆڤارێکیش بە مندالانی کوردی ڕەوانابینن...

لەم چەند ساڵانەی دواییدا، کوردە ئاوارەکانی ئەوروپا لەم بوارەدا هەنگاویان ناوە، بەڵام ئەویش هەر بەنیوەچڵی ماوەتەوە گۆڤاری «کۆچەر» و «کولیلک» لە سوێد سەریان هەڵداوە... کۆچەر چەند ژمارەیەکی سەرەتای تارادەیەک ڕەنگین بوو... کولیلک... بە لاتینی و ڕەش و سپی بلاودەکرایەوە و سەرنجی مندالانی بۆ خۆی ڕانەدەکێشا... هەرچەندە هەردوو گۆڤار بە تەواو لە دەرچوون نەکەوتوون، بەڵام بە ڕێکوپێکی دەرناچن.

دوای ئازادبوونی بە شێکی باشووری کوردستان، پەرۆشی و دڵسۆزی هەندێ نووسەری کورد لە هەولێر، سەرەتا وەک پاشکۆی- کوردستانی نوێ- پەریستان هەفتانە دەستی بە دەرچوون کرد... لە تەک «پەریستان»دا نووسەران مەولوود ئیبراهیم حەسەن و ئیدریس لاوە و هەڵگورد عەبدولوەهاب، هەنگاوێکی پیرۆزیان نا و گۆڤارێکی ڕەنگاوڕەنگی مندالانیان بە ناوی - پەرەسێلکە-، خستە بەردەستی مندالان... پەرەسێلکە تا ئێستا سێ ژمارەی بە (١٦) لاپەرە... لێدەرچووە، گۆڤاری پەرەسێلکە لە بارێکی ئابووری و کۆمەڵایەتی دژواردا دەردەچی، بۆ زاخاوکردنی مێشکی مندالانی کورد و پەروەدەکردنیان... لەگەڵ پیرۆزی و دەستخۆشیمان بۆ دەرهێنەران و نووسەرانی (پەرەسێلکە)، ڕادەگەیەنین و هیواداریین بەردەوام بن و سەرکەوتووبن لە بەرەوپێش بردنی (پەرەسێلکە) و لەگەڵ (پەرەسێلکە)دا ئەم وشانە دووپات دەکەینەوە:

بۆ ئەوەی گۆڤاری پەرەسێلکە زووتر و چاکتر و هەرزانتر بلاوبکرێتەوە، یارمەتی پەرەسێلکە بدەن.

**بۆ ئەوەی مندالانی کوردستان بێ گۆڤاری مندالان نەبن، یارمەتی پەرەسێلکە بدەن.**

بەربانگ



# بانگەوازێک لە کۆمیتەی بەرگریکردن لە مافی قوربانیانی ئەنفالەکانەوە

## جەماوەری بەشەرەفی کوردستان

گومان لەوەدا نییە کە ئەنفالکراوەکان و کەسوکاریان لە هەموو خەڵکی کوردستان زیاتر بەر هێرشی دڕندانەی ڕژێم و بەرزەبری جەنگی لەناوبردنی بە کۆمەڵ کەوتوونە و گەورەترین زەرەر و زیانی گیانی وماڵیان لێکەوتووە و شوێنەوارێکی دڵتەزێنی قووڵی بە جێهێشتووە. ئەوە کێشەیەکی مرۆڤایەتی زیندووە کە نزیکەی نیو ملیون کەس بە ئەنفالکراوەکان و کەسوکاریانەوە دەگرێتەوە وەک دواکەوتووترین بەشی ئەم کۆمەڵە کە لە ژێر باری برسییەتی و بێکاری و دەربەدەری و بێ خانەیی و نەخوێندەواری و نەخۆشیدا دەناڵێنن. ئێمە «کۆمیتەی بەرگریکردن لە مافی قوربانیانی ئەنفالەکان» بانگەوازی هەموو کەسوکاری ئەنفالکراوەکان دەکەین بۆ بەرگری کردن لە مافە مرۆڤایەتییەکانی خۆیان و ڕۆڵە ئەنفالکراوەکانیان و لە پێناوی بەدیهێنانی ئەو مافانەدا هاوکاریمان لەگەڵدا بکەن.




بانگەوازی هەموو ڕێکخراوی سیاسی و پیشەیی و خێرخوازەکانی کوردستان و ڕێکخراوە مرۆڤدۆستە جیهانییەکان دەکەین هاوکاریمان بکەن بەو هیوایەی کێشە و خواستەکانی ئەنفالکراوەکان و کەسوکاریان بگاتە ناوەندە جیهانییەکان و گەورەترین پشتگیری و مرۆڤایەتی بۆ ئەم بەشە زامدارەی گەلەکەمان دابین بکرێت.

بانگەوازی پەرلەمانی کوردستان دەکەین پشتگیری کۆمیتەکەمان بکات و کێشەی ئەنفالکراوەکان و کەسوکاریان وەک کێشەیەکی زیندووی گەلەکەمان لە ئەستۆ بگرێت. بۆ هەرکەسێک کە بیەوێ پێوەندیمان پێوە بکات، دەتوانێت سوود لە ناونیشانی کۆمیتەکەمان لە کوردستان وەرگرێت بۆ پێوەندی کردن بە مەڵبەندی کۆمیتەکەمان لە سوێد.



بۆ ئاگاداری نزیکەی . . . ۱۸۲ کەس ئەنفال کراون.

ناونیشانی کۆمیتەکەمان "ئەنفالکراوەکان" لە کوردستان:

گەڕەکی ڕزگاری - عیمارەی عەتتار

سندوقی پۆستی ژمارە ۳۷۵

سلێمانی - کوردستان


Ari
Forv. 9
145 51 Norsborg
Tel. 08- 53 18 11 46
Pg. 645 36 12-1
AD- SK "Anfal:s"


www.arsivakurdi.org

# شالاوی گرتن و ئەشکەنجەی کورد لە سوریا تاوانبار دەکەین

بەپێی بەیاننامەی لیژنەی مافی مرۆڤی کورد لە ئەمسا کە لە ۱۹۹۲/۱۱/۲۵دا بلاوی کراوەتەوە، رژێمی سوریا بە مەبەستی سەرکوتکردنی کورد، پەلامارێکی بەربلاوی کردۆتە سەر هێزە سیاسیەکانی کوردستانی سوریا و پتر لە ۱۵۰ کەسی گرتووە و لە بانگەوازەی لیژنەی ناوبراودا هاتووە:

لە مانگی رابردوودا رێکخراوە کوردییەکانی کوردستانی سوریا بەیاننامەیەکیان بلاوکردۆتەوە کە حکومەتی سوریا بەردەوامە لە جێبەجێکردنی پرۆژە رەگەزپەرستانەکەی بەرامبەر کورد، ئەو سیاسیەتەیان تاوانبار کردووە» و هەروەها لە بانگەوازەکەدا هاتووە: «دەستەلاتدارانی سوریا بە مەبەستی سەرکوتکردنی ئۆپۆزیسیۆنی کورد، دەستیان کردۆتە پەلامار و هێرشێکی پۆلیسیانە لە چوار هەفتەی رابردوودا، پتر لە ۱۵۰ کورد لە سەرکردە و کادیرەکانی حیزبە کوردییەکان لە ناوچەکانی جەزیرە (قامشلی) و چیای (عفرین) گیراون و ژمارەیەکی زۆر تائێستا هەر لە بەندیخانەن و شالاوەکە تا ئامادەکردنی ئەو بەیانە درێژەی هەیە.»

لە بانگەوازەکەدا هاتووە کە ۷۰ کەس ئازادکراون و لەوانە ۴۷ کەسیان، دوای ئەشکەنجەی درندانە، ژیانیان لە مەترسی دایە و بۆیش ئێستا لە نەخۆشخانەی قامشلی تیمار دەکرین و لەوانە (مەحموود ئیسماعیل عەمو) ئەندامی کۆمیتەی ناوەندی حیزبی دیموکراتی یەکگرتووی کورد لە سوریادا. هەروەها رژێم بەرێز (فوئاد عەلیکۆ)ی ئەندامی پەرلەمانی سوریای گرتبوو، بەلام لەگەل ئەو (۷۰) کەسە ئازاد کراوە.

لیژنەی مافی مرۆڤی کورد بانگهێشتنی هەموو رێکخراوە کوردییەکان و مرۆڤدۆستەکانی جیهانی دەکا کە ئەم تاوانەی حکومەتی سوریا تاوانبار بکەن و داوای ئازادی گیراوەکان بکەن و لێکۆلینەوەیەک لەسەر جنایەتەکانی کاربەدەستانی سوریا وەک: گرتن و ئەشکەنجە و پێشێلکردنی بچوکترین مافی مرۆڤی کورد بکەن.

## کتێبی:

## سەرەتای شۆرشی نوێی ساڵی ۱۹۷٦ چۆن دەستپێکرد

لە نووسینی: مەلا شێمحەممەدی حاجی ئۆمەرانی.
پێداچوونەوە و پێشەکی: مومتاز حەیدەری. هەولێر ۱۹۹۲.



سەرەتای شۆرشی نوێی ساڵی ۱۹۷٦
چۆن دەستی پێ کرد؟!
نووسینی
مەلاشێم حەمەدی حاجی ئۆمەرانی
پێداچوونەوە و دووبارە دارشتنەوەی
مومتاز حەیدەری

نووسەر یەکێک بووە لە پێشمەرگەکانی شۆرشی ئەیلوول و شۆرشی نوێدا. مومتاز حەیدەری لە پێشەکییە کورتەکەیدا دەنووسێ: «ئەم نامیلکەیەی بەردەست، هەرچەندە بە لاپەرە کەمە و قەوارە بچووکە بەلام سەدان جار مەزنتر و نیشانشکێنترە لە هەندێ بەرهەم و نووسینی مێژوویی تر......»

نووسەر لەو چەند لاپەرەیەدا، هەولیداوە تیشک بخاتە سەرچۆنیەتی ئامادەکردن و سەرهەلدانی خەباتی چەکداری دوای هەرەسی ۱۹۷۵ و دەستنیشانکردنی ئەو مرۆڤانەی بەشداری ئەم جموجۆلەیان کردووە و یەکەم مەفرەزەی پێشمەرگە یان لە ساڵی ۱۹۷٦دا دروستکردووە و هەروەها ناوی یەکەمی شەهیدی شۆرشی نوێی تێدا تۆمارکراوە.

بێگومان ئەگەر هەر تێکۆشەرێکی خەباتی رزگاریخوازی کورد، بیرەوەری خۆی راستگۆیانە تۆمار بکات، کەرەسەیەکی دەوڵەمەند کۆدەکرێتەوە بۆ نووسینی مێژووی پرشکۆداری و قوربانی سی ساڵەی شۆرشی کوردستانی باشوور، هەروەها تیشک دەخرێتە سەر زۆر لاپەرەی شاردراوەی ئەم خەباتە، ناوی زۆر سەربازی وونیش شوێنی شایستەی خۆی لە مێژووی گەلەکەیدا پێدەدرێ و راستیش وون نابێت.

www.arsivakurdi.org

## چەند خونچە شیعرێک......

ئەنوەر ڕەشید عەولا



## ١- غوربەت

هاوڕێم......
سەفەرم لە پرچی دایکم سپی ترە
درەختی ئاوارەیشم
لە قەڵەمی یاداشتەکانم پیرترە!
درەختم زڕەو؛
سەفەرم درێژ
درێژ لە غەمی دنیایەکی بێ دەستنوێژ.

* * *

## ٢- ونبون!

ئاسمان...... سایەی عەشقی تۆیە؛
وا بە سەرسەرمەوە.
نە ئەوەتا دابباری و سەوزم بکەی
نە ئەوەتا... بە کاکێشانی چاوەکانت
ڕێی دەرچونم نیشان بدەی

١٩٩١/٩/٢.



## راستی

چرۆ حەسەن



لە تارمایی چاوەکانی
شەوە زەنگا
لە نێوان بە خێرهاتن و
ماڵ ئاوایی و
دڵی تەنگا
کە باسی دڵتم بۆ ئەکەی
پێشم ئەڵێی: خۆشم ئەوێی
ئەڵقەی دەزگیرانم هەروەک
بەردی ئەڵحەد
لە ئاوێنەی چاوەکانتا
وونی ئەکەی
گیانە گەر بڵێم لای ئێمە
دڵ بۆ یەکێک لێ ئەدات و
دەستیش بە یەکێ ئەبەخشرێ
بروا ئەکەی !!
گەر بڵێم کاتێ خۆر هەڵدێ
بۆ هیوای ئەم خەڵکە هەڵدێ
بروا ئەکەی ...... !!
ئیتر نازانم چی بڵێم ...... !
گەر بڵێم من ......
ئەی کورە چاو پاییزیەکەی
نەک هەر ئێستا
دووسەد ساڵی تریش بروا
هەر تۆم خۆش ئەوێ بە تەنها
بروا ئەکەی ...... !!

١٩٩٢/١١/٢

www.arsivakurdi.org

شیعر

رزگار عەبدوڵلا

## سوار



بێ دەنگ دەڕوا و لەبەر «با» و شەپۆلی سەرپشتی ئاوەکە
گوێی لە دەنگی هەنگاوەکانی خۆی نابێ.
بەدەم ڕێوە، بە دوو پەنجە چاوی دەسڕێ و
درەختێک و دوو درەخت و میلیۆنێک گەڵا جێدێڵێ.
ئاونگی گەڵاکان تەڕی دەکەن و جارجارەش لەسەر پەڵە تیشکدا
نیوە سێبەرێکی خۆی دەبینێ و زوو ون‌دەبێ
ئاوشان ئەدا بە درەختێک و پشوو دەدا،
گوێی لە حیلەی ئەسپێک دەبێ: گوێ هەڵدەخا
سەیری دەوروبەری دەکا و هیچ نابینێ
دیسان «با» و شەپۆلی سەرپشتی ئاوەکە
دەنگی هەنگاوەکانی کپ دەکەن.
بە دوو پەنجە چاوی دەسڕێ و
لە دوورەوە دوو ئەسپەکێوی دەبینێ.
بە پاڵتۆکەی ئەسپی شیرەنگی زین دەکا و
لە داستانەکە ون‌دەبێ.

## وتت: تەنیایی .....



ژیانیش وەک تۆ بێ سەرەتا و کۆتایی یە
هەندێجار سپییە وەک شیر و
هەندێجاریش ڕەشە وەک ئەشکی تەنیایی
تەنیایی سەر شەقامەکان
تەنیایی چاخانە و پیاسەی سەر پردەکان
خۆش نییە بە تەنیا لەسەر پشتی جەماوەری پردەکان
لە نهێنییەکانی ئاو، ماسیگرەکان و
تیشکی ئاوێزە بووی خۆر ڕابمێنم.
جارێکیان وتت: تەنیایی دواوێستگەی ژیانە.
کەچی تەنیا و بێکەس لە پشت حەقیقەت خۆت حەشار داوە و
بەم چاوە پڕ لە ئەشکانەشم، نیوچەوانتم هەر لێدیارە.
بۆلات دێم و با چیتر شەو و ڕۆژ بە ڕەگەکانیاندا سەر گوزەر نەکەن.
وەرە؛ باشەوانە لە پەنجەرەی ژوورە نامۆکەمدا سەیری ئەستێرە بکەین و
لە کازیوەش، دەست بە سێوی باڵاتدا بێنم.
وەرە با زەمەن زین کەین و لە دیرۆکەوە بەرە و دوارۆژ سەفەر بکەین.
- باوەڕ بکە ئەم سەردەمەش چەند چرکەیەکی زەمەنە.

١٩٩٢

بن... هەر هەموو مێینەکانیش دەبێ زین بن، مانگێکە دەنگم نووسا ئەوەندە هاوارکەم... تا ئێستا سێ چوار کاستم گۆڕیوە، پێتان دەڵێم دەوری «بەکر مەرگەوەڕ» شانی وا... باڵی وا، کەچی کەستان ئامادە نییە دەوری مەرگەوەڕ ببینێ، من مەبەستم ئێوە نییە... بەڵام توو شەرەفتان لە ژیانی خۆماندا کامەمان بەکر مەرگەوەڕ نین...؟ کامەمان دڕکی «مەم و زین» نین...؟ ها... ئاخر کەی راستە کەس دەوری شەڕخوازێک نەبینێ...؟ پاشان ئێوە هونەرمەندن... کە دەوری جوان و ناشرین لە ژیاندا هەبن... خۆ دەبێ لە هونەردا ڕەنگ بداتەوە...»

دەرهێنەر لە حەژمەتا هەردوو لێوی لەرزین، بە بەری دەست ئارەقەی تەوێڵی سڕییەوە، بە دوو چاوی خوێن تێزاوەوە روانییە ئەو هەموو مەم و زین-ە، لەوە دەچوو بیەوێ بگری. دواجار هەڵیدایە: «خوشکینە... هەر کچێک دەوری زین ببینێ دەبێ مانگێک زووتر واز لە ئارایشت بێنێ... زویر مەبن، من دەموچاوێکی پاکم دەوێ... پاک وەک سروشت... نەک هەر دەموچاو... بۆ مەم و زین دوو ڕۆحی پاکم گەرەکە...!».

کچەکان نقەیان نەکرد، دووانیان سەریان لە بن گوێی یەکدی ناو چرپاندیان، ئاوڕێکی لە کوڕەکان دایەوە، بینی بە شەهوەتەوە، دزەنیگا دەبڕنە کچەکان، لەتاو ئەو هەموو پووز و لاق و لەتەرە شلک و نەرمەی زینەکان؛ نیوەناچڵ لە قسەکانی دەرهێنەر حاڵی دەبوون؛ هەر هەموویان بە ترس و شەرم و شەهوەتەوە، لەو درزە تاریکەی نێو هەردوو ئەژنۆی بەحاڵ کراوەی زینەکان رادەمان، درزێک کە خەیاڵی هونەرمەندانەی هەموو مەمەکانی فڕاندبوو.

دەرهێنەر کورسییەکەی بەلای کچەکاندا خزاند و تێهەڵچووە: «پاشان کچینە... گرنگ ئەوەیە هەر هەمووتان لەگەڵ زین دەردەکەون، هەر هەمووتان دەکەم بە کەنیزەک و بەربووک و دەستەخوشکی زین، بە وێنەگرەکان دەڵێم... رایان دەسپێرم، کە بە قەد زین دەرکەون، دڵنیاتان دەکەم ئێوەش وەکو زین بە «کلۆز» دەریکەم... ئەم سمێڵانە هی پیاو نەبن، گەر درۆتان لەگەڵ بکەم.».

هەموو زینەکان لێویان لێ هەڵقورتاند، ئەو لێوانەی غەرقی سووراوێکی خەست ببوون، چاویان بڕییە یەکدی، هیچیان ئامادەنین ببنە کەنیزەک و دەستەخوشک و کارەکەری زین، هەریەکە و لە دڵی خۆیدا وتی: «بۆ چی بووە... قاتییە...؟ هەموو کوردمەم و زینێکی هەیە.. یان نایکەم یان دەبێ زین بم...!».

دەرهێنەری حەپەساو نائومێدانە پرسی: «ها... خوشکینە چیتان وت...؟».

یەکێک لە زینەکان وەڵامی نەدایەوە.

ئاوڕێکی لە مەمەکان دایەوە و کورسییەکەی بەلای ئەواندا خزاند:

«برادەرینە... ئێوە چیتان وت...؟»

لە شەرمی کچەکان زیاتر لێیان چووە پێشەوە و زەردەیەکی ماندوو نیشتە سەر لێوی... دۆستانە چرپاندی... چرپەیەک کە زینەکان لێی حاڵی نەبن.

«دەی هەر یەکە و دەستی دە زین-تان بڕیوە... رێککەون لەوە پتر هیلاکم مەکەن...»

هەموو مەمەکانیش بێدەنگ، وەک بڵێی دەرهێنەر لەگەڵ خۆیدا لە مۆنۆلۆگدا بووبێ... دووانیان هاوئیقاع بنێشتیان دەجوویی، یەکێ گەمەی بە ملوانکەکەی بەرملی دەکرد، دووانیان تەزبێحیان بادەدا، یەکێ تۆزی دەرلنگی پانتۆڵەکەی دەتەکاند، دووانی دیکەش ئەمجارەیان لە درزە تاریکەکەی نێوان هەردوو ئەژنۆوە نیگایان گواستبۆوە سەر تەنگە دۆڵی بەرتەسکی نێوان هەردوو مەمکی یەکێ لە زینەکان، کە بێ ئاگا لە خۆی، یان بە ئەنقەست، یان لەتاو گەرما قۆپچەی کراسە تەنکەکەی کرابۆوە، دووانیشیان وا بە قەهرەوە مژیان لە جگەرە دەدا و دووکەڵیان هەڵدەمژی وەک بڵێی دوژمنێک لەناو سییەکانیان بێ و بیانەوێ بیخنکێنن، شەهوەتبازانە... لۆتیانە... نیازپیسانە، سەمایان بە جگەرەکانی لالێویان دەکرد، لە لالێوی چەپەوە بۆ راست، لە راستەوە بۆ چەپ، بە جۆرێک کە یەکێ لە زینەکان تاوتاو تەزوویەکی پڕ لەزەت، بە ترس و شەرمەوە، میروولەی بە هەموو دەمارەکانی دەکرد، گەرم داهات، بە تەواوی لەوە دابڕا شەڕ لەسەر دەوری زین بکا، لەم ئان و ساتەدا هەموو خەونی ئەوەبوو لە خەڵوەتێکدا لەگەڵ ئەو مەمە جگەرەکێشە لە هەموو دونیا دابڕێن... لە هەموو داستانە پڕ لە درۆکانی سەردەمی زوو... چ مەم و زین... چ شیرین و فەرهاد... چ ڕۆمیۆ و ژولیێت... نا... نابێ ئەمە جگەرەکێشان بێ... ئەوەی ئەو مەمە دەیکا شتێکی دیکەیە، شتێکی دیکە، کە زین شەرم دەکا ناوی بەرێ... مەحاڵە بوێرێ...

دەرهێنەر سەرسام و شەکەت، کورسییەکەی خزاندەوە ناوەراست، کەوتەوە نێوان هەردوو ریزی مەم و زینەکان، هەستایەوە سەرپێ و راما... سەری بۆ بنمیچەکە هەڵبڕی، هەناسەیەکی هەڵکێشا... هەناسەی سارد... سەمای بە دەفتەرەکە دەکرد... دەفتەری داستانی مەم و زین، خستییە بنهەنگڵی... بێباکانە... نائومێدانە وەک سەرهەنگێکی بەزیو، لە پاکەتەکە بە دەست و پەنجەیەکی لەرزۆکەوە جگەرەیەکی دەرهێنا و ئاگری دا، ویستی ئاگرەکە لە داستانەکە نزیکخاتەوە... بیسووتێنێ... راما تا ئاگرەکە پەنجەی شایەتمانەی سووتاند و هەڵیدا... مژێکی قووڵی لێدا و دووکەڵەکەی بەباکرد... دوکەڵ مەم و زینەکانی لەبەرچاو لێڵکرد... دواجار شێتانە داستانەکەی هەڵدا و بەر بنمیچەکە کەوت و لەبەردەم ریزی زینەکان کەوتەوە و تەنکە تەپوتۆزێکی وایکرد، هەموو هەستنە سەرپێ و تۆز و خۆڵ لە خۆیان بتەکێنن. یەکێ لەو زینانە جانتاکەی کردە قۆڵی و لێیدا رۆیشت... وادەی ژوانێک حەجمانی لەبەر بڕی بوو... نەک لەگەڵ مەمێک... نەء... بەڵکو لەگەڵ مەرگەوەڕێک دا... زینەکانی دیکە سەرسام بوون، کە یەکێکیان وا ئاسان دەستی لەو دەورە نازدارە... دەوری زین کێشایەوە.

دواجار دەرهێنەر سەیرێکی چەپ و راستی خۆی کرد، وەک بڵێی خۆی دەورببینێ، نیگایەک بۆ ریزی مەمەکان، نیگایەک رووە و ریزی زینەکان... پاشان ماندووانە، وتی:

«برادەرینە... خوشکینە... من بڕیاری خۆم داو تەواو... نیازمە دەست لەم کارە هەڵگرم... لەبەر هیچ نا... تووڕەش نیم... بەڵکو خۆشحاڵم کە دەست لەم ئیشە دەکێشمەوە.».

هەردوو ریزەکە لێی چوونە پێش و بە هەڵقەیەکی داخراو گەمارۆیاندا... بوو بە پنتێکی ناوەڕاستی بازنەیەک، بازنەیەکی نارێک... بازنەی مەم و زینەکان... تێهەڵچووە: «نەء... هیچ قسەم ناوێ... دوابڕیارمە... مادامەکێ هەموو کچەکان زین و هەموو کوڕەکانیش مەم بن... ئیتر چ پێویست بەوە دەکا فیلم دەرکەین و خەڵکی فێری پاکی بکەین... بۆ دەرسی عیشق و خیانەت بە خەڵکی بڵێینەوە...؟ خۆش بە خاڵی کورد و خانی شاعیر، کە ئەو هەموو مەم و زینەی هەیە.. لای ئێوەم خۆش... ماڵئاوا...».

خەرمانانی/ ۱۹۹۱
سلێمانی



www.arsivakurdi.org

چیرۆک

# مەم و زینەکان

نووسینی: شێرزاد حەسەن



هەر هەموو ئەکتەرەکان، بۆ جاری دەیەمین... بە کوڕ و کچەوە، کۆبوونەوە، دوو ریزی بەرامبەر... ریزێکی کوڕە گەنجەکان، کە هەر یەکە و خەونی بەوەوە دەدی ببێ بە «مەم»ی عاشق، ریزێکی کچە جحێڵەکان، کە هەر یەکە و خەونی بەوەوە دەدی ببێ بە «زین»... دڵخوازی مەم. هەر هەموویان دەست لەسەر دڵ... دەترسان، بێ‌ئۆقرە چاوەڕێی دوا بڕیاری دەرهێنەر بوون. دەرهێنەریش کزومات لە سەرپەڕ رۆنیشتووە و کەوتۆتە نێوان مەم و زینەکان، پەست و ماندوو دیقەتیان دەدا... نە کوڕەکان رۆحی مەم-ن و نە کچەکانیش زین، بە تیلەی چاو نێرینەکان مۆڕە لە یەکدی دەکەن، دەرهێنەر سامی زۆرە... هەریەک لەو مێینانە رووی خۆی لە ژێر تونێخێکی ئەستووری سووراو و سپیاو خنکاندبوو... بەو ئومێدەی لە ژین شۆختر خۆ بنوێنن، هەموو دەورەکان دابەشکراون، هیچ نەماوەتەوە... شوێنەکان دەستنیشانکراون، جل و بەرگ ساز و ئامادە، مۆسیقاژەن، تەیار و لەسەر پێیە، ماکیر، پسپۆری دەنگ، دوو کامێرای ئۆماتیک، دوو وێنەگری بە سەلیقە، بودجەیەکی پڕ، کۆمبارس... هەر هەموو چاوەڕێی فیکەیەکی دەرهێنەرن، وەلێ دەرهێنەر تیا ماوە، مانگێک پترە مشت و مڕیەتی، هەر هەموو کچەکان شەڕیانە... هەریەکە و خۆی بە شیاوی رۆحی زین دەزانێ، دەرهێنەر بە دزەنیگایەک تێیان راماو لە دڵی خۆیدا وتی: «ئاخر کامەتان توانیوتانە بۆ رۆژێکیش بێ بە پەنجەتووتەی زین بن... نەک رۆحی...؟!»

دواجار هەڵیدایە: «خوشکینە... ئەوە مانگێک پترە من لەسەر ئێوە وەستاوم، ئێوە سێیەمین کاستن، کە دەیگۆڕم؛ داستانەکە بە تەنها یەک زین-ی تیایە و کەچی هەمووتان گەرەکتانە زین بن...!».

هیچیان نقەیان نەکرد... لە ژێرەوە بە مۆنی لە دەرهێنەر رامان.

«چاوەکەم... هەمووتان لە زین نازدار و شۆخترن... بەڵام هیچ نەبێ لە نێو خۆتان رێککەون و زین-ێک هەڵبژێرن...»

بێدەنگ بوون، دووانیان بنێشتی دەجوویی، یەکێکیان گەمەی بە ملوانکەکەی دەکرد، ئەوانی دیکە سەرمەستی چاوچاوانێ بوون.

«پاشان ئەوەی ئێمە نواندنە... من وای دەبینم گەر کچێک بیەوێ ببێ بە زین، گەرەکە لە رێی سۆز و عیشقەوە رۆحی ئەو لەبەرکا...!».

سۆزان خۆی بۆ نەگیراو هەڵیدایە: «مەرج نیە مامۆستا...!».

کچێکی تر قسەکەی ئەمی قۆستەوە: «ئەمەیان سووکایەتییە... یانی چی؟ بە قسەی تۆ بێ دەبێ ئێمە زۆر بێ هەست و سۆز بین».

دەرهێنەر بە ترس و دوودڵییەوە پاشگەزبۆوە: «خوشکینە... مەبەستی من ئەوە نیە... بۆ قسەکەم هەڵدەگێڕنەوە...؟».

سۆزان دەم گەرمانە تێهەڵچۆوە: «هەر یەکێک لە ئێمە نەک دەوری زین-ێک... دەتوانێ دەوری دە زین و شیرین و خەج ببینێ...».

دەرهێنەر بەزی و وتی: «قسەکەتان دروستە... بەڵام گرفتی من ئەوەیە داستانەکەی ئەحمەدی خانی تەنها یەک زین-ی تیایە و بەس...!».

دەرهێنەر تاوێ راما... سەرلێ شێواو، بە دەست ئەو هەموو زینەوە... رووی کردە کوڕەکان و بە قەهرەوە پێی وتن: «برادەرینە... ئێوەش لە کچەکان خەراپترن، هەمووتان مەم-ن ها...؟ یان مەم یا دەورنابینن... خۆش بە حاڵی ئەم سەردەمە، کە هەموو کچەکانی زین و هەموو کوڕەکانیشی مەم-ن... ئیتر کورد چی دەوێ، کە ئەو هەموو عاشقە پاکەی هەبێ...؟!»

کامەران هەستایە سەر پێ و ملوانکەکەی لە قۆڵپی سوراحییەکە گیربوو، زریزەکەی پچڕا... گوێی پێ نەدا و بەدەم بنێشت جووینەوە رووی کردە دەرهێنەر: «کاک موراد، تۆ... راستە دەرهێنەری... بەڵام ئێمەش هونەرمەندین و کەس بۆی نیە پێمان رابوێرێ...»

«براکەم... ئێوە چاک دەزانن دەرهێنەر پادشای پیشەکەی خۆیەتی، تاکە سەربەستییەک کە لەم دونیایەدا هەمبێ ئەوەیە، کە دەورەکان دابەش بکەم...»

«کەواتە بڕیار بدە...»

«تیا ماوم... شار بیست تیپی نواندنی تیایە، هەر تیپە و سی-چل ئەکتەر، گەنج و پیر... هەر هەموو نێرینەکان دەبێ مەم

www.arsivakurdi.org



رووەوە چۆن بیردەکەنەوە؟

دارا: کۆمەڵەی یۆتۆبۆری نیازی هەیە پرۆژەی ئاوەدانکردنەوەی گوندێک لە کوردستان ئامادە بکات. ئەوەی جێگای داخە. ئەو رێکخراوانەی یارمەتی و بەشداری لە ئاوەدانکردنەوەی کوردستان دەکەن، ژمارەیان زۆرە و پێوەندیان لەگەڵ یەکتردا نییە. بۆ نموونە: لە سلێمانی سێ رێکخراوی یارمەتی منداڵان هەیە، بەڵام لە نێوان خۆیاندا پەیوەندیان نییە. ئەگەر فیدراسیۆن ئەو کارە بخاتە سەرشانی خۆی و رێکخراوێکی هاوبەش دامەزرێنێ و هەموو رێکخراوە جیاوازەکان لێک گرێ بدات باشتر دەبێت لەوەی هەر کۆمەڵەیەک پرۆژەیەکی سەربەخۆ بکات.

عەتا: پێشنیارەکەی دارا پەسند دەکەم.

بەربانگ: پەیوەندی ئێوە بە کۆمەڵەکانی شارەکانی دوور هەیە؟

عەتا: کۆمەڵەکەمان ئەندامی هەرێمی چوارە، کە ناوەندکەی لە شاری یۆنشۆپینگە. ئەم ساڵ پەیوەندیمان لە ساڵانی تر باشترە.

بەربانگ: دەستەی نووسەرانی گۆڤارەکەمان لەسەرەتادا چەند گۆرینێکی دەستپێکرد. پەیتا پەیتا جێبەجێیان دەکا. ئایە ئێوە رەوشی بەربانگ بە گشتی و ئەو گۆرانانە چۆن دەبینن؟

عەتا: لە کۆنگرەی رابردوودا باسی باری بەربانگ کرا و پارەیەکی زۆری لێ خەرج دەکرێ. با هەندێکی پارەی بۆ تەرخان بکەن تا بەربانگ باشتربێت.
من لە بەربانگدا بەشی کرمانجی دەخوێنم، چونکە تیپی عارەبی نازانم. بۆ هەڤاڵانی سۆرانیش هەروەهایە، ئایە ناکرێ هەندێ لە نووسینەکانی بەربانگ کە زاراوەی سۆرانییە، بە تیپی لاتینی بنووسرێن. ئەوە کێشەیەکی گەورەیە. بەربانگ بە تەنیا ناتوانێ ئەنجامی بدات، بەڵام هەنگاوی بچووک پێویستە کە لەم بوارەدا گفتوگۆی لەسەر بکرێ.

سەبری: بۆ نووسینەکانی هەردووبەش وەک یەک نین؟

عەتا: نا، یەک نین.

بەربانگ: هەندێ شتی وەک یەک هەیە، بەڵام بەگشتی وەک یەک نییە. بڕیارێکی ئێمە هەیە، ئەو نووسینانەی کە گرنگ بن، دەگۆردرێنە سەر ئەلفبای تر. بنەمای هەردوو بەش لێک نێزیک دەبنەوە. بۆ نموونە: (گۆشەی حقوق، کۆمەڵەکان و رۆژەڤا مانگ... هتد) تائێستا بەم جۆرە هەوڵدان نەکراوە. من نابێژم دەستەی نووسەران لەم بوارەدا سەرکەوتووە، بەڵام هەوڵی بۆ دەدەین.

سەبری: پێشانیش کاری وا دەکرا.

بەربانگ: پێشان وەک پرنسیپ شتی وا نەبوو. لەوانە تووشی نووسینی وا هەر نەهاتبین!

عەتا: ئەگەر نووسینەکانی زاراەی سۆرانی بە تیپی لاتینی بنووسرێ، من دەتوانم نووسینەکانی ئەو بەشە بخوێنمەوە.

بەربانگ: وا دیارە پرۆبلێمی هەرە گەورە، لە جیاوازی زاراوەکاندا نییە، بەڵکو لە شێوەی ئەلفبای نووسینەکان دایە. دەستەی نووسەران هەوڵدەدا هەندێ گۆران بکا و نیشانەش لەبەرچاوە. ئایە ئێوە لەم رووەوە چۆن بیردەکەنەوە؟

سەبری: کارێکی باشە و پێویستە بەردەوام بن.

بەربانگ: جاران هەر نووسینێک بۆ بەربانگ بهاتبایە بلاودەکرایەوە، بەڵام ئێستا گۆرانێک روویداوە، ئێستا ئێمە لە بلاوکردنەوەدا، پێویستی بەربانگ لەبەرچاو دەگرین. بۆ نموونە: رۆژەڤی ماهی، گۆشەی حقوق، دیرۆک و بەڵگە، زمان، کۆمەڵەکان...... هتد. ئێستا ئێمە پێویستی بەربانگ دەزانین.

عیسا: وەک دەردەکەوێ بەربانگ رێگایەکی راستی گرتۆتەبەر.

عەتا: لە بارەی هونەرییەوە هەندێ شت کە پێویستە ئەنجامدەدرێ. ئەم گۆرانانە پیوزەتیڤە.

عیسا: لەبەر ئەوەی بەربانگ ئۆرگانی فیدراسیۆنە، دەبێ کارەکە بە رێکوپێکی بڕوا.

عەتا: پێویستە بەربانگ لەهەر کۆمەڵەیەکدا، پەیامنێری هەبێ. چونکە کاری بەربانگ ئاسانتر دەکا.

بەربانگ: دەستەی نووسەران بۆ ئەم چاوپێکەوتنە سوپاستان دەکات.



www.alsivakurdi.org

سەبری: وەک کاک عەتا گوتی لە یۆتۆبۆری بێگانە زۆرن و گروپە چەپەکان بەهێزن، هەروەها یۆتۆبۆری شارێکی پیشەسازییە. بۆیش کرێکاری زۆرە و زۆربەی ئەوانیش دژی (راسیزم- نەژادپەرست)ن.. دژایەتی بێگانە هەیە، بەڵام ئەوەندە بەرچاونییە. واتە چالاکی نەژادپەرستەکان بەم جۆرە نییە کە هەرەشە لە بێگانە بکات.

عیسا: لەگەڵ ئەوەشدا هەندێ شت روویدا، بۆ نموونە: ۲-۳ جار ئۆردوگای پەنابەران بۆمبای لێتەقیندراوەتەوە. مرۆڤ ناتوانێ بێژێ کە پریشکی دژایەتی بێگانە نەگەیشتۆتە یۆتۆبۆری.

عەتا وەک دەزانن، نەژادپەرستی لە تەواوی ئەوروپا سەریهەڵداوە. یۆتۆبۆری دووەمین شاری گەورەی سوێدە. کاتێ کە مرۆڤ تەماشا دەکا، زۆر لە شار و شارۆچکەکانی سوێد سەر ئەژماری .۱-۱۵ هەزارە، ۹-.۱ ئۆردوگای پەنابەران بۆمباران کراون (بۆمبای لێتەقاندراوەتەوە)، بەڵام ئەو ژمارەیە لە یۆتۆبۆری هەندە نییە. بۆ نموونە لەیەکی گوڵاندا، خۆپیشاندان کرا کە ئێمەش وەک کۆمەڵە بەشداریمان تێداکرد، بەڵام نەژادپەرستەکان نەک تەنیا لە یۆتۆبۆری، بە بەڵکو هاوادارەکانیان لە شوێنی تریش هاتبوونە یۆتۆبۆری بۆ دژایەتی خۆپیشانەکە، بەڵام ژمارەیان دیسان کەم بوو.

عیسا: من بەشداری خۆپیشدانی یەکی گوڵانم کردبوو، زۆربەی نەژادپەرستانی کە دژی ئێمە دەرکەوتبوون، لە دانیشتوانی یۆتۆبۆری نەبوون.

دارا: کە مانگمان گرت، یارمەتیمان زۆر دەدرا. کاتی خۆی ۷۹ کۆمەڵە و گروپ لە Träff Punkt لە دژی نەژادپەرستان کۆبوونەوە. کۆمەڵەی ئێمە و چوار کۆمەڵەی سوێدی خۆپیشاندانێکی رێکخست، نزیکەی .../.۱ هەزار کەس بەشداری تێدا کرد.

عەتا: دەمەوێ هەندێ شت دەربارەی پێوەندی ئێمە و سوێدییەکان باس بکەم، کە رووداوێک لە کوردستان روودەدا و ئێمە بە هەندێ چالاکی هەڵدەستین، دانیشتوانی ئەم شارە سەردانمان دەکەن و پشتگیری خۆیان بەم جۆرە نیشان دەدەن. پەیوەندی ئێمە لەگەڵ کۆمیتەی سوێدی بۆ مافی مرۆڤی کورد زۆر باشە. بە راستی ئەوانە مرۆڤی دڵسۆزن بۆ کوردان. کاتێ کۆرەوەکەی باشووری کوردستان روویدا، زۆر سوێدی دەیانپرسی و دەیانویست بزانن بە چ جۆرێک دەتوانن یارمەتی کورد بدەن.

بەربانگ: دەتوانن هەندێ لە چالاکییەکانی خۆتان باس بکەن؟

مێران: ساڵی رابردوو هەندێ چالاکی کراوە، وەک تیپی شانۆ، تیپی مۆسیقا و هەڵپەرکێ، بەڵام لەبەر رووداوەکانی باشووری کوردستان، چالاکیان بە شێوەیەکی تر گرتە خۆ، ئەم ساڵ باشترە. بۆ نموونە، تیپی شانۆگەری، سێ شانۆگەری پێشکەش کرد و تیپی مۆسیقا و هەڵپەرکێش بەشداری زۆر ئاهەنگیان کردووە.

عەتا: ئەوە راستە، بەڵام کۆرسی زمانی کوردیشمان کردۆتەوە (سۆرانی- کرمانجی). لە کۆرس فێربوونی سۆرانیدا .۱-۱۲ کەس بەشداریان تێدا کرد، ئێمە ئێستا دەتوانین بە سۆرانی بخوێنین و بنووسین. گروپی فۆلکلۆری بەشداری کردووە، لە ئەو فێستڤالانەی لە شارەکەماندا کراوە.

بەربانگ: پلانی ساڵی داهاتووتان چییە؟

دارا: من دەمەوێ کورسی زمانی کوردی بۆ سوێدی لە زانکۆی یۆتۆبۆریدا بکەمەوە.

عەتا: دەمانەوێ درێژە بە سیمینارەکانمان بدەین. هەندێ گۆران لە لۆکاڵ (بارەگا) دا بکەین. هەوڵدەدەین پێداویستەکانی کۆمەڵەی کوردەواری یۆتۆبۆری جێبەجێ بکەین. هەروەها رێنوێنی هەندێ کورد بۆ هەندێ کار لە پرۆگرامی ئێمە دایە.

بەربانگ: ئایە رازین لە پێوەندیتان لەگەڵ فیدراسیۆن؟ داخواز و رەخنەتان چییە؟

عەتا: ئەم ساڵە پەیوەندیمان لە ساڵانی تر باشترە. فیدراسیۆن ئەم ساڵ چاکتر ئاگاداری بۆ کۆمەڵەکان رەوانە دەکا. ئەگەر ئەو بلاڤۆکانەی بە کوردی دەری دەکا بە سوێدیش بلاوی بکاتەوە، چاکتر دەبێ، چونکە پێویست نابێ هەر کۆمەڵەیەک ئەو بلاڤۆکانە وەرگێڕێتە سەر زمانی سوێدی لە لای خۆیەوە.

کۆبوونەوە گرنگەکان هەر کات لە ستۆکهۆڵم دەکرێن، پێویستە فیدراسیۆن هەوڵبدات کە هەندێ کۆبوونەوەی گرنگ لە شارەکانی تریش ساز بکات. فیدراسیۆن دەتوانێ لە هەموو شارەکان ئاهەنگی نەورۆز بکات. یارمەتی و هاریکاری کۆمەڵەی بێگانەکان بەرەو کەمی دەروا، بۆیە پێویستە کورد پتر پشت بە ئیمکانیاتی خۆیان ببستنەوە.

دارا: کە فیدراسیۆن ئاهەنگی نەورۆز لە ستۆکهۆڵم دەکا، پێویستە ئاگداری کۆمەڵەکان بکات کە بە چ شێوەیەک دەتوانن هاوکاری بکەن. نەک تەنیا هونەرمەند و مۆسیقیژەن دەوروپشتی ستۆکهۆڵم بانگهێشت بکەن.

بەربانگ: لە باشووری کوردستان هەڵبژاردنی گشتی روویدا و پاشان ئەنجوومەن دامەزرا و حکومەتی هەرێمی کوردستان راگەیاندرا. ئایە دەتوانن بۆچوونی خۆتان دەربارەی ئەم رووداوە مێژووییە بۆ خوێنەرانی بەربانگ باس بکەن.

عیسا: کوردی باشووری وڵاتی ئێمە، ئیدارەی خۆیان خستۆتە دەست خۆیان. ئەوە دەرفەتێکی دیرۆکییە. هەستی نەتەوەیی ئێمەی بەرزکردۆتەوە.

عەتا: هەستی مرۆڤ تێکەڵ بوو، ئێمە بەو رووداوە مێژووییە دڵخۆشین. هەندێ کۆسپ هەیە، هیوادارین گوڵی ئازادی لە وڵاتی ئێمەدا بخەملێ و ئەو کۆسپانە لە ماوەیەکی کورتدا وەلابدرێ.

بەربانگ: لەدەرەوەی وڵات بۆ ئاوەدانکردنەوەی باشووری کوردستان زۆر پرۆژە ئامادە دەکرێ، لەوانەیە ئێوە لە لاپەرەکانی بەربانگدا دەربارەی پرۆژەی کۆمەڵەی (ئیسکلستوونا)تان خوێندۆتەوە. ئایە لەم



www.arsivakurdi.org

دانیشتووانی یۆتۆبۆری بێگانەن. واتە هەر ٤-٥ کەس، یەکێکیان بێگانەیە. لە نێو بێگانەکان فینلەندییەکان گەورەترین گروپن و دوای ئەوان ئەمریکای لاتین دێن. کورد نزیکەی ..١٥- ...٢ کەسن.

بەربانگ: ئایە کورد کەی بۆ یەکەم جار هاتونەتە یۆتۆبۆری؟

دارا: لە ١٩٧٨- ١٩٧٩دا کورد لێرە هەن، لە ١٩٧٥-١٩٧٦ کوردێکی زۆر روویان لە سوێد کرد، لەسەرەتادا لە ئۆپسالا زۆر بوون، پاشان بەرەو خواروو و ستۆکهۆلم بڵاوبوونەتەوە.

بەربانگ: مەبەستی من شاری یۆتۆبۆرییە؟

دارا: من خەڵک دەناسم لە ١٩٧٨ ەوە لە یۆتۆبۆری دەژین.

عەتا: کورد بۆ جاری یەکەم لە ساڵی ١٩٧٣-١٩٧٤ هاتوونەتە یۆتۆبۆری، بەڵام دوای ئەم ساڵانە دوای .١٩٨ ژمارەیان زۆرتر بووە.

بەربانگ: کۆمەڵەکەی ئێوە کەی دامەزراوە؟

عەتا: لەسەرەتای .١٩٨ دا کۆمەڵەیەک هەبوو، پاشان بووە دوو کۆمەڵە. ئەو برادەرانەی لە پارچەکانی تر، کۆمەڵەیان درووست دەکرد، دوای ساڵی ١٩٨٤ هەردوو کۆمەڵە، یەکیان گرتەوە. لەو کاتەوە ئەندامی فیدراسیۆنین هەڤالانی کۆنتر ئەو مەسەلەیە باشتر دەزانن.

عیسا: بە کورتی چیرۆکی دامەزراندنی کۆمەڵەکان وەک هەڤاڵ عەتا گوتی، وایە. بێگومان یەکگرتنی هەردوو کۆمەڵە خەباتی دیموکراتی کۆمەڵەی کوردەواری لە یوتۆبۆری بەرەو پێش برد. ئێستا لەسەر ئەم بناخەیە کار درێژەی هەیە.

عەتا: دەبێ شتێکی تریش بگوترێ کە ئەمڕۆ لە یۆتۆبۆری چەند کۆمەڵەی کوردان هەیە، بەڵام ئەو کۆمەڵەی کە پێوەندی بە فیدراسیۆنەوە هەیە و کوردی هەر چوار پارچەی لە خۆدا کۆکردۆتەوە، کۆمەڵەی ئێمەیە. کۆمەڵەکەی ئێمە لە کۆمەڵەکانی کوردەکاندا بەهێزترین کۆمەڵەیە.

دارا: تەنیا کۆمەڵەکەی ئێمە، کۆمەڵەیەکی کولتوورییە. چونکە کۆمەڵەی ئێرانییەکان کە هەندێکیان ئێرانین و هەندێکیان کوردن. پەیوەندی بە Iranska Flykting R[det هەیە. تەنیا بۆ پەنابەرانی ئێرانییە.

بەربانگ: ئایە پەیوەندی ئێوە بە کوردەکانی دانیشتوانی یوتۆبۆری چۆنە؟ ڕێژەی ئەندامێتی ئەوان چۆنە لە کۆمەڵەکاندا؟

عەتا: وەک پێشتر گوتمان ژمارەی کورد ..١٥-...٢ کەسە لە یۆتۆبۆری، ژمارەی ئەندامی کۆمەڵەی ئێمە، ..٢ کەسە، بەڵام ئەوانەی دێنە کۆمەڵە .٧-.٨ کەس زێتر نییە وەک دەردەکەوێ زۆربەی کوردەکانی ئێرە ئەندامی کۆمەڵەی یۆتۆبۆری نین. هۆیەکانیشی زۆرە، هەندێ کورد لەبەر جیاوازی بیروباوەری خۆیان لە کۆمەڵەی تورکەکاندا کار دەکەن، هەندێکی تر لە کۆمەڵەی عارەبان و هەندێکی تریش لە هی فارسەکاندا کار دەکەن. ئەو بارە ئێستاش هەیە بەم جۆرەیە، بەڵام ئەو کوردانەی کە ئەندامی کۆمەڵەی ئێمەش نین، لە کاتێکدا بار و ڕووداوی دژوار لە وڵاتدا ڕوودەدات، چالاکانە بەشداری کۆبوونەوە و خۆپیشاندانەکان دەکەن. ئەوش پێوەندی بە باری کوردستانەوە هەیە.

بەربانگ: دیارە لە بارودۆخی وادا، پێوەندیتان لەگەڵ کوردەکانی تردا هەیە. لەم بوارەدا هەوڵدانێکی بەرچاو لەلایەن ئێوەوە چییە؟

عەتا: لە ئاهەنگ و خۆپیشاندان و کۆبوونەوەکاندا، هەوڵدەدەین پێوەندی بەو کەسانە بکەین. ئەو پەیوەندییانە ئەنجامی هەیە. ژمارەی ئەو کەسانەی هاتووچۆی کۆمەڵە دەکەن .٧-.٨ کەسە، بەڵام لە ئاهەنگەکاندا ..٤-..٥ کەس ئامادە دەبن.

بەربانگ: ئەو کوردانەی لە یۆتۆبۆری دەژین، هی کام پارچەی وڵاتەکەمانن؟

میران: جاران کوردی تورکیا زۆرتر بوون، بەڵام وابزانم ئێستا کوردی عێراق و کوردی ئێرانێ لەوەی کوردی بەشەکانی تر زۆرترن.

عەتا: ئەو کوردانەی لێرەدا دەژین، پتر لە باشوور و ڕۆژهەڵاتی کوردستانەوە هاتوون، بەڵام پەیوەندی ئێمە بە کوردەکانی ڕۆژهەڵات بە هێز نییە. ئەوە کەم و کوریەکی گەورەیە. ئێمە نازانین بە چ جۆرێک بەیەک بگرین و پەیوەندیان لەگەڵیان بەهێزتر بکەین.

سەبری: کوردەکانی پارچەی ڕۆژهەڵات، پێشان دەهاتنە کۆمەڵە، بەڵام لەم دواییانەدا خۆیان کێشاوەتەوە، هۆیەکەشی دیار نییە، بۆ وازیان لە کۆمەڵە هێناوە.

بەربانگ: پەیوەندیتان لەگەڵ ئەو دەزگایانەی کە پێوەندییان بە بێگانەکان هەیە، چۆنە؟

عەتا: پێوەندیمان زۆر باشە. ئێمە بەشداری زۆر کۆرس دەکەین کە لەلایەن ئەوانەوە ئامادە دەکرێت. لە بەرەوپێشچوونی کارەکانمان و هاوکاریمان زۆر دەکەن. بە کورتی هیچ گازاندە و گلەییمان نییە.

بەربانگ: هەڵوێستی سوێدییەکان لە شاری یۆتۆبۆری بەرانبەر بێگانە چۆنە؟ یان پەیوەندیتتان لەگەڵیان چۆنە؟ بە جۆرێکی تر باری بزووتنەوەی دژایەتی بێگانان چۆنە؟

عەتا: یۆتۆبۆری، شارێکە کە ناوبانگی وەک چەپ دەرکردووە. گروپە چەپەکانی سوێد لە یۆتۆبۆری بە هێزن. چەپەکان دەوری گەورەیان لە دیرۆکی یۆتۆبۆریدا گێراوە. بەر لە چەند ساڵ ڤالۆن هاتوونەتە ئێرە و پاشانیش کرێکارانی ئیتالیایی، بێگانەکان هاتوونەتە ئێرە و ڕۆڵێکی مەزنیان لە ئاوەدانکردنەوەی ئەم شارە بینیوە. بۆیش ئەگەر لە زۆر شاری سوێد دژایەتی بێگانە بەرەو زیندەبوونە، بەڵام لە یۆتۆبۆریدا ئەوە بەرچاو ناکەوێت.



www.arsivakurdi.org

# چاوپێکەوتنێک لەگەڵ (کۆمەڵەی یۆتۆبۆری)

## ئامادەکردنی:مستەفا ئایدۆگان



بەربانگ: وەک دەزانرێ گۆڤاری بەربانگ لە ژمارەی (٨١) لەگەڵ کۆمەڵەی ئیسکیلستونا و لە ژمارەی (٨٢-٨٣)دا لەگەڵ کۆمەڵەی ژنان چاوپێکەوتنی لەگەڵ نوێنەرانی ئەو دوو کۆمەڵەیەدا پێکهێنا دەربارەی چالاکیەکانیان، ئایا ئەو بڕیارەی دەستەی نووسەرانی بەربانگ چۆن دەبینن؟

عەتا: ئەو بڕیارە گەلەک گرنگە، چونکە بۆشایەک لە لاپەرەکانی بەربانگدا دەربارەی چالاکی کۆمەڵەکان بەرچاو دەکەوێ. ئەو بڕیارە رێگا خۆش دەکا بۆ پێناسینی چالاکی کۆمەڵەکانی ئەندام لە سوێد و ئەو ئەرکانەی ئەنجام دەدرێ و لە وانەیە کار و چالاکی کۆمەلەیەک ببێتە نموونە بۆ کۆمەڵەکانی تر.

بەربانگ: ئایە مرۆڤ بۆ چاکترکردنی کاری «بەربانگ» چ بکە باشە؟

سەبری: کارێکی باشە وەک سەرەتا هەنگاوێکی چاکە لە داهاتوودا دەکرێ باشتر بکرێت.

بەربانگ: لە پەیوەندی نێوان کۆمەڵەکان و بەربانگدا مەسەلەی گرنگ ئەوەیە، لە لاپەرەی بەربانگدا، جێگا پتر بدرێتە کۆمەڵەکان، لەم بوارەدا چ دەتوانین بکەین؟ لە چارەسەرکردنی کێشەی کاری دیموکراتیدا لە سوێد، بەربانگ دەتوانێ چ رۆلێک ببینێ؟ ئایا ئێوە لەم رووەوە چۆن بیردەکەنەوە و پێشنیارتان چییە؟

عەتا: فیدراسیۆن یەکێتیی کۆمەڵەکانە و بەربانگ-یش ئۆرگانی فیدراسیۆنە، واتە ئۆرگانی گشتی کۆمەڵەکانە، بەلاّم تا ئێستا بەربانگ بەم جۆرە نەبووە... لە هەموو شارەکانی سوێددا کورد بەپێی توانای خۆیان کار و خەبات دەکەن، بەلاّم بەرامبەر ئەو چالاکی و کارانە بەربانگ هیچ هەلوێستێکی دیاری نەبووە... بەربانگ هەروەک وابێ لە ولاّتێکی تر دەردەچێ، واخۆی نیشان دەدات پشت لەو کار و خەباتانە دەکات. هیواداریین بەربانگ دوای ئەو بڕیارە دەرگای خۆی لە کۆمەڵەکان بخاتە سەرپشت. پێویستە بەربانگ سنوور بشکێنێ و لە سنووری ستۆکهۆلم دەربچێت. ببێتە دەنگی ڤیستڤاڵ و چالاکی کۆمەڵەکانی کورد لە سوێد.

عیسا: بە کورتی بەربانگ پێویستە ببێتە پلاتفۆرمی هەموو کۆمەڵە کوردییەکان و خەباتی دیموکراتیک لە سوێد.

دارا: فیدراسیۆن دەتوانێ کۆمەڵەکان زێتر لەیەک نزیک بکاتەوە. بۆ نموونە ئێستا من لە کۆمەڵە دام و چەند کەسانێکی بە توانا لە شاری یۆتۆبۆریدا دەژین و دەیانناسین و دەزانین چ کاری تریشیان پێدەکرێ، ئەو کەسانە کاری هونەری دەکەن و دەتوانین بە فیدراسۆنیان بناسێنین و فیدراسیۆنیش بە کۆمەڵەکانی تریان بناسێنن.. لەوانەیە من لێرە نەزانم لە سوندسڤاڵ کێ هەیە و چ توانایەک هەیە... فیدراسیۆن دەتوانێ لێکمان نزیک بکاتەوە.

عەتا: کاک دارا خاڵێکی گرنگی خستە بەرچاو، ئەگەر بتوانن لاپەرە بۆ کۆمەڵەکان تەرخان بکات، بەمەش دەتوانی پتر کار بکاتە سەر کوردەکانی یۆتۆبۆری. ئەگەر کوردەکان بزانن ئەو شتانە لە بەربانگدا بلاّودەکرێتەوە، پێوەندی بەوانەوە هەیە، کاری ئێمەش ئاسانتر دەبێ و ژمارەی ئەندامەکانیشمان زۆرتر دەبێ. بە هێزبوونی کۆمەڵەی یۆتۆبۆری، بەهێزبوونی فیدراسیۆنە. ئەو کارەش هەموو کۆمەڵەکان دەگرێتەوە.

بەربانگ: لە شارەکەی ئێوەدا چەند بێگانە هەیە؟ گەورەترین گرۆهی چ ولاّتێکن؟

عەتا: بە گوێرەی ستاتیستیکی سوێدیەکان ٢٠-٢٥٪

www.arsivakurd.org

٣- کۆنگرە پشتگیری تەواو لە بەرەی کوردستانی دەکات و ڕێز لە ڕۆڵە مێژووییەکەی خەباتی گەلەکەمان دەنێت و هەوڵی پتەوکردنی و پاراستنی هێزە سیاسییەکانی ناو بەرەی کوردستانی دەدات بۆ چەسپاندن و گەشەپێدانی دەستەکەوتە نەتەوایەتییەکانمان.

٤- پشتگیریکردنی خەباتی ڕەوای گەلی کوردستان لە گشت پارچەکانی کوردستاندا.

٥- بڕیار درا ڕۆژی ٦ی تشرینی یەکەم واتا ڕۆژی بەستنی کۆنگرە بکرێتە جەژنی مامۆستا لە هەرێمی کوردستاندا.

٦- داواکردن لە وەزارەتی پەروەردەی هەرێمی کوردستان بۆ بەستنی کۆبوونەوەیەکی فراوان لە مامۆستایانی پسپۆڕ و شارەزا بۆ گۆڕینی بەرنامەی خوێندن و دروستکردنی لیژنەی پێویست بۆ هەموو پلەکانی خوێندن بۆ ئامادەکردنی پرۆگرامی خوێندن بۆ ساڵی ١٩٩٣-١٩٩٤.

٧- ڕێزگرتن لە هەڵوێستی جوامێرانە و پشوو درێژی مامۆستایان بەرامبەر گەمارۆی ئابووری سەپێندراوە بەسەر کۆمەڵانی خەڵکی کوردستاندا.

٨- بەردەوامبوونی مامۆستایان بە گیانێکی دڵسۆزانەوە لە پرۆسەی پەروەردە و فێرکردندا لە پێناو بەرزەکردنەوەی ئاستی خوێندەواری و ڕۆشنبیری لە کوردستاندا.

٩- گەڕانەوەی ئەو مامۆستایانەی کە بە هۆی باری سیاسییەوە لە پیشەی مامۆستایەتی دوورخراونەتەوە یان دەرکراون و ماوەی دەرکردنیان بە خزمەت دابنرێت.

١٠- پشتگیری کردن لە مافی مامۆستایانی شۆڕش و کردنەوەی خوولی پەروەردەیی بۆ ئامادەکردنیان و پاشان دامەزراندنیان بە مامۆستا و حیسابکردنی ماوەی مامۆستایەتیان لە ڕیزی شۆڕشدا.

١١- کردنەوەی خوولی تایبەتی بۆ مامۆستایانی خۆبەخش کە بە گیانێکی لە خۆ بوردووەوە بێ بەرامبەر لە دوای ڕاپەڕینەوە وانەیان وتۆتەوە و دامەزراندنیان بە مامۆستا.

١٢- هەوڵدان بۆ بەرزکردنەوەی ئاستی گوزەرانی مامۆستا بە دابینکردنی پێداویستییەکانی ژیان.

١٣- پێداگرتن لەسەر یارمەتیدانی خێزان و کەسوکاری مامۆستایانی شەهید و ئەنفالکراو.

١٤- پاککردنەوەی دامودەزگاکانی پەروەردە لەو کەسانەی کە زیانیان بە گەلی کوردستان گەیاندووە و هەمیشە ئەلقە لە گوێی ڕژێمی دیکتاتۆری بەعسی فاشی بوون.

١٥- کردنەوەی کۆلێجی هونەرە جوانەکان لە ساڵی ئایندەدا.

١٦- لابردنی ئەو سەرپەرشتیار و بە ڕێوەبەر و دیاریدە دەرانەی کە لە خزمەتی ڕژێمی فاشیدا بوون و گەڕاندنەوە و دانانی کەسانی لێهاتوو و نیشتمانپەروەر و خاوەن هەڵوێست لە شوێنیاندا.

١٧- پتەوکردنی پێوەندی یەکێتیی مامۆستایان لەگەڵ ڕێکخراوە پیشەیی و جەماوەرییەکانی کوردستان و دەرەوەدا.

١٨- پێوەندی کردن لەگەڵ ڕێکخراوە پیشەیی و جەماوەرییەکانی سەرانسەری عێراق دوای ڕووخاندنی ڕژێمی دیکتاتۆر و دامەزراندنی ڕژێمێکی دیموکراسی پەرلەمانی فرە حیزبی بۆ پتەوکردنی گیانی هاوکاری و تەبایی و برایەتی لە نێوان گەلانی عێراقدا.

١٩- بەشداربوون لەو کۆڕ و کۆنگرە و کۆبوونەوە جیهانییەیانەی کە لە بەرژەوەندی مامۆستایاندابن.

٢٠- ڕاگرتنی هەموو جموجۆڵێکی ڕێکخراو و لایەنەکانی مامۆستایان بە گشتی لەژێر هەر ناوێکدا بن و هاوکاری کردنی تەواو لەگەڵ مەکتەبی سکرتارییەتی ئێستا و لقەکانی یەکێتیی مامۆستایانی کوردستان کە لە ئەنجامی کۆنگرەی نوێمدا دەست بە کار دەبێت.

٢١- هەڵوەشاندنەوەی «نقابه المعلمین» لە کوردستاندا و دەست بەسەراگرتنەوەی گشت سامان و مۆڵکی نەقابەی ناوبراو و کردنیان بە موڵکی تایبەت و ڕەوای یەکێتیی مامۆستایانی کوردستان.

٢٢- هەر یارمەتی و کۆمەکێک لەهەر ڕێکخراوێکی خێرخواز و مرۆڤدۆستی کوردەوە دەگاتە کوردستان بۆ مامۆستا، با نوێنەری دیاریکراوی یەکێتیی مامۆستایانی کوردستان ڕاستەوخۆ سەرپەرشتی دابەشکردنی بکات.

٢٣- هەوڵدان بۆ زەمینەخۆشکردنی دروست کردنەوەی کۆڕی زانیاری کورد بە شێوەیەک کە خزمەتی تەواوی زمان و مێژوو کەلوپۆری کورد بکات.

٢٤- ڕێزلێنان و لەبەر چاوگرتنی مافی کەمە نەتەوایەتی و ئایینەکانی کوردستان.

٢٥- وەرگرتنی هەموو قوتابیانی خەڵکی کوردستان لە قوتابخانە و پەیمانگا و زانکۆکاندا کە مەرجی وەرگرتنیان تیادا بێت.

٢٦- ڕێگەنەدان بە پالاوتن و هەڵبژاردنی ئەوانەی کە لە دەستەی پێشووی «نقابه المعلمین»دا بوون بۆ مەکتەبی سکرتارییەت و لق و کەرتەکانی یەکێتیی مامۆستایانی کوردستان.

٢٧- وەرگرتنی منالانی شەهید و پێشمەرگە و ئەنفال لە قوتابخانەدا بێ ڕەچاوکردنی مەرجی تەمەن.

٢٨- ڕێگەدان بە مامۆستایانی بەشەکانی تری کوردستان کە ئەمڕۆ لە هەرێمی کوردستانی ئازاد، وانە لە قوتابخانە و پەیمانگا و زانکۆکانی کوردستاندا بڵێنەوە بە مەرجێ گومان لێکراو نەبن.

٢٩- لە کۆنگرەدا پێشنیارکرا کە وێنەی بارزانی نەمر لە قوتابخانەکاندا هەڵواسرێ، کۆنگرەش وای بە چاکزانی ئەم پێشنیارە بۆ پەرلەمان بەرز بکرێتەوە.

٣٠- حسابکردنی ساڵی خوێندنی ٩١-٩٢ بە دوو ساڵی خزمەت بۆ مەبەستی (علاوه و ترفیع)ی مامۆستایان.

٣١- کردنەوەی ئامادەیی کشتوکاڵ لەو ناوچانەی کە پێویستە.

دوای دانیشتنی کۆنگرە، کاتژمێری ١١/١٥ (یانزە و چارەکێک) بە سەرپەرشتی دادوەری بەڕێز «طاهر خلیل حسن» دەرگای پالاوتن کرایەوە بۆ هەڵبژاردنی سەرۆکی یەکێتیی مامۆستایانی کوردستان بەڕێزان مامۆستا «محەممەد ئیسماعیل محەممەد» لە لیستەی یەکێتیی مامۆستایانی کوردستان و «عەبدولڕەحمان محەممەد ئیسماعیل» لە لیستی مەکتەبی سکرتارییەت خۆیان پالاوت، لەم هەڵبژاردنەدا کە ٢١٣ ئەندامی کۆنگرە بەشداربوون، مامۆستا «عەبدولڕەحمان محەممەد ئیسماعیل» بە سەرۆک و مامۆستا «محەممەد ئیسماعیل محەممەد» بە جێگری یەکەم و مامۆستا «حیکمەت عەبدوڵلا ڕەسول» بە جێگری دووەمی سەرۆک هەڵبژێران و (١٨)بەڕێز بە تێکڕای دەنگی لیستەکانیان بۆ ئەندامێتی مەکتەبی سکرتارییەتی یەکێتیی مامۆستایانی کوردستان هەڵبژێران.

www.arsivakurdi.org

# بەیانی کۆتایی نۆیەم کۆنگرەی یەکێتیی مامۆستایانی کوردستان



لەژێر دروشمی «روە و پتەوکردنی ریزەکانی مامۆستایانی کوردستان و گەشەپێدانی پەروەردە و پشتگیری لە بەرەی کوردستانی و پەرلەمان و ئەنجوومەنی وەزیران، لە پێناوی وەدیهێنانی ئامانجە نیشتمانی و دیموکراسی و پیشەییەکان لە کوردستانێکی فیدراڵدا»، مامۆستایانی کوردستان بە جیاوازی بیر و باوەڕیانەوە، سەرکەوتووانە لە بارودۆخێکی ئازاد و دیموکراتدا کۆنگرەی یەکگرتنی خۆیان ئەنجامدا.

سەر لە بەیانی رۆژی ٦ی تشرینی یەکەمی ساڵی ١٩٩٢ز، لە هۆڵی «میدیا»ی شاری هەولێری دێرین و هۆلاکۆ بەزین بە ئامادەبوونی بەرێزان سەرۆکی ئەنجوومەنی نیشتمانی هەرێمی کوردستان و ئەندامانی پەرلەمان و نوێنەری سەرکردایەتی بەرەی کوردستانی و نوێنەرایەنی لایەنە سیاسییەکان و وەزیری پەروەردە و پارێزگاری هەولێر و لێپرسراوانی دامودەزگاکانی کوردستان و نوێنەرانی رێکخراوە دیموکراتی و پیشەییەکان، کۆنگرە بە چەند ئایەتێک لە قورئانی پیرۆز لەلایەن مامۆستا «محەممەد رەزا»وە و بە دەقیقەیەک وەستان بۆ گیانی پاکی سەرجەم شەهیدانی کوردستان و بزاڤی رزگاری نیشتمانی کرایەوە. پاشان بەرێز «جەوهەر نامق» سەرۆکی ئەنجوومەنی نیشتمانی کوردستان وتارێکی پێشکەش کرد، بە دوایدا بەرێز «سامی عەبدولرەحمان» نوێنەری بەرەی کوردستانی و لێپرسراوی رێکخراوە پیشەییەکان وتارێکی خوێندەوە، ئینجا بەرێز وەزیری پەروەردەی هەرێمی کوردستان «د. ناسح عەبدولغەفور» وتارێکی پێشکەش کرد، لە نێوان وتارەکاندا چەند نامە و بروسکەیەکی پارتە سیاسی و رێکخراوە پیشەییەکان و چەند لایەنێکی تر کە بۆ کۆنگرە نێردرابوون لەلایەن مامۆستایان «کەمال غەمبار» و «نوعمان مەجید»ەوە خوێندرایەوە. مامۆستا «حیکمەت عەبدوڵلا» سەرۆکی لیژنەی باڵای ئامادەکردنی کۆنگرە بە وتارێک کۆتایی بە دانیشتنی سەر لە بەیانی هێنا.

دانیشتنی دووەمی ئەو رۆژە کە لە کاتژمێری «٣»ی پاش نیوەرۆدا، بۆ سەرپەرشتی کردنی کاروباری کۆنگرە و دابەشکردنی لیژنەکان تەرخان کرا.

سەر لە بەیانی رۆژی دووەمی کۆنگرە، دەست کرا بە لێدوان و لێکۆڵینەوە لەسەر بۆچوون و راسپاردەی لیژنەکان. دانیشتنی دووەمی هەمان رۆژ بۆ لێکۆڵینەوە لە یاسا و پەیرەوی ناوخۆی یەکێتی مامۆستایانی کوردستان دانرا.

١./٨ دوا رۆژی کۆنگرە دانشتێکی لە بەرنامەی یەکێتیی مامۆستایانی کوردستانی کۆڵییەوە. ئەوەی شیاوی باسە کۆمەڵێ دەسکاری لەهەر سێ پرۆژەکەدا کرا.

لە ئەنجامی گفتوگۆ و لێکۆڵینەوەیەکی تێر و تەسەل دەربارەی کاروبارەکانی هەر سێ رۆژی کۆنگرە، کۆمەڵێ پێشنیار و راسپاردە پێشکەش کران بۆ خزمەت و بەرژەوەندی رەوتی مامۆستایان بە تایبەتی و سەرجەم گەلی کوردستان بە گشتی، کە گرنگترینییان ئەم خاڵانەی خوارەوەن:

*١- پیرۆزبایی و بشتگیری کۆنگرە لە بڕیارە مێژووییەکەی پەرلەمانی کوردستان بە پەسەندکردنی سیستەمی فیدراڵی بۆ هەرێمی کوردستان و ناردنی بروسکەیەک بەم بۆنەیەوە.*

*٢- پشتگیریکردنی تەواوی کۆنگرە لە حکوومەتی هەرێمی کوردستان بۆ رەخساندنی زەمینەیەکی پتەو کە بنەماکانی دەوڵەتی یاسا لە هەموو بوارەکانی ژیاندا دەچەسپێنێ.*

www.arsivakurdi.org

# وەڵامی بەرپرسیاری فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوێد بەرامبەر پرسیارەکانی رۆژنامەی (ئوزگور گوندەم)، سەبارەت بە رووداوەکانی ئەم دواییەی کوردستانی باشوور.

**پرسیار:** لە پێنجەمین رۆژی ئۆکتۆبەری رابردوودا، شەڕێکی قورس لە نێوان پێشمەرگەکانی (پ.د.ک) و (ی.ن.ک) و پێشمەرگەکانی (پ.ک.ک) دەستیپێکردووە، ئێوە سەبارەت بەم شەڕە چی دەڵێن؟

**وەڵام:** فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوێد، هێزە سەربازییەکانی ئەنجومەنی نەتەوەیی کوردستان عێراق و حکومەتێک کە لە ١٩/٥/١٩٩٢دا بە هەڵبژاردنێکی گشتی پێکهاتووە، وەکو لایەنێکی ئەم شەڕە دەزانێت و نەک وەکو ئێوە لە پرسیارەکەتاندا دەڵێن پێشمەرگەکانی (پ.د.ک) و (ی.ن.ک) ئەم تێڕوانینەش بۆ ئێمە بناخەی هۆ و رووبەر و ئەنجامی بۆچوونی ئێمە لەسەر ئەم شەڕە. بەکارهێنانی مافی ئۆتۆریتەی سیاسی لەلایەن ئەنجومەنی نەتەوەی کوردستان کە گەلەکەمان لە پاش خەباتێکی درێژ خایەن لەناوچە رزگارکراوەکاندا بە توانا و ئیرادەی نوێ سازی کردووە، لە پشتی ئەم شەڕەدایە. ئەرکی هەر وڵاتپارێزێکی راستەقینە ئەوەیە کە (Embiryon) بپارێزێت و هەوڵی پێشخستنی بدات. بە پێی ئەو سەرچاوە زانیارییانەی کە دەستی ئێمەدا هەیە: (وتووێژێک لە ٦/١٠/١٩٩٢دا لەگەڵ- مستەفا چاورەش و نەوشیروان مستەفا- لە لایەن رۆژنامەی ئێوەدا کە تێیدا بانگی ئەنجومەنی نەتەویی کوردستان بۆ کوردستانیان کراو، هەیە)، پیشانی دەدەن کە ئەنجومەنی نەتەوەیی کوردستان و حکومەتەکەی بۆ چارەسەرکردنی ئەم مەسەلەیەی کە لە مێژە پەیدابووە، هەوڵێکی زۆریان داوە.

بەپێی ئەم بەڵگەیەش دەبێت کێشە وەکو ئەنجامێکی دڵنەخوازی پاراستن و پێشخستنی گرنگترین قازانجی سیاسی لە مێژووی نزیکی کورداندا و بۆیەش چەسپاندنی ئۆتۆریتەی سیاسی ئەنجومەنی نەتەوەیی کوردستان و حکومەتەکەی ببندرێت.

دیارە کە ئەم بارودۆخەی ئێستا هەرگیز لە بەرژەوەندی گەلی کوردا نییە. هۆیەکانی پەیدابوونی کێشە دەبێت بە هەموو لایەنەکانی خۆیەوە، نەتەویی و نێونەتەوەییەوە بنرخێندرێت و تاوانبار بکرێت.

**پرسیار:** لەشکر و فڕۆکە جەنگییەکانی (تورکیا)یشی، دەستی بە هێرش کردووە بۆ سەر پێشمەرگەکانی (پ.ک.ک)، رۆڵ و داخوازی تورکیا دەبێ چی بێت لەم شەڕەدا؟

**وەڵام:** حکومەت و دەوڵەتی کوماری تورکیا، بەهەموو دامودەزگاکانییەوە، دژی گەلی کوردە پیسترین شەڕی حەفتا ساڵەی کۆمارەکانیان دەکەن. لە مێژووی کۆلۆنیالستی، بۆ نەهێشتنی دەستکەوتێکی سیاسی بچووک کە گەلی کورد لە گۆشەیەکی کوردستاندا، بە دەستیهێنابێت، یان بە دەستیبهێنێت، لەبەر هێنانی هەموو توانایەکدا، خۆیان نەداوەتە لایەکەوە و ئەمڕۆش دیسانەوە خۆیان نادەنە لایەکەوە. جا لەبەر ئەوەیان کە هێزی هێرشکاری تورک دەیانەوێ لە بارودۆخی ئەمرۆی کوردستانی باشوور سوودێکی (Azami) بەدەستبهێنن. هەروەکو ئێوە لە پرسیارەکەتاندا وتووتانە، لەلایەکەوە ئەم داخوازە خۆی بە بزووتنەوە و ئامادەبوون بۆ نەهێشتنی فزیکی و لە لایەکی تریشەوە بە راگەیاندنی هەندێک سەلاحیەتدارانی خۆی دەیانەوێت خۆیان وەک لایەنێک نیشان بدەن و بەم جۆرەش وەحشیترین و ناڕواترین شەڕی سیکۆلۆژی لە دژی گەلەکەمان بەرپا دەکەن.

لەلایەکەوە، ئەتوسڤارێک دەهێننە ئاراوە کە گوایە پشتگیری ئەنجومەنی نەتەوەیی کوردستان لە دژی هێزی (پ.ک.ک) دەکەن، و لەلایەکی تریشەوە بڕیاری راگەیاندنی (دەوڵەتی فیدراڵ)ی ئەنجومەنی نەتەوەیی بە وتەی - سلێمان دمیرێل-: «دومەڵی نوێ لە رۆژهەڵاتی ناوەڕاست» لە قەڵەم دەدەن. ئەمەش بەلگەی دووڕوویەتی دەوڵەتی تورکیایە.

دەوڵەتی تورکیا بە بزووتنەوەی هێزە سەربازییەکانی خۆیەوە دەیەوێت بێ ئیستیقرارییەت لە کوردستانی باشوودا زیاد بکات و، کوردستانیش لەناو بەرێت.

دەبێت هەموو وڵاتپەروەرانی کوردستان، لە رێگای گوێ لەیەکتر گرتن و هاوکاری و یەکێتییەوە، یاری و عەمەلیاتە عەسکەرییە گەورەکانی دەوڵەتی تورک کە وەهای دەردەخات گوایە بۆ (پاراستنی ئۆتۆریتە)یە، پووچەڵ بکەنەوە. هەر بەم بۆنەوەیەوە ئیرانیش دەستبەستراو دانەنیشتووە.

**پرسیار:** بۆ راگرتنی ئەم شەڕە رۆژێک زووتر چی دەبێت بکرێ؟

**وەڵام:** مەرجی هەرەپێشین بۆ راگرتنی شەڕ، داننان بە ئەنجومەنی نەتەوەیی کوردستان و حکومەتەکەیەتی وەکو دەسەڵاتداریەکی مەشروعی سیاسی گەلی کوردستانی باشوور و یەکبوونی خاکی کوردستانی باشوورە و، دەبێت کێشەیش لە چوارچێوەی مەشرووعیەتی ئەم دەسەڵاتداریەدا، لەرێگای گفتوگۆوە چارەسەر بکرێ. لەم بوارەشدا هەموو وڵاتپەروەرێک ئەم ئەرکەی لەسەر شاندایە. دەبێت هۆیەکانی شەڕ نەمێنێت. دەبێت هیچ کاتێک پارستن و پێشخستنی دەستکەوتێکی سیاسی لە باشووری کوردستان، بە تێکۆشانی پارچەکانی تری کوردستانەوە یەکسان نەکرێت. بۆ نەهێشتنی کەموکوری و هەڵەکانیشی دەبێت، ئیمکانی گفتوگۆ و تێگەیشتنی یەکتر پەیدا بکرێت. هیچ سوودێک لە بڕین و بێ ئارامییەک کە لە کێشەی وادا لە کۆمەڵگای ئێمەدا پەیدا دەبن لە بۆ بزووتنەوەی رزگاریخوازی نەتەوەی ئێمە نییە.

دەبێت ئێمە ئەوە لەبیر نەکەین کە کێشەی وا دوژمنی ئێمە دڵشاد دەکات.

به سەڵاوی دۆستانە سەرکەوتنتان بۆ دەخوازم لە کارەکاندا.

**تێبینی: ئەم وتووێژە لە لایەن (بەهجەت ئەفشار) نوێنەری ئەورووپای رۆژنامەی (ئوزگور گوندەم) بە زمانی تورکی ساز بووە، بەڵام چاپ نەکراوە، بەبێ ئەوەی کە هیچ هۆیەک بۆ چاپ نەکردنی دیاری بکرێت. بۆیە رداکسیۆنی وەرگێرانی کوردی لە گۆڤاری (بەربانگ) ئەم وتووێژە چاپ دەکات.**

www.arsivakurd.org

جاریٰ خەڵک لێرە بە قورپەسەری دەژی و دەبیٰ شەو یان رۆژ کار بکات هەتا بتوانیٰ ژیانێکی بەشەرەفانەی هەبیٰ. کەچی لەویٰ خەڵکیان وا تیٰ گەیاندووە کە بابە دانیشتووی چی دەکەی؟! تا زووە پارەیەک وە دەست بێنە و برۆ بۆ تورکیە، سووریە، یان ئێران؛ لەوێش‌را ئەگەر برا، خوشک، زاوا، یان دۆست و برادەرت هەیە، داوایان لیٰ بکە کە پارەت بۆ بەریٰ بکەن و خۆت فریا بخە!

من ناڵێم ئەوانەی کە لە دەرەوەی وڵاتن، بیٰ کەڵکن و هیچیان پیٰ ناکریٰ، نە. مەبەستی من ئەوە نییە. زۆربەی زۆری هەر ئەم خەڵکەی دەرەوەی وڵات، لە کاتی کارەساتەکەی هەڵەبجە و بادینان و رەوە مێژووییەکەی کوردستان و زۆر بۆنەی دیکە کە پەیوەندی بە قەزیەی کوردستانەوە هەبووە، ئەوپەڕی لە خۆبردوویی و فیداکارییان لە خۆیان نیشان داوە. من جاریٰ رەخنە لەو کەسانە ناگرم کە پێشمەرگایەتیان کردووە و لە گەڵ پارت یان حیزبەکەیان نەماون و هاتوونەتە دەرەوەی وڵات. چونکە بە جێگای ئەوە کە خۆیان تەسلیم بکەنەوە و بە سەرشۆری بگەڕێنەوە، لەوپەڕی ژێریدا، باشترین کار کە کردوویانە، ئەوە بووە بێنە دەرەوەی وڵات. ئەم خاڵەش دیسان کوردستانی ئێستا ئازادکراوی ناگرێتەوە. دیسان چوونە دەرەوەی وڵات بۆ پەیوەندی و خوێندن و لێکۆڵینەوە، ئەویش هەر مەسەلەیەکی دیکەیە. بەڵام هەڵاتن و هەڵبژاردنی ژیانێکی خۆشتر و دوور لە دەردیسەر و خەریکبوون بە ژیانی شەخسییەوە، ئەویش لە کاتێکی ئاوەهادا کە کوردستان لە بار و دۆخێکی ناسکدایە، کارێکی ناخۆشە.

لە هەمووی ناخۆشتر کردەوەی ئەو کاربەدەست و کارگێڕ و کارفەرمایانەی دەوڵەتی کوردستانە کە ژن و منداڵی خۆیان بە ریٰ دەکەنە دەرەوەی وڵات. لە کاتێکدا کە ئەوانە وان، ئاخۆ هەژار و دەسکورتەکان چی بکەن؟!

پێشینیان درۆیان نەکردووە کە بەرد لە جێگای خۆیدا سەنگینە! بە داخەوە خەڵکی ئەویٰ نازانن کە بار و دۆخی پەنابەر لێرە چەندە ناخۆشە و بیر و باوەڕی راسیستی چەندە بووژاوەتەوە و سەری هەڵ داوە! سوێد کە لە باری ئابوورییەوە سەرتۆپی تەواوی وڵاتە ئوورووپاییەکان بوو، ئێستە وای لیٰ هاتووە کە ئەگەر ئاوەها بڕوا چەند ساڵی دیکە دەبێتە بەنگلادش! چ بگات بە وڵاتانی دیکەی ئوورووپا و ئامریکا و هی دیکە!

ئەو رێز و حورمەتەی کە پەنابەر پێشتر هەبووی ئێستە نەماوە و بە هەزار قەرقەشە پەنابەرێک وەردەگرن. بە دەیان کەس لێرە کاریان کەوتۆتە دادگا و شوێنە دەوڵەتییەکانی دیکە و وەکیلیان گرتووە کە رەدیان نەکەنەوە و بەرێیان نەکەنەوە! ئیقامەت وەرگرتن بۆتە هێلکەی (سیمەڵ) و دەبیٰ بۆی بچیتە لووتکەی قاف. ئەوانەی کە پێشتر لێرە لە سەر ئیش و کار بوون و کاری دائیمییان هەبوو ئێستە دەردەکرێن و کار کەمە!

بە کورتی ئەوەی کە پێشتر هەبوو، ئێستە وا نەماوە و بار و دۆخ بە چەشنێکی دیکەیە. خەڵک زۆری بۆ هاتووە و زۆربەی زۆرمان بە هیوای ئەوەین کە بار و دۆخی کوردستانی ئازادکراوی گەرمێن بگاتە ئاستێک کە بگەڕێینەوە و لە ناو گەلەکەی خۆمان و لە سەر خاکەکەی خۆمان بژین. ئەگەر ژیانە با لەویٰ بژین، وەگەر مردنە با لەویٰ بمرین!

من داوا لە خەڵکی بەشەرەفی کوردستان دەکەم کە وڵاتەکەی خۆیان بە جیٰ نەهێڵن و لێرەش کەس و کاریان تووشی قەرز و قۆڵە نەکەن و دەستیان نەنێنە ناوخوم. چونکە بە دەیان خێزان و بە سەدان ژن و پیاوی کورد لە تورکیە و لە وڵاتەکانی دیکە ماونەتەوە کە لەو پەڕی ناخۆشی و بیٰ دەرەتانیدان و کەس و کاریشیان وەک پێویستە ناتوانن لەو گێژەنەیان دەربێنن و قاچاخفرۆشەکانیش جگە لەوەی بە کەیفی خۆیان کاسپییان پێوە دەکەن، هەتا پارەی خۆیان وەر نەگرن، هەر چەند ئەوەش ریسکێکی گەورەیە، یەک کەس بەریٰ ناکەن.

لەوانەیە ئێستا بڵێن ئەی خۆت بۆچی هەڵاتی و کوردستانت بە جیٰ هێشت؟ منیش دەڵێم باشە، من کوردم تۆ مەیکە. ئەوەی ئێمە دەیزانین و دەیچێژین، ئێوە لێی نازانن و نەتانچێشتووە. ئینسان کە لە خاک و خەڵکەکەی خۆی دابڕا، دەردێکی گەورە و گرانە و تا بڵێی ناخۆشە. بە دەیان هونەرمەند و نووسەر و ئینسانی لێهاتوومان لێرەن کە داکەوتوون و هیچیان پیٰ ناکریٰ.

ستۆکهۆڵم ۱۹۹۲/۱۱/۱.





www.arsivakurdi.org

# ئەگەر ژیانە با لەوێ بژین،
# وەگەر مردنە با لەوێ بمرین!

ناسری رەزازی



بار و دۆخی نالەباری کوردستان و زوڵم و ستەمی داگیرکەرانی کورد و راونان و کۆچی زۆرەملی و بردنە سەربازی بە تۆپزی و گرتن و کوشتن و بڕین لە لایەک و ئەو پاودانە ناخۆشەی کە شۆڕشی کوردستانی تێدا کلێلە بوو، وەکوو هەڵگۆز و داگۆز و هەبوونی بریندار و پەککەوتە و پێویستی بە دەرەوەی وڵات و گەیاندنی بانگ و هاواری مافخوازانەی گەلی کورد بە جیهان، لە هەمووی ناخۆشتر پەیدابوونی جیاوازی بیر و باوەڕ کە خۆی لە شەڕی براکوژیدا دیتەوە، بوو بە هۆی ئەوە کە کۆمەڵ کۆمەڵ و دەستە دەستە و تاک و تەرا کورد، روو بکەنە هەندەران و ببنە پەنابەر و دوور لە خاک و نەتەوەکەی خۆیان، ژیان بەرنە سەر.

ئەم کاروانی کۆچکردنە ئێستاش هەر بەردەوامە و نەبڕاوەتەوە. هەتا زوڵم و زۆریش هەبێ، دیارە هەر بەردەوام دەبێ. بەڵام با ئێمەی دوور لە وڵات، کە هەر یەکەمان ۱۰ ساڵ و ۱۵ ساڵ و ۲۰ ساڵە بگرە زۆرتریش، لە هەندەران دەژین، بۆ خوێنەرانی بەڕێزی ئەم وتارە و ئەوانەی لە کەڵکەڵەی ئەوەدان کوردستان بە جێ بهێڵن و بێنە دەرێ و لێرە بژین، رروونی بکەینەوە کە دووری لە خاک و دیار، خێری چییە و زەرەری چییە؟ ئایا ئەوانەی کە لە کوردستان دوورن خۆشحاڵن و دوور لە خەم و کەسەرن؟ (دیارە مەبەستم ئەو جیلە نییە کە لە دەرەوەی وڵات لە دایک بوونە و بە فەرهەنگی ئێرە پەروەردە کراون، چونکە ئەوانە بیری گەڕانەوەیان لە مێشکدا نییە و ئەگەریش بگەڕێنەوە لە کوردستانیش ناتوانن بژین) بەڵکوو تەنیا رووم لەوانەیە کە شەو و رۆژ بە هیوای ئەوەن درووبەکیان لێ بکرێتەوە و بگەڕێنەوە ناو نیشتمان و کەس و کاری خۆیان.

لەو کاتەوە کە کوردستان ئازاد کراوە و خەڵکی دەرەوەی وڵات ئەوانەی کە ماوەیەکی زۆر لە کوردستان دوور بوون و گەڕانەوە، بە داخەوە هەندێکیان فەزایەکی ناخۆشیان لە کوردستان وەدی هێناوە!
دیارە زۆربەی ئەو خەڵکە لە بەر ئەوە گەڕاونە کە خەبەری کەس و کاریان وەرگرن و تا ئەو جێگەیەی کە دەتوانن و پێیان دەکرێ، یارمەتییەکیان بدەن. کۆمەڵێکیش لە بەر ئەوە گەڕانەوە کە خزمەتێک بکەن و هەرچیان لە دەست دێ درێغی نەکەن. بەڵام هەندێک بۆ فرۆشتنی توورۆمبێل و دەسبڕی و کڵاو لە سەر نان گەڕانەوە. بڕێکیش جیا لەوەی لێرە پارەیان لە بانکەکان قەرز کردووە و پارەکەیان لە گەڵ خۆیان بردۆتەوە کوردستان و دەستی بانکەکانیان بڕیوە و ئیتر ناگەڕێنەوە، لەوێ خانوویان کڕیوە و کەشخەیی بە پارەکەوە دەکەن. لە لای خەڵکیش وایان نیشان داوە کە خاوەنی شەریکە و شتی وا بوونە و ئیشی باڵایان هەبووە. لە لایەکی دیکەش کەوتوونەتە بانگاشە کە لە وڵاتی ئورووپا پارە رژاوە و خەڵک لێرە بە سەر پارەدا باز دەدا و دەوڵەتە ئورووپییەکان پارە دابەش دەکەن! زۆر کەسیان وا تێ گەیاندووە کە هەر کەسێک روو دەکاتە بۆ نموونە سوێد یان وڵاتێکی دیکەی ئورووپا، باشترین خانووی دەدەنێ و هەتا لەوێ بێ لە سەر سەران بەخێوی دەکەن! ئیتر نازانن کە خەڵک لێرە چۆن دەژی؟ نازانن زۆر کەس هەیە کە بە شەهادەی باڵاوە لێرە داکەوتووە و قاپ دەشوا، یان گەسک دەدا!

من قسەی هەندی ئیشی وەکوو دۆکتۆری و شتی لەم بابەتانە ناکەم کە زمانی ئینگلیزی دەزانن و لێرە سویدی فێر دەبن و لە رەدەی خوارەوە دەست دەکەن بە ئیش، دەنا بەرێزترین ئیش و کار لێرە بۆ پەنابەر، وەرگێڕیی و شۆفێری قەتارە و پاس. جگە لەوانەش کە پارەیان لە کوردستانەوە لە گەڵ خۆیان هێناوە یان لێرە ئیشیان کردووە و پارەیان لە بانک بە قەرز هێناوە و دووکانیان داناوە، دەنا وەکی دیکە، ئەگەر کار نەکەی و رەنج نەدەی دەبێ لارەملی (سووسیال) بی و سواڵ بکەی! کە زۆر کەس و زۆر بنەماڵە لێرە هەن کە ناچارن بەو چەشنە بەڕێ بچن.

www.arsivakurd.org

# بەلاغی کۆتایی کۆبوونەوەی هاوبەشی وەفدی تورکیا لەگەڵ تاڵەبانی و بارزانی‌دا



رۆژی ١٩٩٢/١١/٥ وەفدێکی وەزارەتی کاروباری دەرەوەی جمهوریەتی تورکیا کە نوێنەری جەنابی سەرۆک وەزیرانی جمهوریەتی تورکیا سلێمان بەگ دیمیرێل بوون سەردانێکی رەسمی کاک مسعود بارزانی و مام جەلال تاڵبانی‌یان کرد. وەفدەکە پێکهاتبوو لە جەنابی جەنگ دوغان تەپە و جەنابی گولتکین کە دوو لێپرسراوی پایە بەرزی وەزارەتی کاروباری دەرەوەن.

لە پێشەوە سلاوی جەنابی سەرۆک وەزیرانی تورکیایان راگەیاند ئینجا گوتیان سەرۆک وەزیران رای سپاردوین کە ئەم شتانەی خوارەوە رابگەیەنین بە (مام جەلال و کاک مسعود):-

١. تورکیا وەک پێشتریش بەڵێنی داوە پارێزگاری دەکات لە کورد و تورکمان و دانیشتوانی تری ژووروی عێراق.

٢. تورکیا حەز دەکات دۆستایەتی خۆی لەگەڵماندا درێژە پێبدات.

٣. تورکیا هیچ تەماحێکی لە بستێکی خاکی عێراقدا نییە.

٤. هاتنی سوپای تورک بە نیازی پاک کردنەوەی سنورە لە تیرهابیەکان و بە زوترین کاتیش دەکشێتەوە.

٥. هیوای تورکیا وایە کە ئێمە کۆسپ نەهێنینە رێگایان و بە هەڵە نەچین لە هەڵسەنگاندنی نیازی راستەقینەیان.

برایان: کاک مسعود و مام جەلالیش زۆر بەگەرمی بەخێرهاتنیان کردن و سوپاس و رێزی خۆیان بۆ جەنابی سەرۆک وەزیرانی تورکیا راگەیاند و ناردنی وەفدەکەشیان بە هەنگاوێکی دۆستانە و ئیجابی هەڵسەنگاند، هەروەها هەردووکیان رایانگەیاند کە:

١. خەڵک و حکومەتی کوردستانی عێراق خۆیان بە دۆست و هاریکاری گەل و حکومەتی تورکیا دەزانن لە دابینکردنی دیموکراسی و ئاشتی و برایەتی لە رۆژهەڵاتی ناوەراستدا.

هەروەک پێشتریش رایانگەیاندووە، سنووری خۆیان لەگەڵ تورکیا دەپارێزن و ماوە نادەن بەکەس کە لە خاکی ئێمەوە هێرش بکەنە سەر خاکی تورکیا. پێکهاتنی حکومەتی هەرێمی کوردستانی عێراقیش لەسەر چەند خاڵێکی گرنگ لەگەڵ پەکەکە هەر هەمان نیاز دابین دەکا.

٢. حکومەتی هەرێمی کوردستان توانی پەکەکە بهێنێتە سەر رێ و رازیان بکات بە سەلماندنی بریارەکانی پەرلەمانی کوردستانی عێراق، بە دوورکەوتنەوە لە سنوری تورکیا و راگرتنی چالاکی عەسکەریش لە خاکی ئێمەوە بۆ سەر تورکیا. بۆیە هیچ پێویستیەک نەبوو بە هاتنی لەشکری تورکیا و بۆمبارانەکانی هێزی ئاسمانی تورکیا کە بووە هۆی شەهید کردنی (١٤) پێشمەرگەی کوردستان و بریندارکردنی پتر لە (٤٢) کەسی تر. هەر بۆیەش هیواداریین بە زووترین کات لەشکری تورک بگەرێتەوە ولاتی خۆیان و دڵنیاشبن کە هێزی پێشمەرگەی کوردستان دەتوانێ ئەمنی ناوەوەی سەر سنورەکان دابین بکا.

٣. بە هیچ جۆرێک ناکرێ و ناشێ ئەندامانی پەکەکە تەسلیم بە تورکیا بکرێن هەم بەپێی قانونەکانی دەوڵی و هەم بە پێی سەرەتاکانی مافی مرۆڤ و هەم بە گوێرەی بەڵێنی حکومەتی هەرێمی کوردستانیش کە ژیان و ئەمان بۆ پەکەکە دابین دەکات کە بە ئاشتی لە کوردستانی عێراقیشدا دەمێننەوە.

٤. هیواداریین تورکیا رێگای هێنانی هەموو یارمەتییە ئینسانیەکان بدات بۆ کوردستانی عێراق و هەر بەردەوام بێت لەسەر هاوکاری خۆی لەگەڵ هاوپەیمانان.

هەروەها هەڤاڵ مام جەلال و کاک مسعود نیگەرانی خۆیان و خەڵکی کوردستانی عێراقیان دەربری سەبارەت بە کۆبونەوەکەی ١٤ و ١٥/ی ئەم مانگەی وەزیرانی دەرەوەی سێ ولاتەکەی تورکیا و ئێران و سوریا کە هیچ پێویست نییە و بە پێچەوانەی سیادەت و مافی چارەی خۆنوسینی گەلی عێراقیشە، چونکە هیچ دەوڵەتێکی بێگانە بۆی نییە و هەقی نییە جۆر و شێوەی حوکمی دوا رۆژی گەلی عێراق نەخشە بکێشێت، ئەوە بۆ گەلی عێراق دەگەرێتەوە کە چ جۆرە رژێمێکی دیموکرات هەڵدەبژێرێت.

دووپاتیشیان کردەوە کە نە ئەنجومەنی نیشتمانی کوردستان و نە حکومەتی کوردستان و نە پارتی و نە یەکێتیی‌یش نیازی جیابونەوەیان نییە، بەڵکو گەرەکیانە یەکێتیی عێراق پتەوتر و بەهێزتر بکەن، بە دیموکراسی و فیدراڵیەت کە هەمیشە لە هەموو جیهاندا دوو ئەستوندەی توند و تۆڵی پاراستنی یەکێتیی نیشتمانیی دەوڵەتە فرە نەتەوەکان بوون.

تێبینی:
دەقی ئەم بەلاغە لە رۆژنامەی کوردستانی نوێ وەرگیراوە.

چاوپێکەوتنیان لەگەڵ وەزارەتی دەرەوەی وڵاتی سوید کرد. پاشان لەگەڵ سەرۆکی دانشگای ستۆکهۆڵم، چاوپێکەوتنێکیان کرد و گفتوگۆیێکی دوورودرێژ لەسەر بارودۆخی ئەمرۆ و داهاتووی کوردستان کرا.

هەروەها کۆبوونەوەیەک ساز کرا لەگەڵ سەرۆکی کۆمیتەیەک کە دەرهەق بە ئاژەڵ و مەڕومالاًت بوو. گفتوگۆ لەسەر چۆنیەتی ئاوەدانکردنەوەی لەوەڕگایەکانی کوردستان و هەروەها چۆنیەتی گەشەپێدانی هێزی بەرهەمی مەڕومالاًتی کوردستان کرا. پاشان چویان بە کۆمیتەی Kurd- Svensk. K کەوت.

بۆ ئێوارەی هەمان رۆژ کۆمیتەی پێشوازی لەسەر شەرەفی وەفدەکە ژمارەیەکی زۆری هاووڵاتیانی کوردی دەعوەتی نانخواردن کرد لە یەکێک لە چێشخانەکانی ستۆکهۆڵم.

رۆژی ١٩/١١/١٩٩٢ وەفدەکە چاوی بە (کۆمیتەی کاروباری دەرەوە)ی پەرلەمانی سوید کەوت. پاشان چاویان بە جێگری قسەکەری پەرلەمانی سویدی کەوت.

پاش نیوەرۆی هەمان رۆژ کۆنفرانسێکی رۆژنامەوانیان لەگەڵ چەند رۆژنامەکانی سوید و رادیۆ و تەلەفزیۆنی سویددا کرد و پاشان چوونە شاری ئۆپسالا لە باکووری ستۆکهۆڵم و چاویان بە سەرۆکی دانیشگایەکە کەوت.

رۆژی ٢٠/١١/١٩٩٢ وەفدەکە کۆبوونەوەیەکی گشتی کرد بۆ هاووڵاتیانی کورد لە سوید، لە هۆڵی -ئامادەیی ئۆسا-. لەم کۆبوونەوەیەدا ژمارەیەکی یەکجار زۆری هاووڵاتیانی کورد ئامادە بوون، تا پلەیەک جێگە بۆ زۆر کەس نەمابووەوە.

بە درێژای پێنج سەعات سەرۆکی وەفدەکە و هاورێیانی باسی بارودۆخی کوردستانیان کرد لە پێش درووستبوونی پەرلەمان و چۆنیەتی هەڵبژاردن و دامەزراندنی حکومەتی باشووری کوردستان کرد. هەروەها ئەوگیروگرفت و کێشانەی کە ئەمرۆ گەلی کوردمانی پێدا تێدەپەڕەی، خستە روو و پاشانیش مەبەست و نیازی ئەم سەفەرەی پەرلەمانیان بۆ ئامادەبووان روونکردەوە و باسی سەرکەوتنی هەموو دانیشتەکانی خۆیان کرد لەگەڵ دامودەزگا ئەورووپییەکان.

سەرۆکی وەفدەکە لە دوای قسەکانی داوای کرد کە پاش ماوەی پرس و وەڵام، هەر کەسێک پێشنیار یان داخوازیەکی هەیە، دەهوانێت بینووسێت بۆ ئەوەی ئێمەش بیگەیێنینە پەرلەمانی لە کوردستاندا.

پاشان کات بۆ پرس و وەڵام کرایەوە و ئامادەبووان پرسێکی زۆریان لە وەفدەکە کرد، سەبارەت بە هەموو لایەنێکی ووردودرشتی کوردستان و لەناو ئەوانەشدا کێشەی حکومەتی کوردستان لەگەڵ برایانی (پ.ک.ک).

## بۆ سەرۆکی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید

سلاًوێکی گەرم

بە بۆنەی کۆتایی سەردانی یەکەم وەفدی پەرلەمانی کوردستانی عێراق بۆ وڵاتی سوید لە ماوەی ١٤-٢٢/١١/١٩٩٢ بە ناوی برایان ئەندامی وەفدەکە و بە ناوی خۆمانەوە سوپاسی بێ پایانتان دەکەین بۆ ئەو هەستە بەرزەی کوردایەتیتان و رێکخستنی ئەو پێشوازییە گەرم و رێکوپێکەی فرۆکەخانەی ستوکهۆڵم و سازکردنی چەندەها کۆڕ و چاوپێکەوتن لەگەڵ لێپرسراوی لایەنە سیاسییەکان و جەماوەری ئاوارەی کوردستانمان لە سوید و هەروەها رێز و سوپاسمان بۆ کۆمیتەی پێشوازیش. تکایە رێز و سوپاسمان بگەیێنە گشت برایانی کۆمیتەی گشتی فیدراسیۆن و گشت کۆمەڵەکانی و جەماوەری تێکۆشەری ئاوارەی کورد لە سوید.

هەر نموونەتان زیاد بێت بۆ خزمەتی کورد و کوردستان.

بە ئومێدی سەرکەوتن.

هەربژی کورد و کوردستان



جەوهەرنامق

جەوهەر نامق

سەرۆکی پەرلەمانی هەرێمی کوردستان/ عێراق

١٩٩٢/١١/٢٧

www.arsivakurd.org



سوپاسێکی بێ کۆتاییتان دەکەم و بەراستی مەحجوبتان کردین......».

سەرۆکی پەرلەمان لە درێژەی وتەکەیدا باسی کرد کە: «ماوەیەکە لە ئەوروپا داین لەسەر دەعوەتی چەند پەرلەمانێکی ئەوروپایی کە لە ئەڵمانیاوە دەستیپێکردوە و پاشان بۆ سویسرا و لە دوایشدا لە لایەن سوێدەوە دەعوەت کراین کە پرۆگرامێکمان هەیە و بەپێی ئەو پرۆگرامە چەند رۆژێک لێرە دەبین.

ئەوەی راستی بێت تاکو ئێستا سەفەرەکەمان سەرکەوتوو بووە و بۆ هەر جێگەیەک رۆیشتووین رێزێکی زۆری پەرلەمانی ئێمەیان گرتووە و بە چاوێکی نرخاندنی بەرزەوە باسیان لە میللەتەکەمان کردووە.

بێگومان لە دوو رووەوە ئەم سەفەرەمان سودێکی زۆری هەبوو، یەکێکیان لە رووی پرۆتۆکۆل و ئەویتریان لە رووی مەعنەوییەوە.

نیازیشمان لەو سەفەرەماندا ئەوە بووە کە ئەو نموونە دیموکراتییەی کە ئەمرۆ لە کوردستانی ئێراقدا هەیە کە سیمبۆڵێکە بۆ هەموو نەتەوەی کورد بە پەرلەمان و حکومەت و خەڵکی ئەوروپای بناسێنین، کە تەنانەت وەک سیمبۆلێک بۆ سەرتاسەری جیهان و ناوچەکە چاو لەو تاقیکردنەوە بێ هاوتایەی ئێمە دەکەن و سەرسوڕمانی خۆیان لە هەموو دانیشتنێکا دەردەبڕن کە ئێمە چۆن توانیومانە لەم بارودۆخە نالەبارەی جیهان و ناوچەکەدا زۆر بە هێمنی و ئاشتیخوازانە و بێ شەڕ و کێشەوە، هەڵبژاردنێکی دیموکراتی ئاوها بەجێ بهێنین و بەردەوامیش بین لەسەر پرۆسێسەکە ......».

سەرۆکی پەرلەمان لە کۆتایی باسەکەیدا، جارێکی تر سوپاسی بێ کۆتایی خۆی و هەوەڵاتی بۆ فیدراسیۆن و کۆمیتەی پێشوازی و هاووڵاتیانی کوردی کردەوە و گوتی: بە حەقیقەت، ئەمەی کە ئێوە کردووتانە، خەڵاتێکی زۆر بە نرخە بۆ من و هاورێکانم و بۆ پرۆسێسە دیموکراتییەکەی کوردستان و ئەمە بەرزترین پلەی پێشوازییە کە ئێمە هەستی پێبکەین و شانازی بە ئێوەی ئاوارە و دوورەوڵات دەکەین و شانازی بە رۆڵی ئێوە دەکەین لەم پرۆسێسەدا و شانازی بە پێشوازییەکەتان دەکەین...».

لە رۆژی ١٥/١١/١٩٩٢، وەفدەکە چاوپێکەوتنێکی هەبوو لەگەڵ کۆمیتەی گشتی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوێد، لە بارەگای فیدراسیۆن.

لەم چاوپێکەوتنەدا، سەرۆکی وەفدەکە جارێکی دی ئاماژەی بۆ رۆڵی فیدراسیۆن کرد لە کۆکردنەوەی کوردان لە پاڵ یەکتردا و خزمەتکردنیان و هەروەها باسی پێویستییەکانی کوردستانی کرد بە گشتی و پێویستییەکانی پەرلەمان و حکومەتی کوردستانی باشووریشی بە تایبەتی.

پاشان سەرۆکی فیدراسیۆن، ئەندامانی کۆمیتەی گشتی بە وەفدەکە ناساند.

لەم کۆبوونەوەیەدا، وەفدەکە باسی بارودۆخی کوردستانیان کرد و ئەندامانی کۆمیتەی گشتی فیدراسیۆنیش هەر پرسیارێکیان هەبوو ئاراستەی وەفدەکەیان کرد.

رۆژی ١٦/١١/١٩٩٢ وەفدەکە کۆبوونەوەیەکیان لەگەڵ خاچی سووری سوێدی کرد و بۆ دوای نیوەرۆ لەلایەن پارتی سۆسیال دیموکراتی سوێدەوە دەعوەت کرابوون. پاشان چاویان بە نوێنەرانی رێکخراوی (منداڵ بپارێزە) کەوت و لە دوایشدا گەشتێکیان بەناو خانەی پەرلەماندا پێکردن و هەر لەوێشدا لەگەڵ گروپی «پارتی چەپ»دا کۆبوونەوەیەکیان کرد.

رۆژی ١٧/١١/١٩٩٢ وەفدەکە چاوپێکەوتنێکیان لەگەڵ نوێنەرانی پارتەکانی کوردستان لە سوێد کرد کە بریتی بوون لە (١٧) رێکخراو و چەندین گروپی تر.

کاک جەوهەر نامق لە باسەکەیدا بۆ نوێنەرانی پارتەکان، ئاماژەی بۆ ئەوە کرد کە یەکێتیی و تەبایی نێوان هێزە کوردستانییەکان بێگومان مایەی سەرکەوتنە و هەروەها پشتگیریکردن لە تاقیکردنەوەکەی باشووری کوردستان و سود لێوەرگرتنی، دەبێتە بناخەیەک بۆ پارچەکانی تری کوردستان.

پاشان وەفدەکە سەردانی ناوچەی Rinkeby کرد.

رۆژی ١٨/١١/١٩٩٢ وەفدەکەی پەرلەمانی کوردستان،

# هاتنی وەفدی پەرلەمانی کوردستان بۆ سوید

ئامادە کردنی: هیوا زەند




لە رۆژی (شەممە)ی رێککەوتی ١٤/١١/١٩٩٢دا یکەم وەفدی پەرلەمانی باشووری کوردستانی، گەیشتنە سوید. ئەندامانی وەفدەکە بریتی بوون لە:

- جەوهەر نامق: سەرۆکی پەرلەمان
- سەعدی بیرە: ئەندامی پەرلەمان و جێگری سەرۆکی گروپی (ی.ن.ک) لە پەرلەماندا.
- فەرەنسیس شابۆ: ئەندامی پەرلەمان‌وکۆمیتەی ئاوەدانکردنەوەی کوردستان.
- نەجمەددین جاف: ئەندامی پەرلەمان و کۆمیتەی تەندروستی و کۆمەلایەتی و ئەندامی کۆمیتەی خوێندنی بالا.

سەردانی وەفدەکە بۆ ئەوروپا، لە ناوچەیەکی ولاتێکی ئەلمانیاوە دەستپێکردبوو. پاشان بۆ سویسرا و لە دواییدا بۆ سوید، کە لە کاتژمێری ٧.٢٥ پاش ئێوارەی رۆژی شەممە گەیشتنە فرۆکەخانەی ستۆکهۆلم.

فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانییەکان لە سوید و کۆمیتەیەکی پێشوازی لە پارتە سیاسییەکانی کوردستان و ژمارەیەکی زۆری هاوولاتیانی کورد لە هەموو پارچەکانی کوردستانەوە، پێشوازیان لێکردن.

پاش بەخێرهاتن و پێشکەشکردنی چەند چەپکە گولێک لەلایەن چەند منداڵێکی کوردەوە، فیدراسیۆن و کۆمیتەی پێشوازی، هۆلێکیان لە فرۆکەخانەدا ئامادەکردبوو بۆ پشوێکی کاتی بۆ وەفدەکە کە جێگەی هەموو پێشوازیکارانی تێدا بووەوە و لە نزیکەوە چاویان بە وەفدەکە کەوت و بەخێرخاتنیان کردن.

سەرۆکی فیدراسیۆن «ویلدان تانریکولوو» بە ناوی کوردی سویدەوە، وتەی بەخێرهاتنی خوێندەوە کە تیایدا خۆشحاڵی خۆی و فیدراسیۆن و خەڵکی کوردی کرد بە هاتنی وەفدەکەی پەرلەمانی کوردستان.

پاشان سەرۆکی پەرلەمانی کوردستان، کاک جەوهەر نامق وتەی وەفدەکەی خوێندەوە کە تێیدا گوتی: «...... پێشوازییەکەتان بۆ ئێمە هێندە رێکوپێک بوو، من بە حەقیقەت نازانم چۆن باسی لێوە بکەم. لەم سەفەرەماندا لە چەند جێگایەک چ لە رەسمی و چ بە شەعبی پێشوازیمان لێکراوە، بەلام بروا بکەن کە ئەمەی ئێوە کردووتانە جێگەی سەربەرزی و شانازیمانە. پێشوازییەکە بە حەقیقەت ئێستا من دەسەلاتی ئەوەم نییە کە هەستی خۆم و هاوڕێکانم دەربڕم. ئەگەر ئەو مافەم هەبێت کە بەناوی پەرلەمانەوە قسە بکەم، ئەوا دەڵێم

www.arsivakurdi.org

خەباتی رێکخراودا لە قەوارەی فیدراسیۆن بە شێوەیەکی بەهێزتر بخەینە گەڕ.

لاوانی کورد هیوای گەرانتی بەردەوامی داهاتووی کۆمەڵگاکەمانن، دەبێ لە نێو کۆمەڵەکانی ئەندامدا و لە نێو یەکێتیی لاواندا کە بەر لە (٦) ساڵ بە کۆششی (ف.ک.ک.س) دامەزراوە، بەهێزتر و فراوانتر بێت. بەشداری لاوانی کورد لە کۆنگرەی فیدراسیۆندا بەهێزتر و هوشیارتر بێت. پێویستە ئێمە بزانین کە لاویەتی لە ژیانی مرۆڤدا سنووری خۆی هەیە، چونکە ماوەیەک یاخود بەشێکە لە ژیانی مرۆڤ، چونکە مرۆڤ لە مەودای ژیانی خۆیدا هەر لاو نامێنێ. لەبەر ئەوە نە خاوەنی ئەو داخوازییانە و هیوا کێشەی تایبەتی پێوەندی بە لاوەتییەوە نییە. لاوی ئیمرۆ، مەزنی داهاتوو ئەرکی بەرپرسیاری و دامەزرێنەر و بەرێوەبردنی کار و خەباتی داهاتوو لە کۆمەڵگاکەماندا لەسەر شانی ئەوانە. ئەوەیان دەبێ ببێتە بنەمای خەباتی یەکێتیی لاوان لەنێو کۆمەڵەکەماندا و لەنێو رێکخراوە دیموکراتییەکەی لە سویدا. سێکشونی لاوان، وەک بەشێک لە خەباتی کۆمەڵەکانی ئەندام، دەبێ دامەزرێن، ئەوانەی دامەزراویشن بە هێز بکرێن و چالاکانە بەشداری خەباتی گشتی و تایبەتی لاوان بکەن.

بەرپرسیارانی هەر کۆمەڵەیەکی ئەندام کە دەبێ رێگا خۆش بکەن بۆ بەشداری لاوان لە کار و خەباتی کۆمەڵەکاندا و هاریکاری و پشتگیریان بکەن و رێگای بدەنە لاوان با بەخۆیان خەریکی کێشەکانی خۆیان بن.

لاوانی کورد پێویستە بیر بکەنەوە کە ئەوان هەردەم لاو نامێننەوە. لەو ئاسۆیەدا خەباتی خۆیان دەنێو کۆمەڵەکان و فیدراسیۆندا بەرێوەبەرن.

لە کۆنگرەی (١٢)مینی فیدراسیۆن بڕیارێک بۆ بەشداری لاوان لە کۆنگرەی فیدراسیۆن وەرگیرا. بە گوێرەی ئەو بڕیارە پێویستە لەهەر کۆمەڵەیەکی ئەندام کە سێکشونی لاوان هەیە، یەکێک لەو سێ نوێنەرانە کە لە نێو (١٥) ئەندام پێشتر هەڵدەبژێردرێن، دەبێ نوێنەری سێکشونی لاوان بێت. ئەوە تا رادەیەک رێگای والێدەکا بۆ ئەوەی لاوان و نوێنەرەکانیان خۆیان کێشەکەیان بخەنە رۆژەڤ.

بێگومان دڵمان نەیدەخواست کە بڕیارێکی وا وەرگرین، بەڵکو دەبوایە کۆمەڵەکانی ئەندام خۆیان رێگا فراوانتر بکەن لەبەردەم لاوان تابتوانن بەهەر جۆرێک بێت بەشداری خەباتی کۆمەڵگاکەمان بن و نوێنەری خۆیان هەبێت. لەلایەکی ترەوە، ئەو بڕیارەی کۆنگرەی (١٢)مینی(ف.ک.ک.س) بێ وەک پێویست بەشداری نوێنەرایەتی فراوان ناکا. لاوانی کورد خاوەن رێکخراوەیەکن دەبێ یەکێتیی لاوانی کورد لەسوێد بەجۆرێک لە کۆنگرەی (ف.ک.ک.س)ی بەشداری بکا. ئەوەش پێویست دەکا کە لاوان بتوانن کێشەی رێکخراوی و کێشەکانی تر لە رادەیی ناوەندیدا بخەنە بەردەم کۆنگرەی فیدراسیۆن و کۆنگرەی بتوانێ زانیاری راستەوخۆ لەوان وەرگرێ و محاسەبەی کاری لاوان و چارەسەری یەکسەر ئاراستەی ئەوان بکرێت.

باشترین کاریش بۆ ئەمە ئەوەیە ئەندامی کۆمیتەی کارگێری لاوان کورد لە سوێد وەک نوێنەری ئەسڵی لە کۆنگرەی فیدراسیۆن قبوول بکرێن. ئەوەیان هەم بەشداری و پێکبەستنەوەی لاوانە بە خەباتی کۆمەڵگاکەمان بەهێزتر دەکا و زەمینە و ئەزموونێکی تازە دەرەخسێنێ بۆ لێک تێگەیشتنی و شێوەی خەبات.

کێشەیەکی تر بەشداری ژنانی کورد لە خەباتی رێکخراوی و کۆمەڵایەتیدا. تا ئەمساڵ ژنانی کورد لە سوێد رێکخراوەیەکی سەرانسەریان نەبوو کە نوێنەرایەتی هەموویان بکات.

بە کۆششی فیدراسیۆن و کۆمەڵەی دیموکراتی ژنانی کورد خەباتێکی ئەوتۆ لە ئارادایە بۆ سازدانی کۆنگرەی دامەزراندن بە بەشداری سێکشۆنی ژنان لە کۆمەڵەکانی ئەندام و فیدراسیۆن، یەکێتیی ژنانی کورد لە سوێد پێکبێ.

هەروەک ئاشکرایە ژنانی کورد لە رێگای بەشداری خەباتی رێکخراوی و کۆمەڵایەتیدا و نوێنەرایەتی کێشە تایبەتییەکانی خۆیان هەنگاوی گرنگ داوێن.

بڕیار و کاری دامەزراندنی یەکێتیی ژنانی کورد لە سوێد کە لە سێکشونی ژنانی کۆمەڵانی ئەندام پێکدێ، پێشکەوتنێکی ترە لە کۆمەڵی کوردەواری لە سوێدا.

هەروەها لە کۆنگرەی (١٢)مینی فیدراسیۆن کە بڕیارێک دەربارەی لاوان دەرچوو وەک لەسەرەوەدا باسمان کرد، بڕیارێکی تریش بۆ نوێنەرانی ژنان وەرگیرا.

ژنانی کورد نیوەی کۆمەڵگاکەمانە، بەشداری ئەوان لە کاری رێکخراوی و کۆمەڵایەتیدا توانێکی تری بەهێز بە کۆمەڵگاکەمان دەبەخشێ. لەبەر ئەو هۆیانەی کە لەسەرەوەدا دەربارەی لاوان ئاماژەم بۆ کردن، هەروەها دەبێ ئەندامەکانی کۆمیتەی کارگێری یەکێتی ژنانی کوردیش نوێنەری ئەسڵی بن لە کۆنگرەی (ف.ک.ک.س)یدا. ئەون خۆیان کێشەکانیان بخەنە بەردەم کۆنگرەی فیدراسیۆن و کارەکانی خۆیان هەڵسەنگێنن وەک بەشێکی تەواو لە خەبات و کارەکانماندا.

(ف.ک.ک.س) وەک ناوی (فیدراسیۆن)ـە رێکخراوێکی ناوەندی نییە، لە پێوەندی نێوان ئۆرگانەکانی هەڵبژاردراودا و کۆمەڵەکانی ئەندامماندا ئەو راستییە زۆرجار لەبیر دەکرێ.

هیوای نا ریالیستانە، داخوازی نەلەجێدا، رەخنەی ناهەق لە ئۆرگانی هەڵبژاردراوی فیدراسیۆن دەگیرێ. هەر کۆمەڵەیەک دەبێ کاروباری خۆی بەخۆی دارێژێ و بەرێوەی بەرێ. توانای ئابووری پێوستە بەخۆی پەیدای بکا. بەهێزبوون و فراوانبوونی کۆمەڵەکانی ئەندام، بەهێزبوون و فراوانبوونی کاری فیدراسیۆنە. فیدراسیۆن بێ بەهێزبوونی خەباتی کۆمەڵانی ئەندام ناتوانێ بەهێزبێت، چونکە (ف.ک.ک.س) نەک تەنیا حەوت ئەندامی کۆمیتەی کارگێر و (١٩) ئەندامی کۆمیتەی گشتییە. ئەندامانی ئەو ئۆرگانانە هەر تەک ئەندامی کۆمەڵەکانی جیاوازن.

(ف.ک.ک.س) نوێنەرایەتی کۆمەڵەی کوردەواری لە سوێد دەکا. ستۆکهۆڵم سوێد نییە. لەهەر کۆمیونێکدا کۆمەڵەیەکی ئەندامی فیدراسیۆن هەیە. ئێمە دەبێ لەم ڕوانگەیەوە (پریسپکتیڤ) تەماشای پەیوەندی نێوان فیدراسیۆن و کۆمەڵەکانی ئەندام بکەین تا بتوانین بەراستی پەنجە بخەینە سەر کەموکوری هەڵەکانی فیدراسیۆن و کۆمەڵەکانی ئەندام و چارەکردنی راستییان بۆ بدۆزینەوە.

بێگومان لەبەردەم کۆنگرەی (١٣)مینی فیدراسیۆندا زۆر کێشە چاوەروانی گفتوگۆکردن و بڕیاری چارەسەرکردنن.

من تەنیا دەربارەی هەندێ لایەنی گشتی خەبات و رێکخراویی، دواوم و چەند پێشنیارێکم خستۆتە بەرچاو. هیوادارم کە کۆنگرەی (١٣)مینی فیدراسیۆن بەرەو یەکگرتن و بە هێزبوون و بەرەوپێشچوون هەنگاوێکی نوێ بنێ. هێز و توانای خەباتی کۆمەڵگاکەمان لە سوێد لە ژێر چەتری خۆیدا خورتر بکات.

www.arsivakurd.org

# بەرەو کۆنگرەی (١٣) مین

## ویلدان تانریکولو




فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوێد (ف.ک.ک.س) کۆنگرەی ١٣ مینی خۆی لە مانگی شوباتی ١٩٩٣دا دەبەستێ.

کۆنگرە بەرزترین ئۆرگانی ڕێکخراوێکە. بێگومان لە ڕۆژەڤی ئەودا هەموو کێشەی پێوەنداری کاری ڕێکخراوی دەخاتە ڕۆژەڤەکەی، بۆ چارەسەرکردنی کێشەکان، بڕیاری پێویست وەردەگرێ، بەڵام لەلایەکی تر دەبێ بزانرێ کە لە هیچ ڕێکخراوێکدا، جگە لە ئەو خاڵە گشتییانەی کە پێویستە کۆنگرە باسیان لێبکا، هەر کێشەیەک هەردەم بە تەواوی بە گوێرەی داخواز و هیوای بەشداربووانی کۆنگرە ناکەوێتە ڕۆژەڤی و چارە ناکرێن. شتی ئیدیالیش بە گوێرەی دڵی هەر کەسێک بە یەکجار ناکەوێتە هۆڵی و لە خۆیەوەش چێ نابێ.

بۆ دەستکەوتی شتی ئیدیال، خەبات و کات پێویستە. بە کەمانی بۆ بەشدارانی کۆنگرەی (ف.ک.ک.س) چ وەک نوێنەر و چ وەک میوان یاخود گوێگر لەو ١٢ ساڵەدا نموونە زۆرە. دەستوور و بنەما (ستروکتور) و ئاسۆ و ناوەرۆکی کاری فیدراسیۆن لەهەر کۆنگرەیەکدا مناقەشە لەسەر زۆر دەکرێ. هەندێ کێشە چارەسەر دەکرێن، هەندێکی تر وەک خۆی دەمێنێتەوە. هەندێ کێشە بە گوێرەی دیتن و داخواز و دڵی هەندێ بەشدارانی کۆنگرە چارەسەر دەکرێن، بەڵام ئەوانە لەوانە بە گوێرەی دیتن و داخواز و دڵی بەشدارانی تری کۆنگرە نەبێ.

ئەو مناقەشانەی لە کۆنگرەی فیدراسیۆندا، چ لە ناوەرۆکدا و چ لە فۆرمدا دینامیزی خەباتی و کاری فیدراسیۆن نیشان دەدات. ئەو دینامیزمە نیشانەی خەباتی ڕێکخراوێکی زیندووە، دەبێتە بنکەی گۆڕان و بەرەوپێشچوون و بە هێزکردنی خەباتی پەنابەرانی کوردە لە سوێد لەژێر چەتری ڕێکخراوەکانی جەماوەری و نەتەوەییدا. لەلایەکی ترەوە ئەو مناقەشە و بڕیارانەی کۆنگرە دیموکراتیەتی نێو کاری ڕێکخراوەیان نیشان دەدەن. دەتوانین تەحمول و گوێ لەیەکتر بگرین و ڕێزی یەکتر بگرین. ڕێزی کەسایەتی ئۆرگانەکانی هەرە بەرزی ڕێکخستن بگرین و ئەو بڕیارانەی کە بە دڵیشمان نەبێ، وەک بڕیاری ئۆرگانی هەرە بەرز لەکاردا ئەنجام بدەین. بەمجۆرە (ستروکتوری) بنەمای دیموکراتیکی ڕێکخراوەکەمان دەپارێزین، لە دەرەشدا تەنیا کەسایەتی ئۆرگانی هەرە بەرز و بڕیارەکانی ئەو کەسایەتییە قبوول دەکەین. شێوەی مناقەشەیەکی دیموکراتیک لە کاری ڕێکخستندا دەکەینە شێوەیەکی ژیان بەکار نەک بەقسە.

لەگەڵ ئەو شتە پۆزەتیڤ و پێشکەوتووانەدا گەلێک شتی تر هەیە کە مرۆڤ ناتوانێ بە جۆرێکی پۆزەتیڤانە باسی بکات.

مرۆڤ ناتوانی بە دڵێکی ڕەحەت ببێژی کە (ف.ک.ک.س) ڕێکخراوێکی کامیل و بێ کەموکورتییە. هەر کارێکی دەکا، دەگاتە ئامانجی خۆی و لە شێوەی کار و بەڕێوەبردنی ڕێکخراوییدا کەموکوری و هەڵە ڕوونادات.

بێگومان، یەکێک لەو هۆیانە ئەوەیە کە ژیان لە شوێنێکدا بەستەڵەک نابێ. دینامیزی ژیان هەر ڕۆژێک گەلەک کێشەی نوێ دەهێنێتە پێشەوە. ڕێگا و بۆچوونی دوێنێ ناتوانێ وەڵامدانەوەی کێشەی ئەورۆ بێنت. ئەگەر ئێمە بە خۆمان دینامیزمی کار و مناقەشە بە گوێرەی دینامیزمی ژیان نەپێوین (عەیار) نەکەین، ئاشکرایە کە ئێمە دوا دەکەوین و ناتوانین کێشەی نوێ ببینین و بیخەینە ڕوو.

لەلایەکی تریش هۆی کەموکوری و هەڵەکان پێوەندیدارە بەو کەس و کادیرانەی کە بەشداری کاری دیموکراتیک دەبن. دەبێ ئێمە سەرنج و فیدراکاری و فێربوونی خۆمان ڕۆژ بە ڕۆژ بەهێزتر بکەین تا بتوانین دەرهەقی ئەو بەرپرسیاریەی لەسەر شانمانە بێن و وەڵامدەری ئەو کێشە و داخواز و هیوایانەی لێمان دەکرێ بدەینەوە.

خاڵێکی گرنگتر ئەوەیە پۆتانسیالی جیاوازی کۆمەڵایەتی پەنابەرانی کورد لە سوێد بە گوێرەی ئەرکی کۆمەڵایەتی جیاوازەوە و ڕادەی بەرزی وەک پێویست نەخراوەتە کار.

بەشە جیاوازەکانی کۆمەڵەکەمان هەموو توانای خۆیان یەک نەخستوە و بەتەواوی نەکەوتۆنەتە گەڕ، تا بەرپرسیاریەکان بەجێ بگەیەنین وەک گۆترا، ئێمە ناتوانین هەموو کێشەکان لە کۆنگرەدا چارەسەر بکەین.

مرۆڤ نابێ شتێکی ئەوتۆ بخاتە پێش خۆ، کە نەتوانێ دەرهەقی بێ، بەڵام هەندێ کێشە کە دەخرێتە بەرباس و لێکۆڵینەوە، زەمینە خۆشدەکا بۆ چارەسەکردنی کێشەکانی تر، بۆیش دەبێ ئێمە ئەو کێشانە بچەسپێنین و پێشنیارەکانی خۆمان بەر لە هەموو شت بە تەواوی گەلالە بکەین، تابتوانین ڕێگای لێکۆڵینەوەیەکی ڕێکوپێک بخەینە ئارا. کێشەکان و ڕێگای چارەسەرکردنیان بە کۆنگرە بناسێنین.

کێشەیەکی هەرە گرنگی کۆنگرەی (١٣)مینی (ف.ک.ک.س) ئەوەیە دوو دەستەی هەرە گرنگ و فراوانی کۆمەڵگاکەمان لەنێو

www.arsivakurd.org

# دەوڵەتی فیدراڵی کوردستان و ئەرکی ئێمە لە دەرەوە

شاخەوان

ساڵی ١٩٩٢، سێ ڕووداوی ورەبەخش لە باشووری کوردستان سەریان هەڵدا: هەڵبژادرنی پەرلەمان و دامەزراندنی حکومەت و ڕاگەیاندنی فیدرالیزم.

ئەم سەرکەوتنانە، بە تایبەتی ڕاگەیاندنی فیدرالیزم، گەورەترین دەستەکەوتی نەتەوایەتییە لە پاش (کۆماری مەهاباد) بە دیهاتبێ.

ئەم سەرکەوتنە گزنگی بڕوا بە خۆبوون و، بە متمانە بەرەو ئایندەی باشترڕۆیشتنی لەناو بزووتنەوەی ڕزگاریخوازیی کوردستاندا بڵاوکردەوە و، تەکانێکی باشی بە کێشەی خوارووی کوردستاندا، کە درەنگ یان زوو لە پارچەکانی تردا ڕەنگ دەداتەوە.

بایەخی مێژووی و سیاسی ڕاگەیاندنی فیدرالیزم لەوەدایە کە کۆتایی بە قۆناخی بەدناوی «ئۆتۆنۆمی» هێنا و، ئەو بیرکردنەوە ئیفلیجە سیاسییەی توردا، کە وای لە گەلەکەمان کردبوو، هەمیشە چاوی لەوەبێ دەوڵەتی عێراق لە بەغداوە مافی بۆ دیاریبکات.

ئەوە بۆ یەکەمین جارە بەشێک لەگەلەکەمان لە ڕێگای دەزگایەکی شەرعی وەک پەرلەمانەوە، بەرنامە و مافی خۆی بۆ قۆناخی ئێستا ڕاگەیەنی و، شێوەی پێوەندی ئایندەی بە گەلە سەردەستەکەوە، دیاریبکات.

ئەو دەستکەوتە مەزنەی ئەمڕۆ لە کوردستان (بەشی عێراقدا) ئەنجامدراوە، تەنیا موڵکی خوارووی نیشتمانەکەمان نییە، بەڵکو بە هەمان ئەندازە موڵکی باکوور و ڕۆژهەڵات و ڕۆژئاوای کوردستانە. ئەگەر لەم دید و بۆچوونەشەوە نەڕوانینە دەستکەوتەکە، لە ئەنجامدانی ئەو ئەرکەی مێژوو وەئەستۆی خستووین دوادەکەوین.

ئێمە لەم کورتە گوتارەدا هەڵوێستەکی خێرا لەسەر ئەو ئەرکانە دەکەین کە لەم ڕووەوە، دەکەوێتە ئەستۆی کوردی هەندەران.

بە ڕای ئێمە پێویستە نوێنەرانی حکومەتی کوردستان و بەرەی کوردستانی و ڕێکخراو و حزبی پارچەکانی تری نیشتمانەکەمان و گشت فیدراسیۆن و ڕێکخراوە کۆمەڵایەتی و هونەریی و دەزگا چاپەمەنیە کوردستانیەکان لە ئەورووپا و دەرەوە بە گشتی کۆنفرانسێک ببەستن و بەرنامەیەک بۆ داکۆکی کردن و پشتیوانی حکومەت و دەوڵەتی فیدراڵی کوردستان بڕیار بدەن و، لەسەر ئاستی ئەورووپا بە گشتی و هەر وڵاتی بە جیا بیرۆ و کۆمیتەی دیفاع لە باشووری کوردستان پێکبهێنرێ و، دەشکرێ نوێنەری ئەو برا ئاشووری و تورکمانانەی کوردستان کە لە دەرەوە دەژین، بۆ ئەم کۆنفرانسە بانگ بکرێن.

ئەرکی ئەو بیرۆ و کۆمیتانەش لە دوو بواری گرنگدا بە وردی دەشتنیشان بکرێن:

١- لە بواری پێوەندیکردن بە ڕای گشتی داموەزگاکانی ئەو وڵاتانەی ئەمجۆرە کۆمیتانەی تیاپێکدێن.

٢- ڕێکخستن و سازدانی هاووڵاتیان هەر چوارپارچەی کوردستان بۆ پشتیوانیکردن لە پرۆسەی بە فیدراڵکردنی خوارووی کوردستان.

# # #



فشار و مەترسی بەردەوامی چوار دەوڵەتەکە لەسەر خوارووی کوردستان لە ئارادایە و، پێویستە ڕۆژانە ڕای گشتی ئەورووپا و وڵاتانی دەرەوە لەم مامەڵە ناشارستانیەتی ئەو دەولەتانە ئاگادار بکرێنەوە. ئایا هەق وانەبوو لەو ڕۆژە کە کۆبوونەوەی سێ قوڵی وەزیرەکانی دەرەوەی تورکیا و ئێران و سوریا سازکرا. لە دەیان شار و پایتەختی وڵاتانی ئەورووپادا ئێمەی کورد خۆپیشاندانی نارەزاییمان ڕێکخستبا و، ئەم دەستێوەردانەمان ریسوا بکردبا.

باهەر لە ئێستاوە پێش ئەوەی دوژمنەکانمان کارەساتی تر بەسەر گەلەکەماندا، ڕای گشتی دنیا لە سامناکیی ئەو کارانە ئاگادار بکەینەوە.

- قورسایی گەلەکەمان لە دەرەوەدا بۆ بەرەسمی ناسینی پەرلەمان و حکومەتی کوردستان بە کاربینین.

- داوا لە پەرلەمان بکرێ، کۆنتۆ و ژمارەی بانکی بۆ پشتیوانی دەوڵەتی فیدراڵی کوردستان ڕێکخاو، هانی هاووڵاتیانی هەر چوار پارچەی وڵاتەکەمان بدرێ لەم کارە نیشتمانیەدا بە گەرمی بەشداری بکەن.

- داوا لە کوردە دەوڵەمەندەکانی ئەورووپا بکرێ، ئەو دراو و تواناییانەی هەیانە لە کوردستاندا بیانخەنە کار و، بەشداری لە ئاوەدانکردنەوەی وڵاتەکەیاندا بکەن.

- لەهەر وڵاتێکدا مانگی جارێک ڤێستیڤاڵێکی سیاسی بۆ پشتیوانی دەوڵەتی فیدرالی کوردستان سازبکرێ.

- ڤێستیڤاڵی گەورە بۆ گۆرانی و هونەری کوردی ڕێکبخرێ و، لە ڕێگای حکومەتی کوردستانەوە، سوودەکەی بدرێ بە دەزگا هونەری و ڕۆشنبیرییەکانی ناو وڵات.

هەروا ڕێکخراوی نووسەران و لاوان و ئافرەتان و منداڵان ...... هتد، دەتوانی کاری لەم چەشنە بکەن و کۆمەک بۆ ڕێکخراوە هاوچەشنەکانی خۆیان لە کوردستان بنێرن.

پرۆسەکەی خوارووی کوردستان، پرۆسەیەکی نیشتمانییە و، پێویستە توانای گشت هاووڵاتیەکی کوردستان وتەواوی دەزگا سیاسی و کۆمەڵایەتیەکانی خۆمان لە ئەورووپا بۆ سەرکەوتنی بخرێنە کار.

ئایا لەو ئاستەداین ئەرکێکی نیشتمانیی واپیرۆز ئەنجام بدەین!!

www.arsivakurd.org



# ناوەڕۆک


## باس و لێکۆڵینەوە

دەوڵەتی فیدراڵی کوردستان و.............................. شاخەوان
هاتنی وەفدی پەرلەمانی کوردستان بۆ سوێد ............... هیوا زەندی
بەلاغی کۆتایی کۆبوونەوەی تورکیا لەگەڵ تالەبانی و بارزانی..........
بەرەو کۆنگرەی (١٣)مین ........................ ویلدان تانریکولو
ئەگەر ژیانە با لەوێ بژین وەگەر...................... ناسری رەزازی
وەلامی پرسیاری فیدراسیۆن بەرامبەر پرسیارەکانی ....................
بەیانی کۆتایی نۆیەمی یەکێتیی مامۆستایانی کوردستان ................

## ئەدەب و هونەر

مەم و زینەکان ........ چیرۆک .......................... شێرزاد حەسەن
سوار، وتت: تەنیایی .......... شیعر ................. رزگار عەبدوڵلا
غوربەت، راستی ................................ ئەنوەر رەشید عولا
بەیانی لیژنەی مافی مرۆڤی کورد...........................................
بانگەوازی کۆمیتەی ئەنفالکراوەکان............................................
ئاساواری کوردستان ..................................................
کۆچی دوایی عەبدولمەجید لوتفی ............................. بەربانگ
ئاگاداری کۆنگرەی (١٣)مینی فیدراسیۆن ..................................

## چاوپێکەوتن ......

چاوپێکەوتنێک لەگەڵ کۆمەڵەی یۆتۆبۆری ........ مستەفا ئایدۆگان




وەفدی پەرلەمان
لاپەرە 52



قەلای شێروانە
لاپەرە 32



ئەگەر ژیانە با لەوێ بژین
لاپەرە 48

وێنەی بەرگ: بەربانگ


# بەربانگ

ئۆرگانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکانە لە سوێد
بەرپرسیار: ویلدان تانریکولو
*دەستەی نووسەران*
بەرۆژ ئاکرەیی، دیلان دەرسیم،
جەمال باتون، مستەفا ئایدۆوان،
بویێ ئەسەر، حەمیدکلچاسلان، محەمەد هەمبێلۆ

*پیتداچن و تەکنیکاران*
دیلان دەرسیم، بویێ ئەسەر، جەمال باتون
ئابوونەی ساڵانە: ٢٠٠ کرۆنی سوێدییە
بۆ دەزگاکان ٣٠٠ کرۆنی سوێدییە



دەستەی نووسەران لە نووسین و وتارەکانی فیدراسیۆن و لەو نووسینانەی بە واژۆی خاوەنەکانیان بڵاودەکرێنەوە، بەرپرسیار نییە.



ناونیشان:
BERBANG
Box 490 90
100 28 STOCKHOLM
Tel. 08- 652 85 85
Fax. 08- 650 21 20
پۆستگیرۆ: 8-80 38 64



ژمارە ٨٦ ساڵی (١١) ١٩٩٣

☐ فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوێد، لە ٦-٦-١٩٨١ دامەزراوە.
☐ گۆڤاری بەربانگ ژمارەی یەکەمی لە ١٩٨٢/٧دا، بڵاوکراوەتەوە.


www.arsivakurdi.org

# کەسوکاری ئەنفالکراوەکان







www.arsiv...kurd...org

# بەربانگ

گزڤاری فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکانە لە سوید.

ژمارە ٨٦ ساڵ «١١»

Box 490 90, 100 28 Stockholm

B

SVERIGE
PORTO BETALT



www.kurdi.org